

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Beşezanista Bingehîn a Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DESTANA ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ

AZİZ SAMUR

10711012

Şêwirmend

Prof. Dr. KADRÎ YILDIRIM

Mêrdîn 2012

JI BIRÊVEBIRIYA ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Beşezanista Bingehîn a Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

Serok (îmze)
:.....
(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Endam (îmze)
:.....
(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Endam (îmze)
:.....
(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Endam (îmze)
:.....
(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Endam (îmze)
:.....
(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên perwerdeyê yên navborî ne.

Îmze
.....
Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Birêvebirê Enstîtuyê
(Mor)

KURTE

Bi vê xebatê mebest ew e ku taybetmendiyên nediyar ên çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê derkevin holê. Bingeha vê xebatê li ser sê guhertoyan hatiye sazkirin ku ev her sê guherto, ji aliyê Feqiyê Teyran(1549-1631), Melayê Bateyî(1675-1760) û Mûradxanê Bayezîdî(sala nivîsandinê: 1776) ve hatine nivîsîn. Di beşa pêşî ya vê xebatê de li ser destan, derketin û belavbûna destanan û li ser cureyên wan hatiye sekinandin. Di beşa duyem de destanên evînê hatine ravekirin û mînakên wan ên ji wêjeya cîhanî û rojhilatî hatine dayîn. Di beşa sêyem de ku li ser mijara bingehîn a vê xebatê ye, di çarçoveya sê guhertoyan de naverok, leheng, çîrok, derketina holê, warên qewimînê, serdema qewimînê, awayê belavbûnê û derbasbûna nivîsê ya serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi hûrbînî hatine dayîn. Di vê beşê de encama herî girîng ku mirov têdigihîje ew e ku serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê di sala 994ê zayînî, serdema Merwaniyan(Z. 956-1085) de li Farqîna Amedê qewimiye. Xaleke din a girîng, navê rastîn ê Zembîlfiroş, Mîr Seîdê Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekirî ye. Li ser vê xalê, li lîteratura li ser dîroka Kurdistanê hatiye nihêrtin û di encamê de agahiyên girîng derketine holê. Di beşa dawî ya çarem de, li ser hevbeşiyên serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê, Yûsif û Zelîxa û Îbrahîmê Edhem hatiye sekinandin. Her wiha di pêvekê de jî, her sê guhertoyên ku li serê vekolîn hatine kirin, bi awayên xwe yên resen hatine dayîn.

ÖZET

Bu çalışma Kürt Edebiyatının şaheserlerinden olan Zembilfiroş ile Gülhatun aşk hikâyesinin bilinmeyen yönlerini ortaya çıkarmayı amaçlamaktadır. Çalışma esas itibariyle üç varyant üzerinde yoğunlaşmaktadır. Bu varyantların ilki Feqiyê Teyran(1549-1631)a, ikincisi Melayê Bateyî(1675-1760)ye ve üçüncüsü de Mûradxanê Bayezîdî(yazılış yılı 1776)ye aittir. Çalışmanın birinci bölümünde destan ve destanların ortaya çıkışı ile türleri üzerinde durulmuş, dünya ve doğu edebiyatındaki örnekleri işlenmiştir. İkinci bölümde aşk destanları ve bunların dünya edebiyatındaki örnekleriyle birlikte doğu edebiyatında meşhur olan örnekleri tanıtılmıştır. Üçüncü bölümde esas konuyu teşkil eden üç varyant üzerinde hikâyenin içeriği, kahramanları, öyküsü, ortaya çıkış dönemi, yayılma şekli, ilk yazıya geçirilme gibi özellikleri irdelenmiştir. Bu bölümde ulaşılan en önemli sonuçlardan biri, Zembilfiroş ile Gülhatun arasında vuku bulan aşk hikâyesi, miladi 994 yılında Mervaniler(Miladi 956-1085) döneminde Diyarbakır'ın Silvan ilçesinde meydana gelmiştir. İkinci önemli ayrıntı, adı geçen aşk hikâyesinin erkek kahramanı olan Zembilfiroşun gerçek ismi Emir Said olup, Diyarbakır Paşalarından Emir Hasanın oğludur. Bu noktada Kürdistan tarihi ile ilgili literatür taranmış, Emir Said ve Emir Hasan ile ilgili önemli bilgilere ulaşılmıştır. Çalışmanın son bölümü olan dördüncü bölümde ise Zembilfiroş hikâyesi ile, Yusuf ile Züleyha ve İbrahim Edhem hikayelerinin olayın gerçekleşme ve kurgu biçimi bakımından ortak yönleri ele alınmıştır. Ayrıca ekler bölümünde de üzerinde analiz ve tahliller yapılan Zembilfiroş ile Gülhatun aşk hikâyesinin üç varyantı olduğu gibi verilmiştir.

SUMMARY

This study's aim is to reveal unknown aspects of a love story between Zembîlfiroş and Gulxatûn which is one of the masterpieces of Kurdish literature. The study mainly concentrates on three variants. The first of these lines belong to Feqiyê Teyran (1549-1631), the second belong to Melayê Bateyî (1675-1760), and the third one belongs to Mûradxanê Bayezîdî (The syntax of the year 1776). In the first study it is focused on the kinds of the epics with the emergence of the epic and the epic itself and it is processed the world and the samples of eastern literature. In the second part, love epics with famous examples of eastern literature are presented with examples of world literature. In the third section, on the three variants of the story content which constitutes the main topic, characters, story, the emergence period, the way it spreads and the first post properties are discussed. One of the most important conclusions reached in this section is the love story which had taken place between Zembîlfiroş and Gulxatûn. It occurred in the town of Silvan, a province of Diyarbakir, in gregorian 994 (Gregorian 956-1085) in the period of Mervani state. The second important detail is that male protagonist's real name is Emir Said, mentioned in Zembîlfiroş's love story, is the son of Mîr Hesên who is one of the pashas of Diyarbakir. At this point, the literature about the history of Kurdistan has scanned and critical information is reached related to the Mîr Hesên and Mîr Seîd. In the fourth and the last part of the study, it is discussed the common points of the story Zembîlfiroş, Yûsif and Zuleyxa and İbrahim Edhem in terms of realization and format. Additionally, in the suppelement section, three variants which are researched and analyzed of the love story of Zembîlfiroş and Gulxatûn are given completely.

NAVEROK

Rûpel

KURTE	II
ÖZET.....	III
SUMMARY	IV
NAVEROK	V
PÊŞGOTIN	XII
KURTEBÊJE	XV
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM: DESTAN.....	3
1. DESTAN ÇI YE?	3
2. DERKETIN Û BELAVBÛNA DESTANAN	5
2.1. Derketina Destanê	5
2.2. Belavbûna Destanê.....	5
2.3. Nivîsandina Destanê.....	5
3. ÇEŞNÊN DESTANAN	6
3.1. Destanên Siruştî an jî Devkî.....	6
3.2. Destanên Çêkirî an jî Wêjeyî	6
4. DI WÊJEYA CÎHANÊ DE DESTAN	7
4.1. Destanên Yewnanî	7
4.1.1. Îlyada.....	7
4.1.2. Odysseia / Odysseus.....	7
4.2. Destanên Latînî	7
4.2.1. Aeneas	7
4.3. Destanên Frensî.....	7
4.3.1. Kilama Roland	7
4.3.2. Aucassin û Nicolette	7
4.4. Destanên Spanî.....	7

4.4.1. El Cîd	8
4.5. Destanên Portekîzî	8
4.5.1. Os Lusidas	8
4.6. Destanên Îtalyanî.....	8
4.6.1. Komediyaya Îlahî	8
4.6.2. Orlandoyan.....	8
4.6.3. Gerusalemme Liberata an jî Qudsa Xelasbûyî.....	8
4.7. Destanên Giravên Brîtanî.....	8
4.7.1. Beowulf	8
4.7.2. Dîwana Arthur.....	8
4.7.3. Robin Hood	9
4.7.4. Kralîçeya Pîrelkan.....	9
4.7.5. Bihişta Windabûyî.....	9
4.7.6. Bihişta ku ji nû ve tê bidestxistin	9
4.8. Destanên Almanî.....	9
4.8.1. Destana Nîbelungiyan	9
4.8.2. Efsaneya Kaseya Pîroz.....	9
4.9. Destanên Holandî.....	9
4.9.1. Yehyayê Qasidê Tobeyê	9
4.10. Destanên Fînî	9
4.10.1. Kalevala an jî Diyarê Cengaweran.....	10
4.11. Destanên Rûsî	10
4.12. Destanên Ereban.....	10
4.13. Destanên Farisan	10
4.13.1. Şahname an jî Destana Qralan	10
4.14. Destanên Hîndî.....	10
4.14.1. Ramayana.....	10
4.14.2. Mahabharata.....	10
4.15. Destanên Çîn û Japonî.....	11
4.16. Destanên Amerîkayî.....	11
4.17. Destanên Sumerî	11
4.17.1. Destana Gilgamişê	11
4.17.2. Destana Atra-hasîs	11

BEŞA DUYEM: DESTANÊN EVÎNÊ	13
1. DI WÊJEYA CÎHANÊ DE DESTANÊN EVÎNÊ	13
1.1. Destanên Evînî yên Rojavayî	13
1.1.1. Mark Antony û Kleopatra	13
1.1.2. Napolyon û Josephine	13
1.1.3. Juan û Evita Peron.....	13
1.1.4. Prens Edward û Wallis Simpson.....	13
1.1.5. Voltaire û Emilie du Chatelet.....	13
1.1.6. Czar Nicholas II û Alexandra Federovna.....	13
1.1.7. Richard Burton û Elizabeth Taylor	13
1.1.8. Nelson û Lady Emma Hamilton.....	13
1.1.9. Tristan û Isolde.....	14
1.1.10. Pyramus û Thisbe.....	14
1.1.11. Khurram û Mumtaz Mahal Begum	14
1.1.12. Saleem û Anarkali	14
1.2. Destanên Evînî yên Rojhilatî	14
1.2.1. Yûsif û Zelîxa.....	14
1.2.1.1. Çîroka Yûsif û Zelîxa.....	14
1.2.1.2. Di wêjeya kurdî de Yûsif û Zelîxa	17
1.2.1.2.1 Helbestavanên kurd ku behsa lehengên Yûsif û Zelîxayê dikin	17
1.2.1.2.1.1. Elî Herîrî.....	17
1.2.1.2.1.2. Melayê Cizîrî.....	18
1.2.1.2.1.3. Ehmedê Xanî.....	18
1.2.1.2.2. Helbestvanên kurd ku bi navê Yûsif û Zelîxa berhem dane	18
1.2.1.2.2.1. Ehmedê Xanî.....	18
1.2.1.2.2.2. Selîmê Silêman.....	19
1.2.2. Xusrew û Şîrîn	20
1.2.3. Leyla û Mecnûn.....	20
1.2.4. Suheyl û Newbihar	20
1.2.5. Wereqe û Gulşah.....	20
1.2.6. Cemşîd û Xurşîd.....	21
1.2.7. Huma û Humayûn	21

1.2.8. Weys û Ramîn	21
1.2.9. Selaman û Absal.....	21
1.2.10. Wamiq û ‘Ezra	22
1.2.11. Cemşah û Alemşah.....	22
1.2.12. Şah û Geda	22
1.2.13. Hetfpeyker.....	22
1.2.14. Xeyrabad	23
1.2.15. Edhem û Huma.....	23
2. DI WÊJEYA KURDÎ YA KLASÎK DE DESTANÊN EVÎNÊ	24
2.1. Mem û Zîn.....	24
2.2. Siyabend û Xecê.....	25
2.3. Dewrêşê Evdî û Edûlê.....	27
2.4. Stî û Ferxik.....	27
2.5. Sînan û Sakîne.....	27
2.6. Salih û Kejê.....	27
2.7. Şehrîzînan û Mîrza	27
2.8. Fedîle û Elî	28
2.9. Seyfil Milûk û Bedî-ul Cemal.....	28
2.10. Meryema Fileh û Eliyê Qolaxasî.....	28
2.11. Heso û Nazê	28

BEŞA SÊYEM: DI WÊJEYA KURDÎ YA KLASÎK DE DESTANA	
ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ	29
1. NAVEROKA DESTANA ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ.....	29
1.1. Di wêjeya kurdî ya klasîk de Zembîlfiroş	29
1.1.1. Di guhertoyan de nav û nasnavên Zembîlfiroş û Gulxatûnê.....	29
1.1.1.1. Lehengê Zilam	29
1.1.1.2. Lehenga Jin	30
1.1.2. Di berhemên dîrokê de şopa Zembîlfiroş.....	33
1.1.2.1. Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî.....	33
1.1.2.2. Dîroka Kurd û Kurdistanê ya Mihemed Emîn Zekî Beg	34
1.1.2.3. Merwanîyên Diyarbekir a Thomas Ripper.....	35
1.1.2.4. Dîroka Kurdistanê ya bi Rûsî.....	36

1.2. Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê	37
1.2.1. Bi giştî derbareyê Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê de	37
1.2.2. Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê	38
2. GUHERTOYÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞÊ	52
2.1. Zembîlfiroşa Feqîyê Teyran	52
2.1.1. Feqîyê Teyran kî ye?	52
2.1.2. Ji aliyê naverokê ve	53
2.1.2.1. Mijara Beyta Zembîlfiroş	54
2.1.2.2. Ramana Beyta Zembîlfiroş	56
2.1.2.3. Peyama Beyta Zembîlfiroş	58
2.1.3. Ji aliyê zimên û şêweyê ve	59
2.1.3.1. Çawaniyên Zimanê Helbestê	59
2.1.3.1.1. Nezm	59
2.1.3.1.2. Rêziman	59
2.1.3.1.3. Hestyariya Zimên	60
2.1.3.1.4. Aheng/Mûsikî/Rîtm	60
2.1.4. Ji aliyê şiklên nezmê ve	61
2.2. Zembîlfiroşa Melayê Bateyî	63
2.2.1. Melayê Bateyî kî ye?	64
2.3. Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî	65
2.3.1. Mûradxanê Bayezîdî kî ye?	65
2.3.2. Ji aliyê naverokê ve	66
2.3.2.1. Mijara Çîroka Zembîlfiroş	66
2.3.2.2. Ramana Çîroka Zembîlfiroş	69
2.3.2.3. Peyama Beyta Zembîlfiroş	70
2.3.3. Ji aliyê zimên û şêweyê ve	70
2.3.4. Ji aliyê şiklên nezmê ve	71
3. LEHENGÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ	79
3.1. Lehengên Zembîlfiroşa Feqîyê Teyran	79
3.1.1. Zembîlfiroş	79
3.1.2. Xatûn	80
3.1.3. Cariye	81
3.1.4. Dergevan	81
3.1.5. Mîr	81

3.1.6. Jin	82
3.2. Lehengên Zembîlfiroşa Melayê Bateyî	82
3.2.1. Zembîlfiroş	82
3.2.2. Xatûn	82
3.2.3. Cariye	83
3.2.4. Mîr	83
3.3. Lehengên Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî	83
3.3.1. Zembîlfiroş	83
3.3.2. Jin	83
3.3.3. Bab û Dayik	83
3.3.4. Wezîr	84
3.3.5. Xatûn	84
3.3.6. Xadim û Xizmetkar	84
3.3.7. Xulam û Bende	84
4. SERDEM Û WARÊ(N) QEWMÎNA DESTANA ZEMBÎLFIROŞ	85
5. BELAVBÛN Û TOMARKIRINA ZEMBÎLFIROŞ	86
5.1. Belavbûn	86
5.2. Tomarkirin	86
 BEŞA ÇAREM: HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ Û ÇÎROKÊN DIN	 89
1. HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ Û YÛSIF Û ZELÎXA	89
1.1. Gulxatûn û Zelîxa	89
1.2. Zembîlfiroş û Yûsif	90
1.2.1. Xweşikî	90
1.2.2. Serdema Evînê	90
1.2.3. Mîrbûn	91
1.2.4. Xweparastina ji gunehan	91
2. HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ Û ÎBRAHÎMÊ KURÊ EDHEM	95
 ENCAM	 99
 ÇAVKANÎ	 101

PÊVEK: GUHERTOYÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ.....	104
1. ZEMBÎLFIROŞA FEQIYÊ TEYRAN.....	104
2. ZEMBÎLFIROŞA MELAYÊ BATEYÎ.....	116
2.1. Berhevoka Albert Sosin	116
2.2. Destnivîsa Qanadê Kurdo	119
3. ZEMBÎLFIROŞA MÛRADXANÊ BAYEZÎDÎ	123



PÊŞGOTIN

Destan bi destê gelekî, di encama bûyerekê de, li ser çîroka wê bûyerê avakirina kesên efsaneyî û vegotina wê çîrokê bi xwe ye. Destan di serî de wekî bûyerek ji rêzê diqewimin û peyre di nav nifşan de bi devkî belav dibin. Her çi qas di serî de wekî gotinên devkî belav bibin jî, ji aliyê hin kesan ve di nav dîrokê de derbasî nivîsê dibin. Ji destanên pêşî yê wekî Gilgamiş, Îlyada û Odysseia heta roja me gelek destan li ser rûyê erdê qewimîne, diqewimin û dê biqewimin. Heta ku mirov li ser rûyê erdê hikumê bike, dê ev rastî jî pêre be.

Di nav destanan de béguman yê ku herî zêde mala mirovan dikşînin, yê evînê ne. Ji bavê Adem û diya Hewa heta roja îro, mijara herî balkêş evîn û evîndarî bûye. Îca di nav gelan de gelek bûyerên evînê ku rû dane hene ku bi rêya vegotin û efsaneyan derketine serdestî gelê xwe û bûne navneteweyî. Destanên wekî Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zelîxa di nav gelek miletan de bi hezkirin hatine vegotin û belavkirin. Çawa ku ev çîrok û serpêhatiyên evînê, ji wêjeya gelekî bûne malê wêjeya herêmek an jî parzemînek, bi heman awayî carinan nehatine nasîn û di nav gelê xwe bi tenê de mane. Çîroka me ya ku bûye mijara teza me, çîrokek bi vî rengî ye. Em kurd jê re dibêjin Zembîlfiroş. Serpêhatiya Zembîlfiroş her çi qas ji aliyê rojhilatnasên biyanî ve hatibe nivîsîn û wergerên çîroka wê yê mîna zimanên erebî, elmanî û rûsî hatibe kirin jî; lê belê mixabin bi têra xwe li dinyayê nehatiye nasîn. Ne li dinyaya dûr, ne jî li cem cîranên kurdan bi xwe jî nehatiye meraqkirin û nasîn. Béguman di vê rewşê de rola kurdan û kêmbikaranîna wan a nivîsê heye; lê belê ev yek ji aliyê derveyî kurdan ve jî zêde nehatiye kirin.

Her çi qas rewş wiha be jî, mala wan ava ku sê alim û seydayên me yê hêja; Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Mûradxanê Bayezîdî, serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê ji ber ba û bahoza zivistana wêjeya devkî ku di her demsalê de pariyek jê difûre û winda dibe, xelas kirine û bi saya wan îro em ji çîroka Zembîlfiroşê agahî digirin. Wekî ku me di destpêkê de anî ziman, bi vê xebatê mebesta me ew bû ku xebat û lêkolînên ku li ser destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê hatine kirin bîr berawirdkirin ku bi vî awayî rastiya destanê derkeve holê. Lêkolîn û lêgerînên vê xebatê li dora taybetiyên sê guhertoyan hatin kirin. Ev guherto jî yê kesên navborî bûn.

Di beşa yekemîn de me xwest ku li ser bêjeya “destan”ê rave û agahiyên berfireh bên dayîn. Bi vê mebestê li ser wateya bêjeya “destan”ê ya ferhengî, civakî û edebî hate sekinandin. Peyre bi giştî cureyên destanê hatin ravekirin. Her wiha derketina wê, çeşnên wê û cureyên wê yên cîhanê hat dayîn. Di vê beşê de ji rojava heta rojhilat destanên cîhanê yek bi yek bi kurtasî hatin ravekirin.

Di beşa duyemîn de li ser destanên evînê hate sekinandin. Di binê vê sernavê de destanên evînê, wekî “rojhilat” û “rojawa” bi du sernavan hatin dabeşkirin û bi wî awayî hatin dayîn. Di mijara destên evînê yên rojhilatî de, derbareyê serpêhatiya Yûsif û Zelîxayê de zêdetir agahî hatin dayîn. Ji ber ku hevbeşiyên vê çîroka evînê û mijara teza me hebûn, di vê beşê de Yûsif û Zelîxa û serpêhatiya wan bi awayekî berfireh hate dayîn. Piştî ku destanên evînê yên cîhanî hatin rêzêkirin, destanên evînê yên edebiyata kurdî jî bi kurtasî hatin ravekirin. Di vê babetê de astengîyeke me ya herî dijwar tunebûna çavkaniyan bû. Lewre gelek destanên evînê yên kurdî hîn jî derbasî nivîsê nebûne û xebat û lêkolîn li ser wan nehatine kirin.

Di beşa sêyemîn de mijara tezê ya sereke ku Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê ye, bi awayekî berfireh hate dabeşkirin û şîrovekirin. Di serî de li ser naveroka çîrokê hate sekinandin. Ji bo naveroka çîrokê ji sê lêkolînerên hêja û ji xebatên wan hate îstifadekirin. Ew jî Emînê Evdal, Rohat Alakom û Aram Gernas bûn. Çîroka Zembîlfiroş ya Emînê Evdal ku di sala 1927’an de berhev kiriye, bi awayê xwe yê resen hate dayîn. Peyre ji gotareke Rohat Alakom ku li ser Silîva kiribû, çîroka Zembîlfiroş hate dayîn. Ji bilî van her du jêgirtinan, ji xebata Aram Gernas ya li ser Zembîlfiroş ku bi şîroveyên xwe yên hêja xemilandibû, min gelek sûd wergirt, çîroka Zembîlfiroş li gorî vegotinên devera Amedê hate dayîn. Her wiha şîroveyên Gernas di gelek beşên vê mijarê de pêşiya me ronî kirin û me ji wan îstifade kir. Ji ber ku mebesta vê xebatê derxistina holê ya taybetmendiyên destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê ye û ji ber ku derbareyê lehengên serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê de heta niha tu agahî nehatine zanîn û di nav rûpelên dîrokê de veşar mane, me da pey şopa lehengên çîrokê. Bi vê aramancê di pirtûkên dîrokê de em ketin pey şopa Zembîlfiroş ku wekî Mîr Seîdê Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekirî tê zanîn. Di encama vê lêgerînê de agahiyên balkêş derketin holê. Ji bilî lehengên sereke, lehengên din ên çîrokê jî bi awayekî berfireh hatin dayîn û nasîn. Her wiha li gorî çavkaniyan tê fêmkirin ku serpêhatiya Zembîlfiroş di sala 994ê zayînî, serdema dewleta Merwaniyan de, li Farqîna/Silîvaya Amedê qewimiye. Piştî ku çîrok rû daye, ji aliyê derwêş û dengbêjan ve li çar aliyê welêt belav

bûye û cara pêşî ji aliyê Feqiyê Teyran ve derbasî nivîsê bûye. Piştî Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Mûradxanê Bayezîdî çîroka Zembîlfiroş derbasî nivîsê kirine.

Di beşa çaremîn de hevbeşiyên çîroka Zembîlfiroş û çîrokên din hate dayîn. Dema ku mirov bi hûrbînî li qewimîn û sazkirina serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê dinêre, gelek hevbeşiyên wê û Yûsif û Zelîxa û Îbrahîmê Edhem derdikevin holê. Di vê beşê de bi giştî li ser van hevbeşiyên hate sekinandin.

Di beşa “encam”ê de ahagîyên ku di beşên sêyem û çarem de bidest ketin, bi giştî hatin nirxandin. Di jêderê de bi awayekî alfabetîk li gorî paşnavên nivîskaran çavkaniyên ku me ji wan sûd wergirt hatin dayîn. Di dawiya xebatê de wekî pêvek, her sê guhertoyên Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi awayên xwe yên resen hatin dayîn.

Di maweya berhevkirina çavkanî û amadekirina teza min de ji ber rêberî, çavkanî û desteka wan, sipasdarê mamosteyên xwe Kadrî Yildirim û Abdûrrahman Adak im. Her wiha di dema nivîsandina tezê de ji bo alîkariya wî û ya herî girîng ji ber nasîn û hezkirina min a kurdî ya bi saya wî, sipasiya Mamoste Zilkîf Xweşhêvî dikim. Dîsa ji bo parvekirina xebata wî ya hêja ya derbareyê Zembîlfiroş de ku hîn çap nekiriye, ji Aram Gernas re sipas dikim û dibêjim mala wî ava.

Aziz SAMUR

Mêrdîn 2012

KURTEBÊJE

amd.	amadekar
b.n.	berhama navborî
ber.	berawird bikin
bnr.	binêre
br.	Berhevkirin
c.	cild
ç.	çap
G.	Gulxatûn
h.b.	heman berhem
hwd.	her wekî din
j.	jîmare
r.	rûpel
vgz.	veguhêzer
wer.	wergêr
z.	zayînî
Z.	Zembîlfiroş

DESTPÊK

Di wêjeya gelerî de hinek bûyer hene ku ji aliyê encam û bûyerên xwe ve bandor û belavbûneke nedîtî didin nîşandan û dikevin asta bûyerên efsaneyî. Di wêjeya gelêrî de ji van bûyeran re *destan* tê gotin. Destan bi giştî du cure ne: Destanên Sirûştî û Destanên Çêkirî. Destanên Sirûştî wekî ku nav jî li serê ye, ne bi darê zorê, ne bi destê kesekî û ne jî di encama bernameyeke diyar de derdikevin holê. Qewimîna destanê ji van bandoran dûr e û ji awayekî ku ji awayên bûyerên jiyana rojane pêk tê. Piştî ku bûyer rû dide û bandoreke zêde li ser jiyana civakî dihêle, îcar di nav gel de belav dibe û dibe berhemeke devkî. Ji ber vê yekê mirov ji destanên sirûştî re dikare bibêje ku bi heman awayî destanên devkî ne. Piştî ku destan dibin berhemên devkî, ji aliyê hin kesên diyar an jî nediyar ve tên nivîsandin û dibin Destanên Çêkirî. Ji peyva çêkirî mebest ew e ku ji nû ve hûnandina bûyera destanê ye. Lewre nivîskar li derdora bûyera eslî digere û li gorî hunersazî û qelemşûriya xwe berhemeke nû ji dest derdixe. Vê berhemê dibe berhemeke çêkirî. Ji ber ku di berhema nû de estetîk, huner, raman û peyamek heye, ew berhem dibe berhemeke edebî. Ji ber vê yekê jî destanên çêkirî, bi heman awayî destanên edebî ne jî.

Di vê xebatê de em ketin pey şopên destaneke sirûştî û çêkirî. Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê, ji wan destanên edebiyata kurdî ye ku gelek tê nasîn û hezkirin. Li ser vê bûyera evînê, helbestvan û hozanvan gelek berhem dane. Em jî ketin pey van berheman û me vekolînek bi giştî li ser wan kir. Ji ber ku vekolîna me dê di çarçoveya sê guhertoyan de bihata kirin, ev yek karê me hêsandir kir. Ji bilî vekolîna guhertoyan, divê agahiyên giştî bihatana dayîn û li ser wan agahiyan çavkanî bihatana berhevkirin. Her çî qas li ser vê xalê astengî hatin kişandin jî, lê di dawiyê de agahiyên berfireh û têr û tije derketin holê. Wekî ku me di pêşgotinê de jî diyar kiribû, mebesta vê xebatê ew bû ku vekolînek bihêz li ser destana Zembîlfiroş bête kirin. Bi vê armancê di beşên bingehîn de li ser xalên gelek girîng encamên muhîm derketin holê. Ev xebat li ser du xalan girîngî nîşan dide ku yek jê dê bi vê xebatê xwendevan agahiyên bi rêk û pêk ji destaneke kurdî bigirin; ya din jî dê ji xwendevan û lêkolînerên kurd re bibe mîna keke vekolînê li ser destanên din ên kurdî ku mijara wan evîn e. Tiştê ku ji vê xebatê kêma ma jî, bi baweriya min guhertoyên devkî yên Destana Zembîlfiroş bûn. Lê belê ci hêla cî ve

pêkan nîn bû ku ew jî di vê xebatê de cî bigirin. Ji bo vê yekê xebatên berfirehtir divê bînin kirin. Heke li her derê welêt çîrokên destana Zembîlfiroş yê ku bi devkî tînin vegotin bînin civandin û li ser vê xebatê vekolîneke nû bînin kirin, ez bawer dikim ku dê ji her aliyê ve Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê ronî bibe.



BEŞA YEKEM: DESTAN

1. DESTAN ÇI YE?

Bêjeya “destan”ê ji aliyê wateya xwe ya ferhengê ve wiha hatiye ravekirin:

1.1. Ji bo helbestên ku bûyerên derbareyê xwedawendan, gernasên beriya dîrokê ji xwe re kirine mijar û babet; ji bo helbesta gelêrî ya qehremaniyê, ku pîvana wê 11 kîte ye; helbesta dirêj a qehremaniyê ku ji aliyê teşe û naverokê ve ji destana gerdîşî cuda ye.¹

1.2. Bêjeya destanê ji zimanê farisî derbasî zimanê tirkî û kurdî bûye. Wekî têgeheke farisî destan, bûyerên beriya dîrokê yê harîkulade û nedîtî ku li ser mijarên qehremaniya xweda û xwedawendan ku bi awayekî helbestî hatine nivîsîn.²

1.3. Destan, ew hîkaye ne ku ji aliyê olî, fezîlet û neteweyî ve qehremaniyên gelan bi awayekî helbestî vedibêjin.³

1.4. Di ferhenga Ferit Develioğlu ya bi navê Lûgata Ansîoklapedîk a Osmanî-Tirkî de wateya bêjeya destanê wiha hatiye dayîn: hîkaye, qisse, mesel, şohret, nam.⁴

Arîstoteles di destpêka pirtûka xwe ya bi navê “Poietika” ango “Hunera Helbestê” de, ji bo destanê vê raveyê dike: “Bi tevahî destan û tragedya, her wiha komedyaya û hunera dîthyrambos (Ew cure îlahî ne ku ji hêla rahîp û koroyekê ve hatine xwendin), gelek beşên flut û kîtharayê (Amûreke muzîkê ya serdema Antîk e ku ji kevanê pêk hatiye) zarî kirin bi xwe ne. Lê belê bi sê awayan ev ji hev cuda dibin: An bazarîkirina objeyên cihê dîkin, an bi amûrên cihê bi zarî dîkin, an jî bi rêbazên cihê bi zarî dîkin.”⁵

Ango li gorî Arîstoteles destan bazarîkirin e. Arîstoteles di heman berhema xwe de tîne ziman ku heta wê demê navê destanê hîn nehatiye danîn. “Heta roja îro, ji wê beşa

1. Zana Farqînî, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Weşanxaneya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000, r. 316.

2. Komisyon, *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, r. 510.

3. Nihad Sâmî Banarlı, *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Millî Eğitim Basımevi, İstanbul, 1998, r. 1.

4. Ferit Develioğlu, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitapevi Yayınları, Ankara, 2010, r.190, 202.

5. Aristoteles, *Poietika (şîir sanatı üzerine)*, wer. Nazile Kalaycı, Bilim ve Sanat Yayınları, Ankara, 2005, r. 11.

hunerê [destan] re ku ji rêzkirina gotinên pexşanî û bi pîvan pêk tê, navek nehatiye danîn.”⁶ Li gorî Arîstoteles: “Navê nivîskarên van berheman jî ne li gorî bi zarî kirinê, li gorî bikaranîna pîvanên wan hatine binavkirin. Ji hinekan re hozanên helbestê, ji hinekan re jî hozanên destanê hatiye gotin.”⁷

Bêjeya destanê ji bêjeya yewnanî ya “epos”ê tê. Di yewnanî de, têgîna “epîk”ê ji bêjeya “epos”ê tê ku wateya epos jî “şêwaz” û “kehanet” e. Têgîna epîkê, piranî ji bo vegotinên cengaweriyê tê gotin ku ew jî bi saya trajedî, komedî, şîn û helbesta pastoral dibin berhemên nemir. Hêmanên bingeîn ên epîkê, mîtolojî û efsane ne. Li vir, mîtolojî ji şîrovekirina siruştê; efsane jî ji îdealîzekirina dîrokê pêk tê. Epîk ku jê re tê gotin “dîroka zindî ya gel” divê “kûrahî û firehiya rûbarekê” di xwe de bihewîne. Bi vî awayî hemû destan, “fêkîyên pêşî yên nifşên ku ji ceribînên hêz û qeweta xeyalên wan derdikevin holê” ne. Her wiha helbestvan û qaîdeyê rastîn ew e, ew bi xwe nifş e.⁸

6. h.b.

7. h.b. r. 13.

8. Héléne Adeline Gueber, *Destanlar Kitabı*, wer. Suat Başar Çağlan, İlya İzmir Yayınevi, İzmir, 2010, r. 11.

2. DERKETIN Û BELAVBÛNA DESTANAN

Piştî ku me li wateya bêjeya destanê nihêrt, divê em hinek li ser derketina destanê, mijarên destanê û belavbûna destanê rawestin. “Destan, mijarên olî, efsaneyî û dijminatiyê ne ku bi awayekî devkî di nav gel de, di nav nifşan de belav dibin û wekî berhemên wêjeya devkî di nava gelan de dijîn.”⁹ “Di nava hinek gelan de, wekî mînak yewnanên berê, îranî, hîndî û fîniyan de hinek bûyer qewimîne ku kirinên lehengên wan bûyeran, di nava gel de bi zimanê xeyalî hatine vegotin û wekî destan belav bûne.”¹⁰

Mirov dikare bibêje ku di nava gelan de, di encama hinek bûreyên ecêb û nedîtî de, bi zimanê gelî ku hinek tiştan jixweberî zêde dikin û bi awayekî mubalexeyî vedibêjin, ew bûyer bi vegotinên mirovan di nava civatê de belav dibin û piştî demên dirêj êdî wekî hîkayeyên destanî di wêjeya devkî ya wî gelî de rûdin.

Li gorî derketin û belavbûnê, destan di sê qonaxan re derbas dibe:

2.1. Derketina Destanê: Di vê qonaxê de bûyereke dîrokî û civakî rû dide, li ser jiyana gel bandoreke zêde dihêle, bi xeyalên nifşên li pey hev zêde û mezin dibe û lehengên efsaneyî dertdikevin meydanê.¹¹

2.2. Belavbûna Destanê: Di vê qonaxê de bûyera ku diqewime û lehengên bûyerê, bi rêya kevneşopiya devkî belav dibin. Bi vî awayî ji herêmekê ber bi herêmekê ve, ji nifşekê ber bi nifşeke din ve diçin û belav dibin.¹²

2.3. Nivîsandina Destanê: “Di vê qonaxê de bûyer û lehengên wê, ji aliyê helbestvanek bi hêz ve, bi awayekî temam û helbestî derbasî nivîsê dibe. Pîrî caran nayê zanîn ku ji aliyê kê ve hatine nivîsandin.”¹³

Ji hevokên jorîn tê fêmkirin ku derketina destanê bi bûyereke siruştî dest pê dike, piştî ku bûyer rû dide, ji nêz ber bi dûrî ve, di nava gel de bûyer û bi awayê qewimîna wê belav dibe. Bi belavbûnê re bûyer bi mubalexeyê zêde dibe û formê destanê digre. Her wiha navê leheng/lehengên bûyerê jî namîdar dibe û nayê jibîrkirin. Piştî ku di nava nifşan de belav bû û li hemî welêt hate zanîn, îcar ji aliyê hin nivîskar û helbestvanên diyar an jî nediyar ve derbasî nivîsê dibe.

9. Mine Mengi, *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2009, r. 16.

10. h.b.

11. İlyas Örskaya, *Edebiyat Bilgileri*, Final Yayıncılık, İstanbul, 2006, r. 9.

12. h.b.

13. h.b.

3. ÇEŞNÊN DESTANAN

Destan, wekî çeşneke vegotinê ji aliyê avabûnê ve dibe du cure:

3.1. Destanên Siruştî an jî Devkî: “Ev destan, bûyerên devkî ne ku wekî hîkaye di nava gel de belav bûne. Nayê zanîn gelo destanên siruştî cara pêşî kê gotiye. Her wiha berhemên anonîm in. Destanên siruştî di demên ku hîn nivîs belav nebûye û zêde nehatiye bikaranîn de, ji nîfşekê heta nîfşeke din bi awayekî devkî çûye û peyre derbasî nivîsê bûye. Destanên siruştî ji aliyê derwêş û dengbêjan ve di demên cihê cihê de, bi awayê stran û kilaman hatine bikaranîn û bi wî awayî ava bûne.”¹⁴ Mirov dikare bibêje ku destanên siruştî di nav jiyana rojane de jixweber tîr meydana û di pêvajoya siruştî de derbas dibin û dikevin formên destanan.

3.2. Destanên Çêkirî an jî Wêjeyî: “Destanên çêkirî an jî wêjeyî ji aliyê helbestvanekî ve tîr nivîsîn. Di dema nivîsandina destana wêjeyî de, nivîskar bûyerê dişibîne destana siruştî û ji nû ve destanê saz dike. Ev, ew cure destan in ku ji aliyê nivîskarek diyar ve, li gorî mînakên xwe yê berê, ji bo ku bîr xwendin tîr nivîsandin.”¹⁵ Piştî ku destana siruştî di nava gel de belav dibe, bala hinek rewşenbîrên civakê dikşîne ku ev şexsiyet dixwazin wê destanê bi awayekî nivîskî bigihînin nîfşên paşerojê. Bi vê mebestê li gorî hunersaziya xwe destanê ji nû ve didin ber dest û li gorî taybetiyên qewimîna destanê ji nû ve dihînin.

14. h.b.

15. h.b.

4. DI WÊJEYA CÎHANÊ DE DESTAN

Di binê vê sernavê de em ê bi kurtasî behsa destanên wêjeya cîhanê bikin. Di wêjeya cîhanê de ji rojava heta rojhilat gelek destan derketine holê. Destanên ku tên zanîn, li gorî welat û neteweyên wan ev in:

4.1. Destanên Yewnanî

4.1.1. Îlyada: Destana Îlyada, ji aliyê Homeros ve hatiye nivîsîn û ji bîst û çar beşan pêk tê. Mijara destana Îlyada Şerê Troia ye; lê belê her çi qas şer deh sal dewam kiribe jî, destan bi tenê li ser 49-50 rojên şer disekine.¹⁶

4.1.2. Odysseia / Odysseus: Ev destan jî dewama Îlyadayê ye. Li ser serpêhatiyên cengawer Odysseus disekine. Destan, piştî girtina Troyayê, vegera Odysseus ya ber bi warê wî ve û bûyerên ku tên serê wî vedibêje.¹⁷

4.2. Destanên Latînî

4.2.1. Aeneas: Ev destan binyada xwe ji wêjeya yewnanî digire. Ji aliyê Vergilius ve hatiye nivîsîn. Heft sal piştî şewata Trûvayê, bûyerên ku li kersaxên Efrîqayê tên serê keştiyên Aeneas vedibêje.¹⁸

4.3. Destanên Frensî

4.3.1. Kilama Roland: Destana herî kevn û mezin a frensî, Kilama Roland e. Di sedsala XIIan de hatiye nivîsîn. Nivîskarê wê Tuoldus e.¹⁹

4.3.2. Aucassin û Nicolette: Ji serdema navîn maye. Bûyera şerê navbera Kontê Valence û Kontê Biaucaire vedibêje.²⁰

4.4. Destanên Spanî

16. Ali İhsan Kolcu, *Batı Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara 2003, r. 14.

17. h.b. r. 19.

18. Hélène Adeline Gueber, *Destanlar Kitabı*, wer. Suat Başar Çağlan, İlya İzmir Yayınevi, İzmir 2010, r. 71.

19. h.b. r. 97.

20. h.b. r. 117.

4.4.1. El Cîd: Di salên 1200î de hatiye nivîsîn. Derheqê cengawerê mezin ê Spanî Rodrigo Diaz de ye. Rodrigo di salên 1030-1040î de hatiye dinyayê û bi cengaweriyên xwe, rojavahiyên ku Spanyayê dagir kirine, ji welatê xwe qewirandine.²¹

4.5. Destanên Portekîzî

4.5.1. Os Lusidas: Destana neteweyî ya portekîziyan e. Ji aliyê Luis de Camoens ve hatiye nivîsîn.²²

4.6. Destanên Îtalyanî

4.6.1. Komediyaya Îlahî: “Divina Commedia” bi navê din komedyaya îlahî, di 1300î de ji aliyê Dante(1265-1321) ve hatiye nivîsandin. Berhem ji çîrokên cur bi cur ku li bakur û navenda Îtalyayê hatine berhevkirin pêk tê.²³

4.6.2. Orlandoyan: Di sedsala XVan de, bi dîtina çapxaneyê û bi Ronensansê re Orlando pêşengiya helbesta nû dike. Ji vê nîşê nivîskaran behsa serpêhatiyên evîna wî kirine û nivîsandine.²⁴

4.6.3. Gerusalemme Liberata an jî Qudsa Xelasbûyî: Ji destanên Îtalyayî, destaneke din “Gerusalemme Liberata” (Qudsa Xelasbûyî) ye. Destan ji aliyê Torquato Tasso ve di nivê duyemînê sedsala XVIan de hatiye nivîsîn.²⁵

4.7. Destanên Giravên Brîtanî

4.7.1. Beowulf: Di sedsala VIIIan de li Swêdê hatiye nivîsîn û ji wir derbasî Îngîltereyê bûye. Nayê nazîn ku kê nivîsiye. Destxeta herî kevn ku li Brîtîsh Mûseûmê ye, di sedsala Xan de hatiye nivîsîn. Derheqê jiyana saksonan de agahiyên giranbiha dihevine.

4.7.2. Dîwana Arthur: Ji aliyê hozanên Anglo-Norman ve hatiye nivîsîn. Ji hevdeh destanan pêk tê. Ja vana yê girîng, “Kaseya Pîroz”, “Kral Arthur” û “Maseya Gilover” in.

21. h.b. r. 127.

22. h.b. r. 147.

23. h.b. r. 162.

24. h.b. r. 162.

25. h.b. r. 163.

4.7.3. Robin Hood: Di salên 1400î de ji hêla Howard Pyle ve hatiye nivîsîn. Di nav destanên pexşanî de ya ku herî zêde tê hezîkirinê, çîroka Robîn Hood e.

4.7.4. Kralîçeya Pîrelkan: Di 1589an de ji hêla Edmund Spenser ve hatiye nivîsîn. Berhem bi armanca dozdeh pirtûkan hatiye nivîsîn. Nivîskar xwestiye ku li ser dozdeh dîlpakiyên exlaqî raweste; lê belê bi tenê şeş jê xelas bûne.

4.7.5. Bihiştê Windabûyî: Ji aliyê Milton(1608-1674) ve di 1667an de hatiye nivîsîn. Berhema wî ji dozdeh beşan pêk tê. Mijara destanê, qewirandina şeytan a ji bihiştê û avabûna dinyayê ye.²⁶

4.7.6. Bihiştê ku ji nû ve tê bidestxistin: Ev destan ji aliyê Milton ve di 1671ê de hatiye nivîsîn. Ev berhem wekî pêveka Bihiştê Windabûyî ye. Di vê destanê de qewirandina Hz. Adem a ji bihiştê û bi serfiraziya Hz. Îsa ya li dinyayê, dîsa ji nû ve bidestxistina bihiştê tê vegotin.²⁷

4.8. Destanên Almanî

4.8.1. Destana Nîbelungiyan: Her çî qas di sedsala XIIIan de hatibe nivîsîn jî, li ser bûyerên sedsala VI û VIIan radiweste. Nivîskarê pêşî yê destanê nayê zanîn.²⁸

4.8.2. Efsaneya Kaseya Pîroz: Di serdema navîn de hatiye nivîsîn. Pirtûka cengaweriyê ye û di sedsala XVan de ji aliyê Rhön ve hatiye nivîsîn.²⁹

4.9. Destanên Holandî

4.9.1. Yehyayê Qasidê Tobeyê: Di wêjeya Hollandî de epîka mezintirîn “Joannes Boetgezent”, ango “Yehyayê Qasidê Tobeyê” ye. Berhem ji şeş pirtûkan pêk tê û li ser jiyana Yehyayê Vafîzvan disekine. Destan ji aliyê Vondel ve di 1662yan de hatiye nivîsîn.³⁰

4.10. Destanên Fînî

26. Ali İhsan Kolcu, *Batı Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara 2003, r. 245.

27. h.b.

28. Héléne Adeline Gueber, *Destanlar Kitabı*, wer. Suat Başar Çağlan, İlya İzmir Yayınevi, İzmir 2010, r. 385.

29. h.b. r. 383.

30. h.b. r. 419.

4.10.1. Kalevala an jî Diyarê Cengaweran: Ev destan ji aliyê Zacharias Topelius û Elias Lönnrot ve di 1822yan de hatiye berhevkirin û çapkirin. Wekî gelek destanan çavkaniya xwe ji mîtolojî û folklorê digire.

4.11. Destanên Rûsî: Her çî qas wêjeya rûsî ji aliyê helbesta gelî û kilamên epîk ve dewlemend be jî, ji bilî “Kilama Bandoya Îgor” ku diçe sedsala XIIan, tu kilamên epîk heta demên dawî derbasî ser kaxizê nebûne. Ev destan li ser jiyana Prens Îgor ê Başûrê Rûsyayê disekine.³¹

4.12. Destanên Ereban: Ji bilî “Rojên Ereban” ku şer û pevçûnên çolan vedibêjin, her wiha “Destana Antere” jî ji aliyê El Asmaî(739-831) ve hatiye nivîsandin û li ser bûyerên beriya hatina Hz. Muhemmed radiweste. Wekî “Îlyada”ya ereban hatiye binavkirin.³²

4.13. Destanên Farisan

4.13.1. Şahname an jî Destana Qralan: Ev destan ji aliyê Ebû Qasim Mensûr ve hatiye nivîsîn. Bi navê Fîrdewsî tê nasîn. Li ser daxwaza Şah Mehmûd, bûyernameyên welêt ji aliyê Fîrdewsî ve hatine nivîsîn.³³

4.14. Destanên Hîndî

4.14.1. Ramayana: Ev destan, beriya zayînê di sedsala V. de bi sanskrîtî hatiye nivîsîn. Piranî wekî “Odysseia”ya rojhilat tê binavkirin. Destan li ser bûyerên navbera sedsalên 2000 û 900ê beriya zayînê disekine. Tê gotin ku ji aliyê keşîş Vâlmikî ve ku li kersaxa Ganjê jiyaye, hatiye nivîsandin.

4.14.2. Mahabharata: Hîndû vê berhemê wekî pirtûka xwe ya pîroztirîn bi nav dikan. Li gorî baweriya wan ji aliyê Vyasa ve hatiye nivîsîn. Her çî qas helbesta herî dirêj be û beriya Ramayana dest bi nivîsandina wê hatibe kirin jî, sed sal piştî wê xelas bûye. Bi sanskrîtî hatiye nivîsîn.³⁴

31. h.b. r. 439.

32. h.b. r. 474.

33. h.b. r. 475.

34. h.b. r. 513.

4.15. Destanên Çîn û Japonî: Her çi qas li Çîn û Japonyayê bi awayê ku li Ewropayê destan tê zanîn, berhem neyên dîtin jî, rojhilatî, helbestên pastoral wekî epîk bi nav dikin. Li her du welatan jî meseleke romantîk ku wekî epîk tê qebûlîkirin, bi nezma çînî, ji aliyê Înouye ve hatiye nivîsîn û ji aliyê Naobumi Ochiai ve wergera wê ya Japonî hatiye kirin. Navê berhemê “Helbesta Keçika Oldar Shirakiku” ye.³⁵

4.16. Destanên Amerîkayê: Li Amerîkayê piştî sedsala XVIIan helbesta epîk hatiye nivîsîn. Ji vê serdemê helbestavanê pêşî Anne Bradstreet e ku berhemên bi navê “Pîrelka Îlhamê ya Dehan”, “Stêrka Sibehê ya Helbesta Amerîkî” û “Sê Şahînşahiye Pêşî bi xwe” nivîsandine. Ji aliyê hin otorîteyan ve berhema wî ya “Sê Şahînşahiye Pêşî bi xwe” wekî epîka pêşî(1650) ya Amerîkayê hatiye qebûlîkirin.³⁶

4.17. Destanên Sumerî

4.17.1. Destana Gilgamişê: Piraniyên metnên vê destanê di salên du hezarî yên beriya zayînê de hatine nivîsîn. Ev destan ji 12 kevalan pêk tê. Li gorî zanyar û lêkolînerên Babîla Antîk, destan ji aliyê Sîn-leqe-unnînî ve hatiye nivîsîn. Çavkaniyên Sumerî yên li ser Gilgamişê ev in: “Gilgamiş û Aggayê Kîşî”, Gilgamiş, Hûava û Daristana Sedîr”, Gilgamiş û Gayê Bihuşte” û “Gilgamiş, Enkîdû û Binê erdê”.

Lehengê destanê Gilgamiş e û li başûrê Mezopotamyayê li bajarê Êrûkê hikumdar bûye. Li gorî rêza qralên Sumerî, di Xanedaniya pêşî ya Êrûkê de 126 sal hikumdariya wî tê dîtin. Mirina mirov û haydariya ji vê yekê; şert û mercên gerdûnî yên din ku ji mirovbûnê tînin, di Destana Gilgamişê de bi awayekî hostayî hatiye hûnandin.³⁷

4.17.2. Destana Atra-haşîs: Di sedsala 19an de ji aliyê Îngilîzan ve ciyê Nîneveh ku paytexta Asûriyan bû li Mûsilê, nêzî Tîkrîtê hate dîtin. Li heman cîyê, pitûkxaneya qralê Asûrî Assûrbanîpal hate dîtin. Di vê pirtûkxaneyê de gelek kevalên ji kîlê hatin dîtin. Peyre zanyaran li ser wan kevalan lêkolîn kirin. Di sala 1872yan de zanyarê Îngilîz George Smîth, encamên lêkolînên xwe ji raya giştî re aşkere kirin û li gorî ku digot, hinek ji wan kevalên ku hatine dîtin, behsa tofaneke mezin dikirin. Li gorî Smîth,

35. h.b. r. 539.

36. h.b. r. 550.

37. Danny P. Jackson, *Gilgamiş Destanî*, wer. Ahmet Antmen, Arkadaş Yayınevi, Ankara, 2005, r. XI-XVI.

keval behsa çêkirina keştiyekê, tofaneke mezin, piştî vekişîna tofanê gera axa ziwa ya çûkekê û xelasbûna jin û mêrekî dikir. Ev çîrok dê wekî Nûhê Babîlê bihata pêşkêşkirin.

Piştî vê bûyerê Smîth li Nînevehê lêkolînên xwe domandin û beşeke din a ku tofanê vedigot dît. Lê belê ev beş ne Destana Gilgamiş bi xwe bû, çîrokeke tofanê bû ku bi Destana Gilgamişê re têkildar bû û jê re Destana Atra-hasîs dihate gotin.³⁸

Li gorî van agahiyên Robert D. Biggs, beşeke ji Destana Gilgamişê Tofana Nûh e. Ev tofan jî di nav 12 metnên Gilgamişê de cî girtine. Wekî ku me di destpêkê de jî dest nîşan kir, Destana Gilgamişê ji 12 kevalan pêk tê. Di nav van kevalan de ya ku bala mirov dikşîne kevala 11an e. Lewra ev keval behsa Tofana Nûh dike. Dema ku mirov vê agahiyê û ya Hazim Hacanî dide ber hev, têkiliya Destana Gilgamişê û edebiyata kurdî derdikeve holê. Li gorî ku Hazim Hacanî di kitêba xwe ya erebî ya bi navê “Sefehatun Min Tarîxi’l-Kurd we Kurdistan (Çend Pel Ji Dîroka Kurd û Kurdistanê)” de neqil dike, qismek ji belgeyên herî kevin ku bi nivîsa mîxî bi zimanê kurdî hatine nivîsandin û gihîştine roja me, hinek keval in ku behsa Tofana Nûh dikin. Ev keval niha di “Muzeya Londonê” de tên muhefeze kirin û di vî warî de di rojnameya “Sewtu’r-Rafideyn” (Dengê Mezopotamyayê) de, di hejmara 53an a 1984an de meqaleyek jî hatiye weşandin.³⁹ Heke kevalên ku Smîth li ser wan lêkolîn kiriye û yên ku Hacanî behsa wan dike yek bin, wisa xuya ye ku hin beşên ji destana Gilgamişê dibe ku bi kurdî hatibin nivîsîn.

38. h.b. r. XI-XII.

39. Hazim Hacanî, *Sefehatun Min Tarîxi’l-Kurd we Kurdistan*, Hewlêr, 2002, r. 181. vgz. Mamoste Qedrî, *Dîroka Xet û Alfabeyên Ku Kurdan Bikaranîne û Berhemên Ku Bi Wan Nivîsandine*, Konferansa Zimanê Kurdî, amd. Ebûbekir Çelebî, Semra Ozbey, Davut Ozalp, Weşanên Midûriyeta Çand û Tûrîzmê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir, 2006, r. 97.

BEŞA DUYEM: DESTANÊN EVÎNÊ

Piştî agahiyên derbareyê bêjeya destanê û naveroka wê, îcar em ê li ser naveroka destanan rawestin. Wekî ku me li jorê jî diyar kir, destan ji aliyê mijarên xwe ve ji hev cuda dibin. Bûyerên olî, cengawerî, efaneyî, gelî, evînî û dijminatiyê ji destanan re bûne mijarên sereke. Wekî mînak Destana Keleha Dimdimê ji destanên cengawerî yên kurdî re mîna keke baş e. “Mijara destana Keleha Dimidimê an jî bi navekî din destana Xanê Çengzêrîn, serhildanên kurdan yên salên 1608-1610an e ku li hemberî Şah Abbasê I. ê Îranê hatine kirin.”⁴⁰

Ji ber ku mijara me destanên evînê ye, em ê niha li ser destanên evînê yên rojava û rojhilat bi kurtasî bisekinin û peyre em ê bidin pey şopa destanên evînê yên kurdî.

1. DI WÊJEYA CÎHANÊ DE DESTANÊN EVÎNÊ:

Di wêjeya cîhanê de gelek hîkayeyên evînê rû dane. Em ê hîkayeyên evînê yên cîhanê di binê du sernavan de bidin:

1.1. Destanên Evînî yên Rojavayî: Ji destanên evînê ku li rojava rû dane çend mînak ev in:

1.1.1. Mark Antony û Kleopatra: Bûyer beriya zayînê di 31î de li Misrê diqewime.

1.1.2. Napolyon û Josephine: Di salên 1800î de li Fransayê rû dide.

1.1.3. Juan û Evita Peron: Di salên 1940î de li Arjantînê qewimiye.

1.1.4. Prens Edward û Wallis Simpson: Di salên 1900î de li Îngîltereyê rû dide.

1.1.5. Voltaire û Emilie du Chatelet: Di salên 1700î de li Fransayê qewimiye.

1.1.6. Czar Nicholas II û Alexandra Federovna: Di dawiya 1800î de li Rûsyayê rû daye.

1.1.7. Richard Burton û Elizabeth Taylor: Di salên 1960î de li Amerîkayê rû daye.

1.1.8. Nelson û Lady Emma Hamilton: Di dawiya salên 1700î de li Îngîltereyê rû daye.

40. Ordîxanê Celîl, *Kürt kahramanlık Destanı Dımdım*, wer. İbrahim Kale, Avesta Yayınları, İstanbul, 2001, r. 11.

1.1.9. Tristan û Isalde: Di salên 1200î de li Îrlandayê qewimiye.

1.1.10. Pyramus û Thisbe: Beriya zayînê di sala 331î de li Împaratoriya Babîlê rû daye.

1.1.11. Khurram û Mumtaz Mahal Begum: Di salên 1600î de li Hîndîstanê rû daye.

1.1.12. Saleem û Anarkali: Di sala 1615an de li Lahorê rû daye.⁴¹

1.2. Destanên Evînî yê Rojhilatî: Di wêjeya Rojhilatî de jî gelek destanên evînê rû dane. Ji van destanên evînê çend mînak ji wan ev in:

1.2.1. Yûsif û Zelîxa: Di wêjeya rojhilat de destana evînê ya ku herî bi nav û deng e, bêguman Yûsif û Zelîxa ye. Di edebiyata ereb, faris û tirkî de gelek nimûneyên wê hene.

Di nava mesnewiyên Yûsif û Zelîxa de ya herî kevn ji aliyê helbestvanekî bi navê Elî, di 1232yê zayînê de hatiye nivîsîn. Di mesnewiyên Yûsif û Zelîxa de ji ber ku bi heman awayî jiyana pêxemberekî hatiye vegotin, nivîskarên ku vê mijarê dane ber dest, bi piranî girêdayê qisseya Quranê mane.⁴²

Her wiha di kurdî de jî Selîmê Silêmanê Hîzanî Yûsif û Zelîxa bi awayekî helbestî nivîsiye. Ev berhem ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve ji nav weşanên spîrêzê, di sala 2004an de li Duhokê hatiye çapkirin. Li gorî ku Tehsîn Îbrahîm Doskî dibêje, “Selîmê Hîzanî, yek ji wan helbestvanên kurd e ku li ser rêbaza nivîsandina mesnewiyên evînê, çîroka Yûsif pêxember ji nû ve hûnandiye û di pêşvebirina edebiyata kurdî ya di vê qonaxê de roleke girîng lîstîye.”⁴³

1.2.1.1. Çîroka Yûsif û Zelîxa

Ji ber ku di babetên pêşî de em ê li ser taybetiyên hevbeş yê çîroka Zembîlfiroş û Yûsif û Zelîxa bisekinin, divê ku em hinek behsa çîroka Yûsif û Zelîxa bikin.

41. <http://haber.mynet.com/dunyanin-en-unlu-12-ask-hikayesi-499269-foto-analiz-1>, 16 Tîrmeh 2012

42. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 132.

43. Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Yûsif û Zuleyxa Vehandina Selîmê Hîzanî*, Weşanên Spîrêz, Duhok, 2004, r. 6.

“Bûyerên çîrokê ji xewnên Yûsif û Zelîxa, çûndina Yûsif ya bi karwana Zelîxayê re ber bi Misrê ve, dîlbûn û maweya zindanê û xelasiya ji zîndanê û ji gihaştina Zelîxayê pêk tê.”⁴⁴

Mijara çîrokê wiha ye: “Hz. Adem li alema rihan xweşikî û qeşengiya Yûsif dibîne û jê re hejmetkar dimîne. Pêxemberên din jî bi heman awayî ne. Lê belê Xwedê, kerem û îhsana xwe li Yaqûb dike û Yûsif, wekî lawê wî yê dozdehan tê dinyayê. Di du saliya Yûsif de dayika wî diçe ber rehma Xwedê. Yaqûb, ji bo ku li Yûsif binêre, wî dide ba dotmama xwe Înase. Înase jî bi dilekî xweş û bi şefqet û bi hezkirin wî mezin dike. Piştî demekê Yaqûb ji Înaseyê dixwaze ku Yûsif bide wî, lê belê Înase naxwaze ku Yûsif ji xwe biqetîne. Heta mirina wê, Yûsif li ba meta xwe Înase dimîne. Piştî mirina Înaseyê, Yaqûb jî digihîje kurê xwe Yûsif. Şahê Rojava Teymûs, ji ber ku bi salan e zarokên wî çênabin, xemgîn û dilsar e. Piştî salên dûr û dirêj, Xwedê keçekê dide Teymûs. Navê keçika wî Zelîxa ye û bi xweşikiya xwe navdar dibe. Zelîxa, şevêkê di xewna xwe de evîndarê xweşikekî dibe. Wisa di binê bandora wê xewn û evînê de dimîne ku nexweşîneke giran pê digire û dikeve nav nivînan. Her çî qas ji der û dorê xwe bixwaze biveşêre jî, lê belê ji ber ku roj bi roj diçilmise û dihele, fêhmî dîkin ku bi taya evînê ketiye. Dayik û dadiya wê diçin bi ser wê de da ku dev ji wê evîna xwe berde, lê belê bi tu awayî ji ya xwe nayê xwarê. Dîsa şevêkê heman xweşikî di xewna xwe de dibîne û jê re dibêje ku divê li benda wî bimîne. Bavê Zelîxayê jî, ji ber ku bi rewşa keça xwe dizane, ji bo ku wê di bin kontrola xwe de bigire, wê dixê cîyekî tarî û wê li wir dihêle. Piştî du salên tecrîdê, dîsa di xewna xwe de hîn dibe ku ew kesê ku evîndarê wî bûye, Mîrê Misrê ye. Piştî wê xewnê, Zelîxa dilşad dibe û bi xwe ve tê. Bavê Zelîxayê jî bi nameyekê rewşa Zelîxayê digihîne Mîrê Misrê. Ezîzê Misrê jî li ser vê agahiyê kêfxweş û dilgeş dibe. Mîrê Misrê jî daxwaz dike ku Zelîxayê jê re bişînin. Zelîxa jî tevî cihêzê xwe dide rê û tê Misrê. Mîrê Misrê jî bi rê û resmek biçoş wê pêşwazî dike. Dizewicin. Lê belê ev mîr, ne ew kes e ku Zelîxa di xewna xwe de bi evîna wî ketibû. Her çî qas kulfetê wê ji bo kêfxweşî û dilgeşiya wê, xwe ji wê re kiribe dîl û bende jî, lê belê Zelîxa bi tu awayî nikare ji wî hez bike. Lewre evîna wî kesê ku di xewna xwe de dîtibû, dilê wê disot. Di nav vê rewşê de, ji xeybê dengê jê re digot ku sebir bike.

Şevêkê Yûsif di xewna xwe de dibîne ku roj û hîv bi yazdeh stêrkan re li ber wî çok didin û diçin secdeyê. Dema ku dibe sibeh û xewna xwe ji bavê xwe Yaqûb re vedibêje, bavê wî pê dide eshîkirin ku ji birayên xwe re behsa vê xewna xwe neke. Lê belê ji

44. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 106.

hevalekî xwe re behsa xewna xwe dike û ew jî diçe digihîne birayên wî. Li ser vê yekê, birayên wî ji ber çavnebarî û zikreşîya xwe, biryar didin ku Yûsif ji holê rakin. Bi hinceta gerê, ji bavê xwe Yaqûb bi darê zorê destûr digirin û Yûsif dibin û diavêjin bîrekê. Piştî ku Yûsif sê roj û sê şev di bîrê de dimîne, ji aliyê karwanekî ve ji bîrê tê derxistin û wekî dîl ji bo firoştinê dest datînin serê. Di wê navberê de birayên wî tînin û dibêjin ku dîl û bendeyê wan e û doza heqê xwe dikin. Bi ser de jî dibêjin ku heke bixwazin, dikarin wî bifiroşin wan û bi wî awayî bi bahayê şazdeh dîrheman Yûsif difiroşin karwanî. Piştî ku karwan digihîje Misrê, gelê Misrê jî pê dihise ku bendeyek bi xweşîkiya xwe navdar hatiye bazarê û ji bo dîtina wî dicivin. Di wê navberê de Zelîxa jî çav bi wî bendeyî dikeve û fêhm dike ku ew kesê xweşîk ku di xewna wê de evîndarê wî bûbû ew bi xwe ye. Bi bihayekî gelek zêde wî ji taciran dikire û tîne qesra xwe. Her çî qas dide ber dilê wî û dixwaze ku xwe bi wî bide hezkirin jî, lê belê Yûsif bersiva hezkirina wê nade û xwe jê dûr digire. Ji bo ku dilê wî xweş bike, li ser navê wî qesr û koşkan dide çêkirin. Rojekê di qesreke heft odeyî de hewl dide ku Yûsif bi ya wê bike û bersiva evîna wê bide, lê belê Yûsif wê bêbersiv dihêle û li ser vê yekê Zelîxa bi xençerekê hewl dide ku xwe bikuje. Yûsif nahêle ku zirarê bide xwe. Yûsif, ji bo ku ji zordestiya wê xelas bibe ber bi deriyê qesrê ve baz dide û dema ku dê ji derî derkeve, ji paş ve Zelîxa bi kincê wî ve dizeliqe û parçeyek ji kincê wî di destê Zelîxayê de dimîne. Peyre Zelîxa dibîne ku Yûsif li ba Mîr e û jêtirê ku Yûsif ji Mîr re behsa her tiştî kiriye û li ser vê baweriyê, ji Mîr re dibêje ku Yûsif êrîşê wê kiriye. Li ser vê bêbextiyê, Mîr ferman dide ku Yûsif biavêjin zindanê. Di wê navberê de zarokek sê mehî ku şahidê bûyerê ye, dest bi xeberdanê dike û ji Mîr re dibêje ku nelezîne û wiha zû biryar nede, heke kinc ji pêş ve hatibe qelaştin kirina Yûsif e, lê belê kinc ji paş ve hatibe qelaştin kirina Zelîxayê ye. Li ser vê yekê Mîr fêhm dike ku Yûsif bê suc û guneh e û jê lavayî dike ku ji kesî re behsa vê bûyerê neke. Lê belê bi awayekî nediyar ev bûyer di nav gel de belav dibe û jinên ku ji bûyerê agahdar dibin jî Zelîxayê şermezar dikin. Li ser van şermezarkirinan, Zelîxa ziyafetek dide wan û di dema ziyafetê de bangî Yûsif dike û wî nîşanî wan dide. Li hemberî xweşîkî û qeşengiya Yûsif, jinên li ser sifreyê bi kêrên destê xwe tiliyên xwe jêdikin û dibêjin tu mafdar î ku li hemberî vê xweşîkiyê bi evîne bikevî. Îcar ew bi eşqa Yûsif dikevin û hewl didin ku Yûsif bersiva wan bide. Piştî ku Yûsif bersiva wan jî nade, ji Zelîxayê re dibêjin ku wî biavêje zindanê, dê bi wî awayî hişê wî bê serê wî û bersiva te bide. Zelîxa jî ji Mîr lavayî dike ku Yûsif biavêje zindanê û li ser daxwaza wê, Yûsif diavêjin zindanê. Yûsif, ji ber ku ji zilma Zelîxayê xelas bûye, dilxweş e. Zelîxa jî paşiyê bi vê kirina xwe poşman dibe. Her şev diçe zindanê û ji

dûrî ve li Yûsif temaşe dike. Bi salan ev rewş wisa didome. Rojekê Mîrê Misrê xewnekê dibîne û dixwaze ku Yûsif xewna wî şîrove bike. Yûsif jî dibêje ku li gorî xewna we, piştî heft salên bi ber û bereket, dê heft salên xalî û xelayê dest pê bikin. Piştî vê şîroveya wî, Mîr wî ji zindanê derdixe û peyre dibe Mîrê Misrê. Piştî mirina mîrê wê, Zelîxa jî ji ber evîna Yûsif bi awayekî per û perîşan, di nav tunebûnê de pîr dibe û ji wê xweşikiya wê ya berê tu nîşaneyek namîne. Rojek ji rojan xwe nîşanî Yûsif dide. Dema ku Yûsif çav bi wê û halê wê dikeve, dilê wî pê dişewite, ji Xwedê daxwaz û hêvî dike ku wê bigihîne rojên wê yên berê û wê xweşikiya wê bide ser wê. Xwedê duayên Yûsif qebûl dike û Zelîxa wekî rojên xwe yên berê bi xweşikiya xwe ya nedîtî ji Yûsif re dibe bermalî û bi hev re dizewicin. Îcar, Zelîxa bersiva evîna Yûsif nade. Piştî ku Yûsif dibîne Zelîxa dest ji nîmetên dinyayê kişandiye, ji Zelîxayê re qesrek dide çêkirin da ku di jiyana xwe ya mayî de bi aramî bijî. Bi vî awayî sal derbas dibin. Rojekê, dema ku Yûsif xwe hazir dike da ku li hespê xwe siwar bibe, Cebrail tê û jê re dibêje ku wexta te tije bûye. Li ser vê agahiyê Yûsif dilxweş û dilşad dibe. Peyre sêva destê Cebrail digire, bêhn dike û rihê xwe teslîm dike. Bi mirina Yûsif re, xemsarî û xemgînî bi ser gelê Misrê ve digire. Zelîxa jî li ber kêlika gora Yûsif, şîna dilberê xwe digire.”⁴⁵

1.2.1.2. Di wêjeya kurdî de Yûsif û Zelîxa

Di wêjeya kurdî de, helbestvan serê pêşî tenê di helbest û mesnewiyên xwe de behsa lehengên çîroka Yûsif û Zelîxa kirine û peyre jî wekî berhemên serbixwe li ser çîroka Yûsif û Zelîxa mesnewî nivîsandinê.⁴⁶ Li vir em ê mijarê di bin du sernavan de bidin ber dest:

1.2.1.2.1 Helbestavanên kurd ku behsa lehengên Yûsif û Zelîxayê dikin

1.2.1.2.1.1. Elî Herîrî: Li gorî çavkaniyan ê ku herî pêşî di berhema xwe de behsa destana Yûsif û Zelîxa dike, Elî Herîrî ye. Herîrî, di çarîneke xwe de dilbera xwe ji Zelîxayê xweşiktir û balatir dibîne, her wiha di heman çarînê de behsa Leyla û “Mem û Zîn”ê jî dike. Ew çarîna Herîrî bi vî rengî ye:

Tu çêtir bûy ji Leylayê
Şîrîntir bûy ji Zuleyxayê

45. Levend A.S., *Hamdînin Yusuf u Züleyhası*, Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten, Ankara, 1969, r. 173-211.

46. Kadri Yıldırım, *Klasik Kürt Edebiyatında “Yûsuf û Zuleyxa”*, berhema neçapkirî, r. 3.

Mem û Zîn her du yek tayê
Siya zulfê kirim tala⁴⁷

1.2.1.2.1.2. Melayê Cizîrî: Mela di Dîwana xwe de gotinê tîne ser lehengên Yûsif û Zelîxa û xwe dişibîne Yaqûbê bavê Yûsif. Cizîrî wiha dibêje:

Şukur bînahiya min hat û Yeqûb dîde rewşen bû
Bi bûya Yûsufê Misrî li Kenanê beser peyda

Dîsa di malikên xwe de Cizîrî dilbera xwe wekî “Zuleyxaya Zeman” bi nav dike û wiha dibêje:

‘Alemek şehdeyiya husn û cemala te didit
Tu Zuleyxaya zeman î û çi hacet medehî

Yûsufê Sanî yî tu xanim,
Ku bi husna xwe nedîrî sanî⁴⁸

1.2.1.2.1.3. Ehmedê Xanî: Xanî jî di “Mem û Zîn”a xwe de gotinê wiha tîne ser Yûsif û Zelîxa:

Yûsuf te çira numa Zuleyxa?
Wamiq te kusa gihande ‘Ezra

Geh geh dibit wekî Zuleyxa
Pirsa me bikî tu ey şekerxa?⁴⁹

1.2.1.2.2. Helbestvanên kurd ku bi navê Yûsif û Zelîxa berhem dane

1.2.1.2.2.1. Ehmedê Xanî: Çawa li jorê hat diyakirin ku Ehmedê Xanî di berhema xwe ya “Mem û Zîn”ê de behsa lehengên çîroka Yûsif û Zelîxa dike, li gorî hinek lêkolîneran Xanî berhemeke bi navê Yûsif û Zelîxa nivîsiye. Menzûmeyeke bi navê Yûsif û Zelîxa, ji aliyê hinekan ve wekî ya Ehmedê Xanî, ji aliyê hinekan ve jî wekî

47. h.b. r. 4.

48. h.b.

49. h.b.

berhema Selîmê Silêmanê Hîzanî hatiye dîtin.⁵⁰ Li ser vê mijarê Sadiq Bahadîn Amedî wiha dibêje: “Berhemeke destxet heye ku bi navê Yûsif û Zelîxa ye. Pêşgotina wê dişibe ya “Mem û Zîn”ê û di dawiya berhemê de hevokeke bi erebî wiha hatiye gotin: Ev pirtûk ku navê xwe ji nav çîrokan ji ya herî xweşik, ji Yûsif û Zelîxa girtiye û berhema mutesewwifê mezin Ehmedê Xanî ye, nehatiye xelaskirin.”⁵¹

Dîsa ji aliyê Muhemmed ‘Elî Qeredaxî ve li Bexdayê di “Pirtûkxaneya Destxetan ya Seddam” de lêkolîna berhema Ehmedê Xanî ya Yûsif û Zelîxayê kiriye û di encama xebata xwe de destxetekê di bin numaraya 36576 de wekî tomarkirî dîtiye. Li gorî Qeredaxî sê sedemên berbiçav didin nîşandan ku ev berhem ya Ehmedê Xanî ye. Yek jê di dawiya pirtûkê de hevoka erebî ye ku li jorê me kurdiya wê da. Yê duduyan, ji bo beşeke pirtûkê sernavek bi vî rengî hatiye danîn: “Der beyanê duakerdenê Şêx Ehmed Efendî Xanî”. Yê sisiyan jî, di malikeke berhemê de navê Ehmed derbas dibe ku ew jî wiha ye:

Ez hîwî dikim ji Zatê Emced
Azad bikî bibexşî “Ehmed”

1.2.1.2.2.2. Selîmê Silêman: “Yek ji helbestvanên kurd ku berhemek bi navê Yûsif û Zelîxa nivîsiye, Selîmê Silêman e. Helbestvan di berhema xwe de rasterast negotiye ku ew ji Hîzanê ye; lê belê ji aliyê hinek lêkolînerên kurd ve wekî Hîzanî hatiye binavkirin. Yek ji wan Kurdologê Rûs Margrêr Rûdenko ye ku hinek helbestên wî yên kurdî û farisî çap kirine û dibêje ku di van helbestên xwe de Hîzanîbûna xwe aniye ziman.”⁵² Dîsa ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Dihokê berhema Yûsif û Zelîxa di bin navê Selîmê Hîzanî de hatiye çapkirin û Doskî jî wî wekî Selîmê Hîzanî dide nasîn. Qanadê Kurdo jî di berhema xwe ya bi navê Tarîxa Edebiyata Kurdî de dibêje ku “navê helbestvan Selîm e û navê bavê wî jî Silêman e. Hemdemê Şerefexanê Bedlîsî ye. Helbestvanê Mîr Şerefexan e.”⁵³

50. Kadri Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan Ehmedê Xanî Külliyyatı*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008, r.

53.

51. Kadri Yıldırım, *Klasik Kürt Edebiyatında “Yûsuf û Zuleyxa”*, berhema neçapkirî, r. 5.

52. h.b. r. 6.

53. Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed, 2009, r. 136.

1.2.2. Xusrew û Şîrîn

Çîroka Xusrev û Şîrîn bi navê Ferhad û Şîrîn jî tê nasîn. “Mijara çîroka Xusrev û Şîrîn, derbareyê jiyan û evîna mîrê Sasanîyan Xusrewê Perwîz (Z.596-628) de ye. Çîrok cara pêşî di Şahnameya Nîzamî de hatiye vegotin.”⁵⁴ “Xusrev kurê Mîrê Sasaniyan Hurmuz e, Şîrîn jî keça Mîrê Ermen, Banû ye.”⁵⁵

1.2.3. Leyla û Mecnûn

“Çîroka Leyla û Mecnûn çavkaniya xwe ji wêjeya ereban digire. Di sedsala I. a koçî de ji qebîleya Amirî bi navê Qeys, helbestvanek li ser dotmama xwe Leyla helbestên evînê vedibêje û evîna wan bi wî awayî belav dibe. Peyre li ser evîna Leyla û Mecnûn gelek berhem hatine nivîsîn û çavkaniya wan berhemên jî pirtûka Ebûbekirê Walîbî ya bi navê “Dîwana Mecnûn û Leyla” ye û dîroka nivîsandina vê berhemê jî nayê zanîn.”⁵⁶ Di wêjeya kurdî de jî ji hêla Siwadî (Harisê Bedlîsî) ve bi navê “Leyla û Mecnûn” berhemek hatiye nivîsîn.

1.2.4. Suheyl û Newbihar

Li gorî çavkaniyên li ber destê me nayê zanîn ku çîroka Suheyl û Newbihar ji aliyê kê ve cara pêşî hatiye nivîsîn. Berhemeke Îranî ye. Çîrok li ser evîna Suheylê lawê mîrê Yemenê û Newbihara keça mîrê Çînê disekine. Guhertoyeke wê ya pexşanî jî heye, lê belê nayê zanîn ku kê nivîsiye. Di wêjeya tirkî de ji hêla Xoce Mesûd û biraziyê wî Îzedîn Ehmed ve hatiye wergerandin.⁵⁷

1.2.5. Wereqe û Gulşah

Ev çîrok mijara xwe ji wêjeya erebî digire û cara pêşî di wêjeya Îranê de hatiye bikaranîn. Çîroka Wereqe û Gulşah, cara pêşî di serdeme Xazneyiyan de bi destê helbestvanek bi navê Ayyûkî hatiye nivîsandin.⁵⁸

54. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 168.

55. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 111.

56. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 194.

57. h.b. r. 227.

58. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 121.

Mesnewiya Wereqe û Gulşah berhemeke romantîk e ku bi rihekî Îslamî hatiye nivîsandin. Berhem ji 1700 malikan pêk tê. Bûyer di serdema Hz. Muhemmed de derbas dibe.⁵⁹

1.2.6. Cemşîd û Xurşîd

Çîroka Cemşîd û Xurşîd li ser evîna Cemşîdê kurê mîrê Çînê û Xurşîda keça mîrê Rûmê disekine. Di sedsala XVîan de ji hêla du nivîskaran ve hatiye nivîsîn. Yek jê Ebdî ye û berhema ku nivîsiye ji 5940 malikan pêk tê û di sala 1558an de nivîsiye. Nivîskarê din Hubbî Eyşe ye, lê belê ev berhem nehatiye dîtin.⁶⁰

Çîrokeke klasîk ya evînê ye ku bûye mijara mesnewiyan û di wêjeyên rojhilat de cî girtiye. Vê çîrokê cara pêşî helbestvanê Îranî Selmanê Savecî (m.1376), ji çîroka Gurşasb a Şahnameya Fîrdewsî sûd wergirtiye û ev çîrok ji nû ve nivîsiye. Piştî vê, hemû berhemen ku li ser Cemşîd û Xurşîd hatine nivîsîn, binyada xwe ji vê berhema 2700 malikî girtine.⁶¹

1.2.7. Huma û Humayûn

Li gorî çavkaniyan navekî din ê vê çîrokê Gulşenê Êşşaq e. Çîrok, çavkaniya xwe ji mesnewiya Kemaleddîn Hacûyê Kirmanî (m.1327) ya bi navê Huma û Humayûn digire. Çîrok li warê ereban rû daye.⁶²

1.2.8. Weys û Ramîn

Serpêhatiya vê çîrokê, bi zimanê pehlewîkî, di serdema Sasaniyan de qewimiye û hatiye nivîsîn. Wîs û Ramîn, bi awayekî mesnewî cara pêşî di sedsala XIan de ji aliyê Fexreddîn Esed Curcanî ve hatiye nivîsîn. Di wêjeya tirkî de jî cara pêşî ji hêla Lamiî ve wergera wê hatiye kirin.⁶³

1.2.9. Selaman û Absal

59. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 236.

60. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 120

61. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 251.

62. h.b. r. 261.

63. h.b. r. 269.

Ev çîrok ji aliyê Molla Camî ve hatiye nivîsîn û bi berhema wî ya bi navê Selaman û Absal, li nav alema Îslamê belav bûye. Ji berhema Molla Camî, ji aliyê Lamiî ve wergera wê ya tirkî hatiye kirin.⁶⁴

Ji aliyê binyadê ve, çîrokeke evînê ya yewnanî ye. Cara pêşî ji aliyê Huneyn b. Îsheq (m.874) ve wergera wê ya erebî hatiye kirin. Peyre ji aliyê Molla Camî ve hatiye nivîsîn û belavkirin.⁶⁵

1.2.10. Wamiq û ‘Ezra

Ji aliyê binyadê ve çîrokeke yewnanî ye. Çîrokeke evînê ya cotelehangî ye. Cara pêşî ji aliyê Sehl b. Harûn El-Destemeysanî (m. 830 z.) ve bi erebî hatiye nivîsîn û bi rêya wî derbasî wêjeya rojhilatê bûye. Ji aliyê Unsûrî, Ebû Reyhan, Bîrûnî û Fesîhîyê Curcanî ve bi farisî hatiye nivîsîn.⁶⁶

1.2.11. Cemşah û Alemşah

Çîrok li Hemedanê derbas dibe. Di çavkaniyan de nayê zanîn ku cara pêşî ji aliyê kê ve hatiye nivîsîn. Di wêjeya tirkî de ji aliyê Vizeli Bihîştî ve hatiye nivîsîn.⁶⁷

1.2.12. Şah û Geda

Ev çîroka ku li ser evîna Şah û Geda hatiye sazkirin, cara pêşî di wêjeya farisî de ji aliyê Hîlalî ve bi şeweya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Lehengên vê çîrokê, bêyî ku li hêviya berjewendiyek maddî bin, bi eşqeke ji dil û safî ji hev hez dikin.⁶⁸

1.2.13. Hetfpeyker

Çîrok cara pêşî ji aliyê Nîzamî ve hatiye nivîsîn. Di wêjeya tirkî de ji aliyê Nevizade Ataî ve di sala 1626ê zayînî de, ji heman berhema Nîzamî, wekî nezîre bi navê Heftxan hatiye nivîsîn. Di berhemê de heft çîrokên evînê cî digirin.⁶⁹

64. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 115

65. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 278

66. h.b. r. 291.

67. h.b. r. 304.

68. Komisyon, *XVI. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r. 115

69. Numan Külekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 323.

1.2.14. Xeyrabad

Ji aliyê binyadê ve, ji mijarên efsaneyên rojhilat pêk hatiye. Çîrok li ser bûyereke li Curcanê disekine. Di berhema Ettar a bi navê Îlahîname de derbas dibe. Ji wir bi rêya Nabî derbasî wêjeya tirkî bûye.⁷⁰

1.2.15. Edhem û Huma

Çîrok li Belxê rû dide. Çîrok li ser evîna Edhem û Huma disekine. Berhem li ser menqibeyên Îbrahîmê Kurê Edhem disekine ku ew jî di 714ê zayînî de li Belxê hatiye dinyayê û di 779ê zayînî de li Şamê çûye ber rehma Xwedê.⁷¹



70. h.b. r. 330.

71. h.b. r. 338.

2. DI WÊJEYA KURDÎ YA KLASÎK DE DESTANÊN EVÎNÊ

Di wêjeya kurdî de jî gelek çîrokên evînê hene. Lê belê piraniyên wan bi awayekî berhemî nehatine nivîsandin. Lewra jî îro em ji hêla teorîk ve zêde ne xwedî agahiyên berfireh in. Ji van çîrokên evînê yên di kurdî de, yek du ji wan nivîskî ne. Ji ber ku di nava kurdan de wêjeyeke devkî ya dewlemend hebûye, em bi saya vê taybetiyê ji van çîrokan haydar dibin. Bi rêya derwêş û dengbêjan gelek çîrokên kurdî yên evînê di nava gund û bajarên kurdan de belav bûne. Lê belê ne tenê bi rêya dengbêj û derwêşan, carinan jî hinek alim û rewşenbîrên kurd rabûne û ev çîrokên kurdî yên evînê bi awayekî berhemî nivîsandine. Bêguman yek ji wan ê ku divê behsa wî bê kirin, nivîksarê vê qadê yê sereke, nivîskarê Mem û Zînê, Ehmedê Xanî ye.

2.1. Mem û Zîn

Berhema Ehmedê Xanî ya şaheser, helbet Mem û Zîn e ku Celadet Alî Bedirxan jê re gotiye: “kitêba mîletê me”. Mem û Zîn, berhemeke dirêj e wekî Leyla û Mecnûna Nîzamî Gencewî yan jî Şêxê Senaniyan a Feqiyê Teyran, mesnewî ye.⁷²

Joyce Blau dibêje ku Ehmedê Xanî, gelek di tesîra Feqiyê Teyran û Nîzamiyê Gencewî de maye ku dayika wî kurd e û wekî ekola hunerî daye ser şopa medreseya Azerbaycanê ya ku Gencewî vejandiye.⁷³

Berhema Ehmedê Xanî ya Memû Zîn, li ser çîrokeke evînê disekine ku di sala 1393an de li Cizîrê rû daye. Lehengê zîlam “Mem” lehenga jin jî “Zîn” e. Navên Mem û Zînê beriya Ehmedê Xanî, di helbestên Eliyê Herîrî (1530-1600) û Melayê Cizîrî (1567-1640) de jî derbas dibin.⁷⁴

Ji bilî ku bi awayekî helbestî hatiye nivîsîn, Mem û Zîn ji aliyê Mela Mehmûdê Bayezîdî ve bi awayekî pexşanî hatiye nivîsîn. Di antolojiya çîrokên kurdî ya Firat Cewerî de çîroka Mem û Zîn bi pênûsa Mela Mehmûdê Bayezîdî hatiye dayîn. Mela Mehmûd di destpêka çîrokê de Mem û Zîn, Ehmedê Xanî û çîroka wî wiha dida nasîn.

72. Mûrad Ciwan, *Ahmedê Xanî -jiyan berhem û bîr û baweriyên wî-*, Weşana Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Stocholm, 1997, r. 85-86.

73. Joyce Blau, “Jiyan û berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)”, Çira, Stockholm, 1997. vgz. Mûrad Ciwan, h.b.

74. Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2010, r. 39.

“Ji şairê di kumancan, bi zimanê kurmancî, di tarîxa hezar û şeş sedî da, di qeseba Bayezîdê da, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telîf kiriye bi wezin bi navê Mem û Zînê, aşîq û maşûq, li wechê muxteser beyana wan dike.”⁷⁵

2.2. Siyabend û Xecê

Di gotareke xwe de li ser Siyabend û Xecê Rohat Alakom ev agahî dane: ⁷⁶

Silîva yek ji wan bajar û navendên kurdan ê herî kevn e. Yek ji wan destanên kurdan yên bi nav û deng Xecê û Sîyabend e. Gelek caran di çavkaniyan de mêrxasê mêrîn Sîyabend wek “Sîyabendê Silîvî” tê nasîn an jî tê pêşkêşkirin. Di nav gel de gelek şaxên vê destanê yên devkî hene. Dema em çavkaniyan raçav dikin, em dibînin ku şaxa ku cara pêşîn hatiye berevkirin, di sala 1854an de hatiye nivîsîn û qeydkirin. Ev bûyera derbareyê berhevkirina folklorê kurdî de bûyereke gelek balkêş e. Ji ber ku heta wê demê folklorê kurdan bala rohilatnas, folklorên û lêkolîneran ewqas nekişandibû. Ev şaxa Xecê û Sîyabend ji aliyê M. A. Jaba ve wek Balada Kurdan (Ballade Kurde) hatiye binavkirin.⁷⁷ Destan ji aliyê M. A. Jaba ve hatiye wergerandin, kurdî û fransî bi hevra weşiyaye. Tiştêkî mayîn, di van salan de kurdiya vê destanê him bi tîpên latînî û him jî bi tîpên erebî hatiye çapkirin. Tekst qasî 13 rûpelan e. Angorî vê şaxê destanê, Sîyabend ji “...tayfa Silîvanîd Dîyarbekrî...” bûye.⁷⁸ Çawa tê xuyan peyva Silîvanîd ev cara pêşîn ku di çavkanîyeke kurdî de derbas dibe û wek navê eşîrekê-qebîleyekê hatiye bikaranîn. Paşê di cîhên mayîn yên vê şaxê de navê Sîyabend bi îfada “Siyahamedî Silîvî” tê nasandin.

Tiştêkî herî balkêş jî çawa em dibînin ku keçeke mayîn bi navê Şemsê di vê şaxê destanê de cihê Xecê girtiye. Keça ku bûye evîndarê Sîyabend ji eşîra Millî, keça Temir Paşa bûye. Ev perçeyê folklorê kurdî ji aliyê ziman de jî balkêş e. Tiştêkî din ê giring jî ew e ku serpêhatiya Siyabend, bala Mela Mehmûdê Bayezîdî kişandiye û wî anîye ev destan wek nesir (nivîsên vekirî) nivîsiye. Wusan tê xuyan ku di salên 1850yî de ev

75. Firat Cewerî, Antolojiya Çîrokên Kurdî, berg/cîld I, Weşanên Nûdem, Stenbol, 2003, r. 42

76. Rohat Alakom, “Silîva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Car Ava Bûye”, Bîr, j.1., Bihar, 2005, r. 179-191.

77. Ballade Kurde resueillie et traduite par M. A. Jaba et communiquée par M. de Tchinateff. Journal Asiatique, Paris, 1869, Tome XIV, r. 153-166. vgz. Rohat Alakom, h.b.

78. Ballade Kurde, r. 156. vgz. Rohat Alakom, h.b.

şaxa Sîyabend û Xecê di nav xelkê de gelek belav bûye.⁷⁹ Serpêhatiya Siyabend di nav xelkê Silîva de bûye destaneke herî hezkirî û heta îro jî li ser zarê gelê vê deverê digere:

...

Sîyabend dibê: Xecê ez Sîyabend im, Sîyabendê Silivî me.

Xweyê tîr û kevanê zîvî me.

Minê Xeca keleş ji heft êla û heft eşîra

Ji heft bira stand, ez revîme

De niha ez li ber sekerata ji destê nêçîra pezê kuvî me.⁸⁰

Dilketiya Sîyabend wek li jor di şaxeke destanê de tê xuyan ne Şemsê ye, Xecê ye. Di beşê dawîn yê vê destanê de ku îro tê zanîn çawa em dibînin, Xecê jî wek Sîyabend riya mirinê hildibijêre.

Ez Xec im, Xeca dîn im

Ezê şera reş li ser çavên xwe bişidînim

Ezê xwe bi Sîyabendê xwe re bigihînim.⁸¹

Folklornasê kurd Ahmed Aras serpêhatiya Sîyabend û Xecê wek pirtûk çap kiriye.⁸² Yek ji wan xebatên herî baştirîn tê hesibîn. Lê belê Ahmed Aras di vê xebata xwe de zêde behsa şaxên Sîyabend û Xecê nake, ew şaxa jorîn ku navê Şemsê dide, di vê xebata Ahmed Aras de derbas nabe. Bi kurtî “Silîvabûna” Sîyabend wek tezekê her berdewam e. Bi kêmanî kesên ji vî bajarî wusan difikirin û xwe dispêrine çend zaniyarîyên dîrokî û folklorîk.⁸³

Di demên dawî de li ser evîna Siyabend û Xecê pirtûkên romanên hatine nivîsîn ku hinek ji wan nivîskarên Ronî War, Siyabedoc Semend, Huseyîn Erdem in.

79. Aleksander Jaba, *Çîrokên Kurmancî*, amadekar. Cankurt, Weşanxana Çand Nûjen, Stockholm, 2000, r. 55-57. vgz. Rohat Alakom, h.b.

80. Ev şaxa vê destanê ji aliyê Ehmedê Argîn de hatiye berevkirin, wek destnivîs e. Kopyake vê destnivîsê di arşîva nivîskar de ye. Di binê destnivîsê de: “Ehmedê Argîn 16.9.1983, Salzgitter” hatiye nivîsîn. vgz. Rohat Alakom, h.b.

81. Mihoyê Mecîd, *Ji Folklorê Me*, hejmar: 2/1993. vgz. Rohat Alakom, h.b.

82. Ahmet Aras, *Sîyabend û Xecê*, Ülkem Kitapevi, İzmir, 1993. vgz. Rohat Alakom, h.b.

2.3. Dewrêşê Evdî û Edûlê

Nayê zanîn ku bûyer di kîjan serdem û dîrokê de rû daye. Ji hêla dengbêjan ve çîroka evîna wan navû deng daye. Bûyer li derdora Çiyayê Qerejdaxê rû daye. Berhemên wekî roman di demên dawî de li ser çîroka vê evînê hatine nivîsîn. Herî dawî Eyup Kiran bi navê Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim, romanek bi kurdî nivîsiye.

2.4. Stî û Ferxik

Wekî gelek çîrokên evînê, çîroka Stî û Ferxik jî mixabin di wêjeya devkî de maye. Heke hatibe nivîsandin jî em negihîştine ku jê sûd wergirin. Di nava gel de wekî çîrok hatiye vegotin.

2.5. Sînan û Sakîne

Li gorî ku tê zanîn li devera Wêranşarê rû daye, çîroka evînê, li gorî ku ji stranên dengbêjan tê fêmkirin, di navbera kurdên êzidî û misilman de derbas bûye. Lewre li heman deverê, kurdên misilman û êzidî cîranên hev in û kevneşopiya krîvantiyê di navbera wan de gelek dewam kiriye.

2.6. Salih û Kejê

Yek ji çîrokên evînê yên devkî ku bi saya dengbêj û goyendeyan di nav miletê kurd de belav bûye Salih û Kejê ye. Mixabin ev destan jî têra xwe nehatiye hûnandin ku em îro derbareyê wê de agahiyên berfireh bidin.

2.7. Şehrîzînan û Mîrza

Şehrîzînan û Mîrza jî yek ji çîrokên kurdî yên evînê ye. Di salên dawiyê de ji aliyê Huseyin Gunduz ve rêzepirtûkeke hikayeyên evînê yên kurdî hatiye çapkirin. Lê mixabin heta niha tenê cildê yekem derketiye û bi tenê behsa sê çîrokên evînê yên kurdî dike ku ew jî Şehrîzînan û Mîrza, Mem û Zîn û Fedîle û Elî ne. Li gorî ku em ji pirtûka navborî hîn dibin, çîroka Şehrîzînan û Mîrza di navbera çemên Dicle û Feratê de diqewime. Di heman serdemê de jî mîrê herêmê kesek bi navê Gêvo ye.⁸⁴

83 Mehmet Ekmen, Siyamend-i Silivi (Silvanî) ve Hacey'in Aşk Öyküsü, Eyvan, hejmar: 5, 1989.

vgz. Rohat Alakom, h.b.

84. Hüseyin Gündüz, Kürt Aşk Hikayeleri 1, Do Yayınları, İstanbul, 2006, r. 11.

2.8. Fedîle û Elî

Derbareyê vê çîrokê de jî zêde agahî li ber destê me nîn in. Bi tenê di berhema Huseyin Gunduz de behsa çîroka vê evînê hatiye kirin. Di pirtûka navborî de behsa ciyê ku çîrok lê qewimiye nayê kirin, lê belê di ciyekî çîrokê de⁸⁵ ji ber ku navê Diyarbekir derbas dibe, mirov dikare bibêje ku warê qewiminîna çîrokê Diyarbekir an jî ciyekî nêzî Diyarbekir e. Çîrok di navbera Eliyê kurê Deman Beg û Fedîleya keça Mehmûd beg de derbas dibe.

2.9. Seyfîl Milûk û Bedî-ul Cemal

Çîroka Seyfîl Milûk û Bedî-ul Cemal ji aliyê Siyahpoş ve wekî helbestî hatiye nivîsîn. Berhema nivîskar ji 2883 malikan pêk tê. Derbareyê jiyanê nivîskarê berhemê de hinek agahiyên cur bi cur hene. Li gorî hinek lêkolîneran ew ji Diyarbekir e, li gorî hinekan jî ew bi xwe ji Urmîyeya Kurdistana Îranê ye. Celîlê Celîl jî mirina Siyahpoş wekî 1831ê zayînî nîşan daye.⁸⁶

2.10. Meryema Fileh û Eliyê Qolaxasî

Derbareyê çîroka Meryema Fileh û Eliyê Qolaxasî de zêde agahî li ber destê me nîn in. Wekî çîrokeke wêjeya devkî di nav gel de dijî. Ji navê çîrokê xuya dibe ku evîneke wisa ye ku dişibe evîna Derwêş û Edûlê ku çawa yek misilman û yek jî êzidî ye, di vê çîrokê de jî meryema fileh e û bi ihtimaleke mezin jî dê Elî jî misilman be.

2.11. Heso û Nazê

Ev çîrok jî nehatiye nivîsandin û belavkirin ku em jê sûd wergirin. Di nav wêjeya gelêrî ya devkî de hêjî ciyê xwe digire. Wekî gelek çîrokên evînê yên kurdî, ev çîroka evînê ya Heso û Nazê jî li benda eleqe û lêkolîna xwendevan û lêkolînerên kurd e.

85. h.b. r. 111.

86. Siyahpoş, *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*, ber. Bedirxan Amedî, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2006, r. 7.

BEŞA SÊYEM: DI WÊJEYA KURDÎ YA KLASÎK DE DESTANA ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ

1. NAVEROKA DESTANA ZEMBÎLFIROŞ û GULXATÛNÊ

1.1. Di wêjeya kurdî ya klasîk de Zembîlfiroş: Ev çîrok hem wekî “Zembîlfiroş” hem jî “Zembîlfiroş” hatiye bilêvkirin û nivîsandin. Beriya ku ev çîroka folklorî ji aliyê lêkolînavan ve bi awayekî nivîskî bê amadekirin, ji aliyê derwêşan ve li seranserên Kurdistanê bi her zaravayê kurdî bi devkî digel ‘erbaneyê dihat gotin. Ev çîrok gelek bala rojhelatnas û lêkolînavan kişandiye û hêjayê komkirin û çapkirinê û wergerandina bal zimanên mîna rûsî, ‘erebî, siwêdî, ermenî û elmanî hatiye dîtin.⁸⁷

Çîroka Zembîlfiroş piştî çîroka Mem û Zînê li Kurdistanê ew çîrok e ku herî zêde tê nasîn. Lewre bi rêya dengbêj û derwêşan li gelek deverên welêt belav bûye û nav û deng daye. Wekî ku li jorê hat diyarkirin, wergerandina çîrokê ya gelek zimanan, vê girîngiya çîroka Zembîlfiroş jî radixe ber çavan.

Heta niha bi navê Zembîlfiroş sê berhemên nivîskî hatine tomarkirin ku ev her sê guherto di wêjeya kurdî ya klasîk de gelek girîng in. Guhertoya pêşî ku li ber destê me ye, ji pênuşa Feqiyê Teyran (1549-1631) gihîştîye roja me, ya duduyan Zembîlfiroşa Melayê Bateyî (1675-1760) ye û ya dawî jî Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî ye ku di sala 1776an de nivîsandiye.

Beriya ku em behsa çîroka Zembîlfiroş û guhertoyên wê bikin, divê em behsa her du lehengên sereke yên çîrokê bikin û di dîroka Kurdistanê de ciyê wan bidin destnîşankirin. Li vir em ê li gorî her sê guhertoyên ku me li jorê diyar kir, nav û nasnavên lehengên sereke yên çîroka Zembîlfiroş raxin ber çavan.

1.1.1. Di guhertoyan de nav û nasnavên Zembîlfiroş û Gulxatûnê:

1.1.1.1. Lehengê Zilam: Dema ku mirov li çîrokên Zembîlfiroş yên nivîsandî dinêre, navê lehengê çîrokê yê zilam bi van nav û nasnavan derbas dibe:

1.1.1.1.1. Zembîlfiroş / Zembîlfiroş: Di berhemên Feqiyê Teyran û Mûradxanê Bayezîdî de wekî Zembîlfiroş, di ya Melayê Bateyî de wekî Zembîlfiroş derbas dibe.

87. Kadri Yıldırım, Di Wêjeya Kurdî Ya Klasîk De “Zembîlfiroş”, berhema neçapkirî.

1.1.1.1.2. Selfiroş / Selikfiroş: Bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.3. Lawê rewal: Di berhemên Feqî û Mela de derbas dibe, di ya Mûradxan de nehatiye bikaranîn.

1.1.1.1.4. Lawê feqîr: Di her sê guhertoyan de jî ev nasnav derbas dibe.

1.1.1.1.5. Law / Lawik / Kur: Law û lawik di her sê guhertoyan de, kur û kurî jî di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.6. Lawê biyanî: Di berhemên Feqî û Mela de derbas dibe.

1.1.1.1.7. Lawê vêrevan: Di berhemên Feqî û Mela de derbas dibe.

1.1.1.1.8. Kurê mîran / Lawê mîr: Bi rêzê di berhemên Feqî û Mela de derbas dibin.

1.1.1.1.9. Bejin rihan: Ev nasnav bi tenê di ya Feqî de hatiye bikaranîn.

1.1.1.1.10. Nazdar: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.11. Şahzade / paşazade / kurê padîşah: Bi tenê di berhema Mûradxan de hatine bikaranîn.

1.1.1.1.12. Feqîrek xirqepoş: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.13. Bibîya çavan: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.14. Xwedanê sela: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.15. Derwêş / lawê derwêş / derwêşê Xwedê: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.16. ‘Ebdê Xwedê: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.17. Xwoş camêr: Ev nasnav bi tenê di ya Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.1.18. Nûrîn: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe. Bi vî nasnavî nûranîbûna bejin û bala Zembîlfiroş hatiye vegotin.

1.1.1.1.19. Dîndar: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.1.20. Lawikê delal. Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.1.21. Lawikê nezan: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.2. Lehenga Jin: Dema ku mirov li çîrokên Zembîlfiroş yên nivîsandî dinêre, navê lehenga çîrokê ya jin bi van nav û nasnavan derbas dibe:

1.1.1.2.1. Kiç / keç: Ev nasnav di berhemên Feqî û Mela de derbas dibin.

1.1.1.2.2. Xatûn: Ev nasnav di her sê vayantên Zembîlfiroş de jî hatiye bikaranîn.

1.1.1.2.3. Letîfa reşxumar: Ev nasnav bi tenê di berhema Feqî de derbas dibe.

1.1.1.2.4. Bisk ‘herîr: Ev nasnav bi tenê di berhema Feqî de derbas dibe.

1.1.1.2.5. Qenca tamam: Ev nasnav di berhemên Feqî û Mela de derbas dibe.

1.1.1.2.6. Gulxatûn: Ev nasnav di berhemên Mûradxan û Mela de derbas dibe.

1.1.1.2.7. Xatûna gerdenzêr / Ewa gerden zêrîn: Bi rêzê ev nasnav di berhemên Mûradxan û Mela de derbas dibin.

1.1.1.2.8. Xatûna delal zendebazin: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.2.9. Xatûna gerden zer: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.2.10. Xatûna aqiltemam: Ev nasnav bi tenê di ya Mela de derbas dibe.

1.1.1.2.11. Xatûna gerden bi morî: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.12. Bejin dara zeytûnê: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.13. Xatûna şeng û şepal: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.14. Çavreşa Çavxezal: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.15. Rû sor e gerden bi xal: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.16. Rûreşa mest û serxwoş: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.17. Namûsfiroş / Xatûna namûsfiroş: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibin.

1.1.1.2.18. Xatûna devbikenî: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.19. Rûreşa wekî tenî: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.20. Pîsa mirara goşt genî: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

1.1.1.2.21. Bêhaya hetikfiroş: Ev nasnav bi tenê di berhema Mûradxan de derbas dibe.

Di çîroka Zembîlfiroş de ji bo her du lehengên sereke ku yek jê zilam û ya din jî jin e, ji bo her yek ji wan bi temamî bîst û yek nav û nasnav hatine bikaranîn. Di maweya teza xwe de em ê ji bo her du lehengên xwe, du nasnavan bi kar bînin ku ew jî ji bo lehengê zilam “Zembîlfiroş”, ji bo lehenga jin jî em ê nasnava “Gulxatûn” bi kar bînin. Piştî ku me hemû nasnavan li jorê bi rêz kir, em ê niha bi rêya tabloyê, van nasnavan û ciyê wan dest nîşan bikin.

Tablo: Nasnavên Zembîlfiroş û Gulxatûnê û Ciyê Bikaranîna Wan

Rêz:	Nasnavên Zembîlfiroş û Gulxatûnê		Berhema Feqiyê Teyran		Berhema Mûradxanê Bayezîdî		Berhema Melayê Bateyî	
	Zembîlfiroş	Gulxatûn	Z.	G.	Z.	G.	Z.	G.
1.	Zembîlfiroş / Zembîlfiroş	Kiç / keç	+	+	+	-	+	+
2.	Selfiroş / Selikfiroş	Xatûn	-	+	-	+	+	+
3.	Lawê rewal	Letîfa reşxumar	+	+	-	-	+	-
4.	Lawê feqîr	Bisk ‘herîr	+	+	+	-	+	-
5.	Law / Lawik / Kur	Qenca temam	+	+	+	-	+	+
6.	Lawê biyanî	Gulxatûn	+	-	-	+	+	+
7.	Lawê vêrevan	Xatûna gerdenzêr / Ewa gerden zêrîn	+	-	-	+	+	+
8.	Kurê mîran / Lawê mîr	Xatûna delal zendebazin	+	-	-	-	+	+
9.	Bejin ruhan	Xatûna gerden zer	+	-	-	-	-	+
10.	Nazdar	Xatûna aqiltemam	-	-	+	-	-	+
11.	Şahzade / paşazade / kurê padîşah	Xatûna gerden bi morî	-	-	+	+	-	-
12.	Feqîrek xirqepoş	Bejin dara zeytûnê	-	-	+	+	-	-
13.	Bibîya çavan	Xatûna şeng û şepal	-	-	+	+	-	-
14.	Xwedanê sela	Çavreşa Çavxezal	-	-	+	+	-	-
15.	Derwêş / lawê derwêş / derwêşê Xwedê	Rû sor e gerden bi xal	-	-	+	+	-	-
16.	‘Ebdê Xwedê	Rûreşa mest û serxwoş	-	-	+	+	-	-
17.	Xwoş camêr	Namûsfiroş / Xatûna namûsfiroş	-	-	+	+	-	-
18.	Nûrîn	Xatûna devbikenî	-	-	-	+	+	-
19.	Dîndar	Rûreşa wekî tenî	-	-	-	+	+	-
20.	Lawikê delal	Pîsa mirara goşt genî	-	-	-	+	+	-
21.	Lawikê nezan	Bêhaya hetikfiroş	-	-	-	+	+	-

1.1.2. Di berhemên dîrokê de şopa Zembîlfiroş

Piştî ku me nav û nasnavên lehengên xwe yên sereke di her sê guhertoyên xwe de dest nîşan kir, îcar em ê li gorî çavkaniyên li ber destê me, di dîroka kurdan de bikevin pey şopa lehengên xwe.

Li gorî ku em ji xebata Kadri Yıldırım ya ku li ser mijara Zembîlfiroşê sekiniye hîn dibin, serpêhatiya Zembîlfiroş û Gulxatûnê li Farqîna Diyarbekir qewimiye. Kela Zembîlfiroş wekî parçeyek ji qesra mezin a Farqînê tê qebûlkirin ku ev qesr ji aliyê Merwaniyan ve ji bo mîrekî kurd hatibû avakirin û mala Mîr di vê qesrê de bûye. Ev qesr di sala 1007ê zayînî de ji aliyê hukumdarê Merwanî, Ebû Nesr Ehmed Nasîruddewle kurê Merwan ve hatiye nûjenkirin. Erdnîgarzanê navdar Yaqût Hemewî di sala 1217ê zayînî de çûye Farqînê û Kela Zembîlfiroş dîtiye û behsa wê kiriye.⁸⁸

Dîsa Mamoste Qedrî di heman xebata xwe de li ser nav û malbata Zembîlfiroş van agahiyan dide: “Zenbîlfiroş mirovekî Kurd e û navê wî Seîd e. Wekî Mîr Seîdê Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekirî tê naskirin. Li gorî ku nivîskar û lêkolînavê Kurd ‘Ebdurreqîb Yûsuf di kitêba xwe ya bi navê “ed-Dewletud-Dostikiyye” de dibêje, serpêhatiya Zenbîlfiroş di dema Dewleta Merwaniyan de di sala 994ê zayînî de qewimiye.”⁸⁹

Li gorî van zanînan li ber destê me îcar em ê li dîroka Merwaniyan binêrin ka gelo bi navê Seîd û Mîr Hesên şexsiyetên dîrokî hene an na.

1.1.2.1. Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî: Di berhema Şerefxan de, di sefheya yekan de dema ku behsa fermanrewayên Diyarbekir û Cizîrê dike, bi navê Seîd şexsiyetek derbas dibe ku ew jî ne wekî kurê Mîr Hesên tê dayîn. Ev agahî di Şerefnameyê de wiha derbas dibe:

“*Seîdê Kurê Nasru-l Dewle Ehmed*: Demeke dirêj waliyê Amedê bûye. Ji bo feqîr û bêçaran gelek bi şefqet û merhemet bûye, piştgirê alîkarê qewimandinên serê wan bûye. Xelk û esker di dema fermanrewatiya wî de di nav hebûn û aramiyê de jiyan. Di sala 456ê koçî (1073yê z.) de mir.”⁹⁰

88. h.b.

89. h.b.

90. Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, wer. Ziya Avcî, Weşanên Avesta, Stenbol, 2007, r. 110.

Dîsa di heman berehmê de beriya vê pasajê dema ku Şerefxan behsa Nasr dike wiha dibêje:

“*Nasrê Kurê Nasrul-dewle Ehmed*: Li ciyê babê xwe rûnişt û hevsarên fermanrewatîyê girtin destê xwe, tam 21 salan bi saya wezîrtiya Fexrul-dewleyê kurê Cuheyr fermanrewatî kir. Çend şer û têkelhevî di navbera Nasr û birayê wî Seîd de qewimîn, Nasr li Meyafarqînê tenê bi serê xwe fermana xwe meşand. Seîd jî li Amedê li ciyê babê xwe serbixwetîya xwe îlan kir. Vê rewşa han heta mirina Nasr, di meha zîlhîcçeya sala 472yê koçî (1080yê z.) de, dewam kir.”⁹¹

Wekî ku li jorê jî diyar e, bi navê Seîd şexsiyetek di Şerefnameyê de derbas dibe ku ew jî ne kurê Mîr Hesên, wekî kurê Nasrul-dewle Ehmed hatiye dayîn. Li gorî ku em ji hevokên Şerefxan hîn dibin, Seîd li Amedê walîti an jî bi gotina wê rojê mîrîti kiriye. Serdema ku li Diyarbekir mîrîti kiriye jî salên desthilatdariya bavê wî Nasrul-dewle Ehmed (1011-1061) e û piştî bavê xwe di sala 1073yan de miriye. Lê belê li gorî ‘Ebdurreqîb Yûsuf, heke bûyera Zembîlfiroş di 994ê zayînî de qewimîbe, wisa xuya dibe ku yan Seîdê Şerefnameyê ne ew Seîd e ku em jê re dibêjin Zembîlfiroş, an jî di dîroka ‘Ebdurreqîb Yûsuf de nakokiyek heye.

1.1.2.2. Dîroka Kurd û Kurdistanê ya Mihemed Emîn Zekî Beg: Di vê berhema Mihemed Emîn Zekî Beg de navê Mîr Hesên û Seîd bi awayekî din derbas dibin. Li gorî ku em ji vê berhemê hîn dibin, bi navê Ebû ‘Elî Hesên kurê Merwanê Dostik, piştî mirina apê xwe Baz Ebû Şucab Dostik, piştî sala 989ê zayînî dibe mîrê dewleta Merwaniyan û li Diyarbekir hukum dike.⁹² Dema ku Ebû ‘Elî Hesên di sala 997ê zayînî de tê kuştinê, îcar bi navê Ebû Seîd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle şexsiyetek dertê ku navê wî Seîd e û piştî Ebû ‘Elî Hesên dibe mîr.⁹³

Lê belê di heman berhemê de Seîdê ku navê wî derbas bû, ne wekî kurê Ebû ‘Elî Hesên, wekî birayê wî hatiye dayîn. Ev Seîdê ku navê wî wekî Ebû Seîd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle derbas dibe, heta sala 1011ê zayînî mîrîti kiriye.

91. h.b.

92. Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, çev. Vahdettin İnce Mehmet Dağ Reşat Adak Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2011, r. 485.

93. Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Ziya Avcı, Weşanên Avesta, Stenbol, 2002, r. 332.

1.1.2.3. Merwaniyên Diyarbekir a Thomas Ripper: Thomas Ripper li ser Merwaniyan tezeke doktorayê nivîsiye ku navê teza wî “Merwaniyên Diyarbekir Di Serdema Navîn a Îslamî de Xanedanek Kurd” e. Ripper di vê teza xwe de navê mîrên Merwaniyan bi rêz dike û ew jî wekî pirtûkên navborî, lê belê bi awayekî berfireh behsa wan dike. Ripper jî piştî Bad bîn Dostikî behsa Ebû Elî Hesen dike ku ev camêr piştî mirina Bad Diyarbekir kiriye bin hakimiyeta xwe.⁹⁴ Piştî mirina Ebû Elî Hesen (997ê zayînî), birayê wî Mîr Mumehhîd ud-Dewle mîrîtiya Merwaniyan digire ser milê xwe.⁹⁵

Li vir navên ku derbas bûn, wekî ku di berhemên Şerefxan û Zekî Beg de jî hebûn, navên Ebû Elî Hesen û Seîd in. Di berhema Ripper de tiştekî din ê balkêş ew e ku secereya Merwaniyan bi awayekî aşkere hatiye dayîn. Dema ku mirov li secereyê dinêre bi navê Ebû Seîdê kurê Hesen nav derbas dibin û birayê Mîr Hesen jî wekî Mamek û Fedlûn hatine destnîşankirin.⁹⁶

Ripper di dawiya pirtûka xwe de behsa şexsiyetên ku di pirtûkê de derbas dibin dike. Nivîskar ji bo Ebû Seîd wiha dibêje: “Ebû Seîd Kurê Hesen ibn Nasr ed-Dewle ye û biraziyê Nîzameddînê biraziyê mîrê Merwaniyan e.”⁹⁷

Di berhema Ripper de ji bo Hesen ibn Nasr ed-Dewle ev agahî heye: “Hesen Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan (mirina wî: 458/1065-1066ê zayînî). Birayê Nîzameddînê Merwanî.”⁹⁸

Ji berhema Ripper em hîn dibin ku navê Nasr ed-Dewle Hesen e û du kurên wî hene; yek ji wan Nîzameddîn, yê din jî Seîd e. Piştî mirina Hesen Ibn Nasr ed-Dewle (1062) kurê wî Nîzameddîn ji sala 1061ê heta 1080yê zayînî li Meyafarqînê hukumdarî dike.⁹⁹

Li gorî van agahiyan mirov dikare bibêje ku Mîr Hesen wekî bi navê Nasr ed-Dewle hatiye binavkirin. Her sê kurên wî jî li gorî mezinbûnê Seîd, Nîzameddîn û Sad in.

Heke Nasr ed-Dewle Mîr Hesen be û Seîdê kurê wî jî Zembîlfiroş be, dîroka 994 ku ji aliyê Ebdureqîb Yûsuf ve wekî qewimîna bûyera Zembîlfiroşê hatibû dayîn, li gorî

94. Thomas Ripper, *Diyarbekir Mervanileri İslami Ortaçağda Bir Kürt Hanedanı*, çev. Bahar Şahin Fırat, Weşanên Avesta, Stenbol, 2012, r. 171.

95. h.b. r. 173.

96. h.b. r. 562.

97. h.b. r. 616.

98. h.b. r. 623.

99. h.b. r. 238.

heman çavkaniyê Seîd jî di sala 1071-1072an de li Amedê di meqamê mîrtiyê de miriye.¹⁰⁰ Li gorî Ebdureqîb Yûsuf divê Seîd herî kêr di 775an de hatibe dinyayê ku bûyer piştî 15-20 salan biqewime. Ev jî dide nîşandan ku Seîd nêzî sed sal jiyaye.

1.1.2.4. Dîroka Kurdistanê ya bi Rûsî: Di vê berhemê de jî bi navê Mensûr Ibn Seîd mîrê herî dawî yê Merwaniyan hatiye destnîşankirin. Ev camêr wekî nevîyê Nasr ed-Dewle hatiye dayîn.¹⁰¹

Ji bilî van berheman, di berhema Î.A. Orbelîde ku li ser folklor û jiyana rojane ya li Muksê ye û di sala 1911an de geriyaye û nivîsandiye, behsa kesek bi navê Mîr Hesen tê kirin ku agahî wiha ye: “Dema em gihîştine Gêdûka Yêgerovê, em di şevriyekê teng re derbas bûn ku li der dereceya behrê 1125 metre bilind bû û em hatine “Dêra Gêorgiyê Buhurtî” ku di nav du geliyan de bû û Ermenî jê re dibêjin “Pûtîkî”, yan jî “Pûtîkû Sûrb Gêorg”, lê Kurd jê re dibêjin “Xaniyê Mîr Hesen.”¹⁰² Amadekarê pirtûka li ber destê me Sînan Hakan jî di jêrenota xwe de dibêje ku “Rastiya wê Xana Mîr Hesen e. Dêra Pûtîkê di nav Xanê de bi cih e.”¹⁰³

Dema ku mirov li dîroka Merwaniyan dinihêre, Nasirud-Dewle di salên hukumdariya xwe de ku ji sala 1010, an jî 1011ê heta 1061ê dewam kiriye, piştî sala 1019an Farqîn wekî paytext bijartiyê û wisa maye. Lê belê beriya sala 1019an ji ber bêîstiqrariya herêmê navendek diyar tune. Bi tenê Diyarbekir wekî navend ji Merwaniyan re dixuyê. Heke mirov Mîrên Merwaniyan li gorî dewr û demên desthilatdariya wan bi rêz bike, rewşeke wiha dertê holê:

Zayînî 956-989: Mîr Baz Ebû Şucab Dostik

Zayînî 989-997: Mîr Ebû Elî Hesen

Zayînî 997-1010: Mîr Ebû Seîd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle

Zayînî 110-1061: Mîr Hesen Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan

100. h.b. r. 252.

101. M.S. Lazarev, Ş.X. Mihoyan, E.İ. Vasilyeva, M.A. Gasratyan, O.İ. Jigalina, *Kürdistan Tarihi*, çev. İbrahim Kale, Avesta Yayınları, İstanbul, 2007, r. 63.

102. Î. A. Orbelî, *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane*, amd. Sînan Hakan, wer. Têmûrê Xelîl, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2011, r. 40.

103. h.b.

Zayînî 1062-1079: Mîr Nîzameddîn (Li Diyarbekir birayê wî Mîr Seîd)

Zayînî: 1080-1085: Mîr Ebû Mûzaffer Mensûr

Li gorî dîroka Merwaniyan, ji bo Mîr Hesên û kurê wî Seîd du rewş derdikevin holê.

Ya pêşî dibe ku Mîr Hesên, Mîr Ebû Elî Hesên; Seîd jî Mîr Ebû Seîd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle be. Di vê rewşê de Mîr Hesên ne bavê Seîd, divê birayê wî be; lewre li gorî çavkaniyan Mîr Ebû Elî Hesên û Mîr Ebû Seîd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle birayên hev in.

Ya duduyan heke Mîr Hesên, Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan be, divê Mîr Seîd kurê wî be. Li gorî çavkaniyan jî 3 kurên Mîr Hesên, ango Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan hene û ji van kuran yê mezin Mîr Seîd e. Li vê derê mirov dikare bibêje ku Mîr Seîdê ku bi navê Zembîlfiroş nav û deng daye, li Amedê Mîrtî kiriye û kurê Mîr Hesên e.

1.2. Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê

1.2.1. Bi giştî derbareyê Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê de: Rohat Alakom, li ser destana Zembîlfiroş ev agahî dane:¹⁰⁴

“Destaneke ku di nav kurdan de wekî destana Xecê û Sîyabend gelek belav bûye, destana Zembîlfiroş e. Angorî gelek vegotinan bûyerên vê destanê li bajarê Silîva derbas bûne. Li Silîva qelayek heye, îro jê re dibêjin Qelaya Zembîlfiroş. Xirabe û bermahiyên vê qelayê heta niha jî mane. Angorî hin vegotinên devkî Zembîlfiroş xwe ji vê qeleya bilind avêtiye û paşê jî miriye. Ji derve delîlên arkeolojîk hin çavkaniyên mayîn jî hene ku cî û warê bûyerên destana Zembîlfiroş wekî Silîva nîşan didin. Yek ji wan çavkaniyan di sedsala 18an de ji aliyê Mirad Xanê Beyazîdî de hatiye nivîsîn. Ev berhema di derbareyê Zembîlfiroş de gelek salan wusan wekî destnivîs maye. Destnivîs cara pêşîn di sala 1967an de wekî pirtûk li Iraqê ji aliyê Giw Mukriyanî ve tê weşandin.¹⁰⁵ Ev şaxa dawîn, ne şaxeke folklorîk e, wek şaxeke edebî ji aliyê Mirad-Xanê Beyazîdî ve hatiye nivîsîn.¹⁰⁶ Li ser vê pirtûkê piştî çend salan lêkolîneke dirêj di

104. Rohat Alakom, “Silîva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Car Ava Bûye”, Bîr, j.1., Bîhar, 2005, r. 179-191.

105. Mirat-Xanê Beyazîdî, *Çîrokî Zembîlfiroş*, Çapxaney Hewlêr, 1967. vgz. Rohat Alakom, h.b.

106. Ev şaxa destana Zembîlfiroş wek şaxeke edebî hatiye amade kirin û di nav pirtûka Musaelyan de cih girtiye. Ji aliyê Mirad-Xanê Beyazîdî ve hatiye nivîsîn. vgz. Rohat Alakom, h.b.

sala 1979an de hatiye weşandin.¹⁰⁷ Di vê nivîsê de tê diyarkirin, Zembîlfiroş yek ji wan mîrê Merwaniyan e, navê wî yê rastîn jî Seîd e. Angorî vê dîtînê Seîd yek ji kurê Ebu Nasir Ehmed e.¹⁰⁸ Çawa tê zanîn paytextê vê mîritiyê Silîva (Mayafarikîn, Silvan) bûye. Hin şaxên Zembîlfiroş yên folklorîk bi xwe jî hene ku nîşan didin wekî bûyerên vê destanê li Silîva derbas bûne.¹⁰⁹

Çawa tê xuyan hin zaniyariyên arkeolojîk, dîrokî, edebî û folklorîk nîşan didin ku destana Zembîlfiroş cara pêşîn li Silîva hatiye gotin û hêdî hêdî li deverên mayin belav bûye. Heta niha gelek şaxên destana Zembîlfiroş hatine weşandin.”¹¹⁰

1.2.2. Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê: Li vir em ê bi kurtasî çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê li gorî ku Alakom weşandiye,¹¹¹ bidin. Bi kurtasî naveroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê wiha ye:

Zembîlfiroş debara xwe tenê bi firotina zembîlan (sêlik) pêk tîne. Kesekî belengaz û kesîb e. Ew tax bi tax, kuçe bi kuçe digere, zembîlan difroşe. Kesekî çeleng, spehî û xweşik bûye. Angorî şaxeke vê destanê Zembîlfiroş berê Mîr û dewlemend bûye, paşê jiyîneke sade ji xwe re hilbijartiye û xizan ketiye. Rojekê tê bajarê Silîva cîwar dibe, li vir ji xwe re zembîlan difroşe.

Ji ber çelengbûn, bejn û bala wî, rojekê dema ew dîsa kuçe bi kuçe digere, rastî jina mîrê bajêr tê. Dilê vê jinikê dikeve Zembîlfiroş û pêsîra wî bernade. Zembîlfiroş bi xwe jî kesekî xwedî jin û zarok e. Çavên wî di jina kesî de tune ye, kesekî serbilind, xwedî nefis e. Jina Mîr çî dike nake, nikare wî ji rê derxe, bi wî şa bibe û rojên xweş bi hev ra derbas bikin. Çawa em ji naveroka destanê û gotinên jina Mîr fam dikin, ew mîrê xwe davêje alîkî, dixwaze Zembîlfiroş kaşî nav cî û nivînan bike. Her çiqas ew bi gotinên xwe yên şehwetî dinyaya Zembîlfiroş serûbin dike, dîsa jî Zembîlfiroş li ber xwe dide, nêzîkê wê nabe. Ew zarokên xwe difikire. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jiyîna Zembîlfiroş pêk tînin. Di dawiya destana Zembîlfiroş de çî tê serê

107. Zembîlfiroş I-II, Pale, hejmar: 3-4, 1979, Uppsala, Swêd. vgz. Rohat Alakom, h.b.

108. Zembîlfiroş I, Pale, rûp.31. vgz. Rohat Alakom, h.b.

109. Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Diyarbakır Efsaneleri II ve Diyarbakır Üzerine Sekiz Bildiri*, Ankara, 1990, r. 142. vgz. Rohat Alakom, h.b.

110. Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, Nûdem, Stockholm, 1994, r. 85-87. vgz. Rohat Alakom, h.b.

111. Rohat Alakom, “Silîva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Car Ava Bûye”, *Bîr*, j.1., Bihar, 2005, r. 185-187. vgz. Rohat Alakom, h.b.

Zembîlfiroş û Xatûnê? Bersîva vê pîrsê angorî çend şaxên destana Zembîlfiroş ji hev cuda dibin:

1.2.2.1. Dema Xatûn pey Zembîlfiroş dikeve diçe mala wî, çawa em dibînin Xatûn jina Zembîlfiroş dixapîne, dikeve nav cihê mîrê wê. Ew lempê vedimirîne, Zembîlfiroş dema tê dikeve nav cihê xwe wekî razê, Xatûn ji bîr dike xirxalê lingê xwe derxe û Zembîlfiroş wê çaxê fam dike ku ew ne jina wî ye. Ew Xatûn e. Zembîlfiroş dibe teyrek di kulekê re difire diçe. Xatûn heft sal li pey wî digere, li serê çiyakî rastî şopa wî tê, dibine xûşk û bira, piştî çendekî, Xatûn dimire.¹¹²

1.2.2.2. Li ser kaniyekê rastî hev tên, Xatûn dixwaze Zembîlfiroş ramûse, dema Xatûn zimanê xwe dixê devê Zembîlfiroş herdu jî dimrin.¹¹³

1.2.2.3. Agir ji devê Xatûnê derdikeve, herdu jî dişewitin.¹¹⁴

1.2.2.4. Diçin cennetê, digihêjin mirazê xwe.¹¹⁵

1.2.2.5. Mîr dema pê dihesê wekî jina wî çûye bal Zembîlfiroş, lêdixê Zembîlfiroş dikuje.¹¹⁶

1.2.2.6. Zembîlfiroş xwe ji qesrê de davêje perçe perçe dibe.¹¹⁷

1.2.2.7. Dema Mîr dixwaze Zembîlfiroş bikuje, Xatûn dikeve navberê. Kêrê ji destê Mîr digre, zikê Mîr re dike, ew tê kuştin. Paşê Xatûn, Zembîlfiroş û jin û zarê wî bi tevayî diçin cîhekî wusan ku dengê axa û mîran li wir nayê.¹¹⁸

1.2.2.8. Jina Zembîlfiroş û Xatûn dibine hêwiyên hev, bi hevra dijîn.¹¹⁹

1.2.2.9. Zembîlfiroş û Xatûn di nav xwe de peymanekê gîrêdidin wekî dest ji pêşîra hev berdin. Paşê Zembîlfiroş ji ber daxwaziya bavê, diçe bajarê Diyarbekirê dibe Mîr.

Di nav van şaxan de Şaxa şeşan nîşan dide ku Zembîlfiroş xwe jor de avêtiye û miriye. Ev şaxa hebûna Qelaya Zembîlfiroş li Silîva tîne bîra mirovan. Ji bo vê yekê ev

112. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş-Kurdska Poema i ee Folkornie Versii (Zembîlfiroş-Poema Kurdî û Şaxên Wê Yê Folklorîk)*, Moskova, 1983, şaxa I. vgz. Rohat Alakom, h.b.

113. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa II. vgz. Rohat Alakom, h.b.

114. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa IV. vgz. Rohat Alakom, h.b.

115. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa VI. vgz. Rohat Alakom, h.b.

116. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa VII. vgz. Rohat Alakom, h.b.

117. J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş*, şaxa X. vgz. Rohat Alakom, h.b.

118. Şaxa Emînê Evdal (Di nav pirtûka Musaelyan de cîh girtiye). vgz. Rohat Alakom, h.b.

119. Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî (Ev destnivîsa şaxa Zembîlfiroş ya ku Qanadê Kurdo xwe berev kiriye ji 16 rûpelan pêk tê)*. vgz. Rohat Alakom, h.b.

şax, hin pêwendiyên hevbeş yên di navbera qehremanê destana Zembîlfiroş, Qelaya Zembîlfiroş û bajarê Silîvayê hene, xurttir dike. Beşa dawîn ya vê şaxê waha diqede:

...

Qesrê mîrê du derge ye

Pir bilind e dor pencere

Zembîlfiroş xwe avît xarê

Parî lê bû sed hezarê.¹²⁰

Çawa tê dîtin heta mirinê jî Xatûn li pey Zembîlfiroş e, pêşîra wî bernade. Di çend şaxên destanê de Zembîlfiroş her çiqas ji ber Xatûnê direve jî, ji aliyê din ve wusan tê xuyanê bi kêmanî herdu qehremanê destanê dibin xûşk û bira. Dema em zordestiya mêrê Xatûnê didin ber çavan, em dibînin ku hevkarîyek û dostanetiyek di navbera Zembîlfiroş û Xatûnê de li dijî Mîr peyda dibe. Ev yek Zembîlfiroş û Xatûnê nêzîkî hev dike. Ji aliyê din ve ji ber xizanî û belengaziyê, jina Zembîlfiroş jî, li dijî Xatûnê stûxar e. Ev yeka jî wekî faktorekê, pêwendiyên Zembîlfiroş, jina wî û Xatûnê ji dijmintiyê diparêze û wan di xalekê de dighîne hev û dijayetiya van her sê kesan kêmtir dike. Bêguman ev yeka, mesaja destanê ya li ser helaliyê û dilpaqijiyê ava dibe, nahejîne. Ji ber ku di destanê de motîva helaliyê û dilpaqijiyê gelek xurt e. Lê belê hevbandûriya bûyeran bivê nevê çend dijiwariyan ji bo Zembîlfiroş peyda dike, wek mîsal hebûna du jinan û newekhevdîtina Xatûn û mêrê wê... Di şaxeke destanê de li dijî mêrê Xatûnê muxalefetek peyda dibe. Wê çaxê Xatûn wekî dijmîneke yekemîn nayê hesibîn. Di her du şaxên dawîn de çawa em dibînin Zembîlfiroş jî êdî hatiye guhartin û bûye xwediyê toleransê.

Di “Folklor Kurmanca” ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal de ku di sala 1936an de ji aliyê Neşra Hukumeta Ermenistanê Şêwrê li Yêrêvanê hatiye çapkirin, behsa çîroka Zembîlfiroşê hatiye kirin. Li sê ciyan çîroka Zembîlfiroş derbas dibe, ji vanan du jê bi tenê helbest, yek jê jî hem bi vegotin û hem jî bi helbestê hûnandiye. Em ê li vir beşê dawîn bidin ku wiha ye:

120. J. S. Musaelyan, Zembîlfiroş, r.140. vgz. Rohat Alakom, h.b.

ZEMBÎLFROŞ¹²¹

Zembîlfroş xortekî feqîr î, belengaz bû, Bacêr da ji xwe ra selik difrotin, pê wê karê zarê xwe xuey fikir.

Rojekê jî selkê xwe hilda, soqaqêra çû, çû ber mala mîr ra derbaz bû.

Kulfeta mîr pencerê ra berjêr nihêrî, Zembîlfroş dît. Zembîlfroşî gelek bedew bû, dilê wê kete Zembîlfroş. Dilekî na, heft fila heband. Benî xatûnê zû-zû kire ser cariyêd xwe, got: Herin Zembîlfroş soqaqê bigrin, bînin. Bêjin mîr gazî te dike, wê qismetekî bide te.

Du cariya da pey hev, çûn cem Zembîlfroş, gotin:

-Zembîlfroş, lawkê delal,

Te sineta selkê du al,

Hinek husnê Êsif li bal.

Zembîlfroş selika tînî,

Soqaq soqaq digerinî,

Nan û avek pê distînî,

Kulfetê xwe pê didebirînî.

Zembîlfroş, lawkê dîndar,

Tu keremke, em herin mal,

Mîr te dixwaze mexsûs dîndar.

-Hûn carîngê min e delal,

Min bihîstîye mîrî ne mal,

Selka kê ra bikim bazar?

-Zembîlfroş, lawkê feqîr,

Te sineta sêlkê hêjîr,

Tu gotina xwe neke ji bîr.

121. Heciyê Cindî & Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 388-393.

Cariya dîsa got: - Zembîlfroş, tu bi me re nekeve eynatê, were em herin, tu bihakî giran dayne ser selkê xwe. Mîrî ne tima ye, wê qismetekî zef bide te.

Ewan cariya ew law danî,
Derî dadan dergevanî,
Law li ber bû lêp dizanî.

Zembîlfroş hatibû ji der da,
Silavek xatûnê veda.

Xatûnê got: -Tu ser serî, herdu çeva.

-Hey xatûna min e delal e,
Ezê selka kê ra bikim bazar,
Zarê min birçî ne, dîkin zar-zar

-Kuro bes e bike vê gotinê,
Min tu ne aniyî bona selika firotinê,
Min tu aniyî bona kêfa xinê.

-Hey xatûna min e gez tê,
Were em xeber din ji cimaetê,
Ev xeber eslê min ra bêqeyde tê.

-Zembîlfroş, lawkê feqîr,
Tu keremke ser doşeka mîr,
Bikşîne qelna wezîr.

Lawik were misiletê,
Vê şuxlî da kara me tê,
Eslê te ra gune ne tê.

Zembîlfroş gelekî fikirmîş bû, xatûn Benî kulfeta mîr bû, got: - Ez bi xwe jî kumancekî tewakel, wekî ez pê ra rabim, rûnem, wekî mîr pê bihese, ez kû da jî herim, wê min bigre, kulfet û zara va me xeza bike.

Got: - Xatûna min e gerden herîr,
Hedê min çi ye ez bêm ser doşka mîr,
Ez nakşînim qelîna wezîr.

- Zembîlfroş, lawkê avas,
Tu gerek xwe bikî qeyas,
Were razê nav kurk û livas.

Lawik, were misiletê,
Vê şuxlî da kara me tê,
Eslê te ra ew lêp ne tê.

- Xatûna min e gerden tamam,
Tu şerbeta kas û du cam,
Tu serdapê li min heram.

- Kuro, bes e bike filan û bêvan,
Were razê nav doşek lihêfa,
Her tim tev da gul û sêva.

Benî xatûnê bişkokê pêşîra xwe vekir, memkê xwe qerqaş nîşanî Zembîlfroş kir, tevizîk canê Zembîlfroş ra çû.

Paşê Zembîlfroş kenîya, xanim şa bû.

Xatûn kenîya xwe mitele kir,
Sur li carîya eşkere kir,
Husna şabûnê carîya vekir.

- Werin temeziya bidin ber kofîa,
Bikin govend li van çîya,

Gede hatiye hedayetê.

Zembîlfroş avek dixweste,
Çil carî ber da dadiweste,
Lê xatûnê av anî da dest e.
Gede ji dest girt av e,
Kerbê daye dil û nav e.

Zembîlfroş qesrê da girtî bû,
Gelekî siqilmîş bû, hêrs bû,

Got: - Ji malê heta mezelê,
Her rêk diçe ji bircê kelê,

Zembîlfroş hevraz dinêrî,
Zef û zef difikirî,

Berjêr dinhêrî, dikewgirî
Kelek hatê, rûnişt girî.

Zembîlfroş fikirî, got: - Ezê xwe bircê kelê ra bavêm. Zembîlfroş xwe bircê qesrê ra avît jêr, ket, hevekî rihet bû û ravû, revî.

Zembîlfroş diçû mal e,
Elê pê ra çeng û qal e,
Go: - Kanê risqê herdu tifale.

- Jinik, min xatûnek divû li jor,
Ewê selik standin zor,
Ewe bi qewat bû, gele bi zor.

Pey gotina Zembîlfroş ra Elê li serê xwe xist, giriya, got: - Zembîlfroş, ne eva du roj e tu çûy, xela ye, zarê min birçîna mirin, te çî anî serê min.

- Jinik, rave, tendûrê dade,
Dîzê bide ser mîna hercar,

Lazim e îşev bivî necar.

Elê got, “wey Xudê mala te xirab ke, te çi aniye ez daynim ser tendûrê.”

“Jinik, hemîn tişteke cem min tune, tu rave dîzikê bide ser tendûrê, hine kevir bike dîzikê, bira bike qilpe-qilp. Zarû wê bi guman bin, heta dereng wê razên, îja emê sibê ravin tişteki bikin.”

Elê giriya, zûke-zûka zara bû.

Zembîlfroş çawa got Elê jî usa jî kir.

Elê rabû, dîz da ser tendûrê, xêleke şevê çû, zarû razan, ew bi xwe jî ravûn, birçî razan.

Nêzîkî berbangê Banû xatûn xwe hişiyar bû, nihêrî ki Zembîlfroş tune. Ravû, kincê xwe xwe kir, çû cem pencerê, lê nihêrî ki pencere vekiriye. Keleke girî hatê, girîa, ewê jî mîna Zembîlfroş xwe avît, ket soqaqê, çû here mala Zembîlfroş.

Ezman bi steyrka tijî bû, mîna tendûra zimzimî.

Xatûn Benî çû gihîşt mala Zembîlfroş, rabû ser kulekê, kulekê da nihêrî Zembîlfroş wê nav ciyê jina xwe da razaye.

Benî xatûnê nemerdî kir, xwe kuleka Zembîlfroş da avît, vî çaxî tevizîk hate Elê.

Beniyê kincê xwe êxist, taqa kirasê xwe ket nav ciyê Zembîlfroş, pê şa bû, devê xwe kire gerdana Zembîlfroş, ramûsa. Zembîlfroş westiyayî bû, xwe hişiyar nebû, Elê hişiyar bû, paşê elamî Zembîlfroş kir. Zembîlfroş hişiyar bû, ew û Benî hevekî devdû şa bûn, Elê qebûl nekir.

Sive safî bû, xatûnê kincê xwe xwe kir, ewê û Zembîlfroş xebera xwe kirin yek, xatûn vegeriya mal.

Wê sibê jî mîr ji bajarekî dinê hate mal, lê nihêrî xatûn wê ne li mal e, şaş û metel ma.

Mîr got: - Xatûn Benî, vê sibê şeweqê tu ji ku derê têy?

- Ez çûme nava bacar.

- Çima?

- Seyranê.

Mîr ker bû, xatûn Benî hindur da hîşt, carî birin derva, yek, yek ji cariya pirs kir, çika çima Benî çûye digere.

Yekê got, wekî hal-hewalê Benî xatûnê ev e, dilê wê ketiye Zembîlfroşê taşa me.

Mîr carî berdan, ew çûn şuxlê xwe.

Mîr hat dora xatûnê, got: “Xatûna min, ev çi ecêb, tu rast dibêjî ki ez çûme nava bacar?

- Belê,

- Hilbet şuxlê te çi bû nav bacêr?

- Dilê min xast, ez çûm.

Mîr yekî fêldarî binî va vû, ewî Benî arxayîn kir. Ravû çû ber dêrî, gazî sê ersawila kir, çi gilî gotinên wî hebûn ji wan ra got, berdan çûn. Sekinî êvarê tarî, wan ersawila Zembîlfroşî dêst da anîn cem mîr.

Zembîlfroş taqa kiras-derpê û pê wî qeyd-çidar kirî, Benî xatûn jî tezî kirin û herdu avitine zîndana bûzê.

Du sihetê din şûn da mîr û her sê ersawila va çûn zîndanê, mîr kêreke girte xwe.

Wextê derê zîndanê vekirin, Zembîlfroş û Beniyê va tê da serma dircifîn.

Çira girtin xwe çûn hundur.

Mîr emir kir ser xulama, got: - Kirasê Zembîlfroş jê kin. Xulama kiras jê kir.

Mît kêr hilda çû te revî Zembîlfroş. Rengê Zembîlfroş ji tirsê çû, qudûmê wî ricifîn.

Mîr nêzikî Zembîlfroş bû, kêr avîte renê Zembîlfroş, wa qet kir. Şewateke zor dilê Benî xatûnê ket.

Xulam wekî ku sekinîne guhdar in, wan jî qebûl nekir.

Benî xatûn piş mîr fetilî, nişkê va milê wî girt, kêr ji destê wî derxist.

Xulam revîn, derketin.

Benîê kêr bi destê rastê girt û berayê da zikê mîr. Zikê mîr qelişî, hûr û rûviyê mîr hatin xar, mîr welgeriya, ket.

Xulam revîn çûn malê xwe, elamî kesî ne kirin.

Benî çû mala xwe, berê kilîta qeyd û çîdara anî, vekir, Zembîlfroş bire mal, himamlemîş kir, birîna wî girêda.

Ravûn ketin nav hebûna mîr, çi lazim bû hildan, çûn mala Zembîlfroş, Elê û zara va hildan, çûn welatekî din ê dûr, çimkî meriyê qebîla mîr gele hebûn, Zembîlfroş wê zirara xwe ji wan bidîta. Lema jî kulfetê xwe va çûn cîkî usa, wekî dengê axa û mîra lê neyê.

Got: Xudoê Qaso, 1927 s.

Nivîsî: E. Evdal

Dema ku mirov li berhevoka Emînê Evdal dinêre, li gorî çîrokên Zembîlfroş tên zanîn, hin nakokî dertên holê. Wekî mînak bihevşabûna Zembîlfroş û Xatûnê bi tenê di

vê çîrokê de derbas dibe. Her wiha avêtina wan a zindanê û xelasbûna wan, dîsa di her sê guhertoyên nivîsandî de derbas nabin. Dîsa tiştêkî balkêş ku di vê berhevokê de dertê pêşberî me, di tu çîrokê de an jî guhertoya nivîskî de navên xatûn û jina Zembîlfiroş rasterast derbas nabin; lê belê di vê berhevoka Emînê Evda de ku di sala 1927an de hatiye nivîsandin, navên Xatûn û jina Zembîlfiroş bi awayekî aşkere derbas dibin. Li gorî vê çîrokê navê Xatûnê Benî Xatûn an jî Banû Xatûn derbas dibe. Navê jina Zembîlfiroş jî wekî Elê derbas dibe. Her çî qas vê berhevokê û guhertoyên me yên nivîsandî li hev nenihêrin jî, ji bo wê rojê û di şert û mercên Qafqasyayê de nivîsandina çîrokên Zembîlfiroş girîng e û ji bo wêjeya kurdî dewlemendiyek e.

Dîsa bi qelema lêkolîner Aram Gernas li derdora Diyarbekir çîroka Zembîlfiroş ya ku di nava gel de bi awayekî devkî tê zanîn, hatiye berhevkirin. Dema ku mirov li berhevoka Gernas dinêre, mirov dibîne ku derbareyê çîroka Zembîlfiroş de agahiyên tekûz û bi rêk û pêk derketine holê. Çîroka Zembîlfiroş a berhevoka Aram Gernas, bi awayekî pexşanî wiha ye:

DESTANA ZEMBÎLFIROŞ

Di serdemeke kevnare da mîrek û kurek xwe hebûne. Teled-weledê mîr her ew kur bûye. Ji ber wê yekê jî, li ser desta, bi nazikî hatiye mezinkirin. Kurê mîr bi ser û sincê xwe, bi xweşikbûna xwe, bi bejin û bala xwe bê qusûr bûye. Di wê jîyana debdebe da lawik mezin bûye, ketiye çax û bengê xwe, bûye xortekî ciwanmerd.

Kurê mîr gelek caran bi wezîrê bavê xwe ra derdiket nêçîrê, derdiket seyranê. Rojek ji rojan dîsa ew û wezîr ji nêçîrê vedigerin malê. Li ser riya malê di ber goristanekî da derbas dibin. Di goristanê da tiştêkî bala kurê mîr dikşîne. Li ser rûyê gorekî qafîkê serê însanekî dibîne, radike qafîkê serî û bi meraq lê dinihêre. Heta wê hingê derheqê mirin û piştî mirinê tiştêkî hîn nekiriye û nebihîstiye jî. Lewra jiyana wî ya dewlemend û rengîn, civata dora wî ji pîrsekî weha dûr bûne.

Kurê mîr bi meraq û ecebmayî ji wezîrê bavê xwe pirs dike:

- Wezîr, tu dikarî bêjî gelo ev çî hîkmet e?
- Ev, qafîkê serê însanekî mirî ye mîrê min, dibêje wezîr.
- Mirin çî ye?
- Mîrê min, hemû însan û hemû mexlûqên bi can ên rûyê dinê demekê dijîn û piştî dimrin. Piştî mirinê wana binax dikin û demek şunda mirîyên binaxkirî dikevin vî halî.
- Ew ji ber birçîbûnê yan jî sedemek din mirine?

- Pêşîyên te mîr bûne, lê ew jî mirine mîrê min, ji ber ku mirin guhdarîya dewlemend, feqîr, ciwan û kal û pîr nake. Rojekê tê herkes dikeve tora wî, yanî kes nikare xwe ji mirinê xilas bike.

- Yanî tê wê maneyê ku, ez ê jî Rojekê bimrim û bikevim vî halî?

- Belê mîrê min, wexta roja me تمام bibe tu jî, ez jî, yanî em hemû dimrin, dibêje wezîr.

Pişî vê xebirdanê kurê mîr dikeve ramanên kûr, dikeve xeyalan. Hestên wî coş dibin û evîneke Xwedayî di dilê wî da gul vedide. Digihîje qesrê, bi girîn sijda dibe û biryara xwe dide ku, dev ji mal û milkên xwe, ji mîrîtyê, ji jîyana debdebe berde û di rîya Xwedê da bi keda destê xwe derê jîyanekî nû li xwe veke. Piştî gazî jina xwe dike, fikir û ramanên xwe jê ra dibêje. ” dibê, "ez ji îro pêda dev ji hemû mal û milkên xwe, dev ji selteneta xwe berdidim. Ez ê êdî bi keda destê xwe jîyana xwe biromînim. Eger tu dixwazî bibî şîrkê vî jîyana feqîr û dev ji seltenetê berdî, bi min ra wer em ê serê xwe hildin û ji vî welatî herin. Na eger ev jîyana dewlemend bi te şîrîn tê û dev jê bernadî, em ê ji hev veqetin." Jina wî dev ji mîrê xwe bernade û dibêje: "Çawa di rojên xweşî da li ba te bûme, di rojên tal û teng da jî ezê li ba te bim û jîyana te ya faqîrî par vakim."

Kurê mîr û jina wî warê bav û kalên xwe terk dikan. Qonax bi qonax, bajar bi bajar digerin û aborîya xwe bi çêkirin û firotina zembîlan diborînin. Sal û zeman derbas dibin, zarokên wan çê dibin û roj bi roj barê wan girantir dibe, ji bilî cilên ser wan tu tiştekî wan namîne.

Zembîlfiroş lawkê rewal bû,

Bi kulfet û ehl û eyal bû,

Husnekî ûsif li bal bû

Heq rizaqê qismetê."

Bi halekî koçemal tî bajarê Farqînê û li wê derê bi cîh dibin. Kurê mîr kolan bi kolan zembîlan digerrîne û bi diravên zembîlan xwe û malbata xwe didebirîne. Ji ber firotina zembîlan jî, navê ZEMBÎLFIROŞ distîne.

Rojekê wek her roj dîsa derketîye kolan û zembîlan difroşe. Jina mîrê Farqînê dîsa derketîye ber şîbakê û çavdêriya Zembîlfiroş dike. Lewra ew ne bi dilek bi heft dilan aşîqê husn û bala Zembîlfiroş bûye:

"Zembîlfiroş zembîla tîne

Kolan bi kolan digerrîne

Xatûnê li hewale dibîne

Hiş diçe aqil namîne."

Xatûna jina mîr xwe ranagire, carîye û xulaman dişîne pey Zembîlfiroş û wî tîne qesrê. Derdê xatûnê ne bazarkirina zembîlan e, vemirandina evîn û agirê nava dilan e..

Xatûnê bangî Zembîlfiroş dike û dibêje:

Zembîlfiroş lawkê dewrêş e

Kerem ke tu were pêş e

Qîmeta selka tu bêje

Ez ji hizna te bûm kerr û gêj e.

Zembîlfiroş lawkê bîyanî

Kerem ke tu were banî

Qîmeta selka tu zanî

Xelk xam e tişteke nizanî."

Herweha Xatûnê nîyate xwe ji Zembîlfiroş ra aşkera dike û dixawaze pê ra rakeve û eşqê bike. Lê Zembîlfiroş ji ber evîna xwe ya Xwedayî û dilpakîya xwe, tekîfên Xatûnê qebûl nake û bi van gotnên bersîv dide:

Xatûnê wez tobedar im

Delalê bi erz û eyal im

Zarok birçî ne, li mal in

Ji ber rebê jorî nikarim.

Xatûnê bi hemû bedewî û serweta xwe, xwe pêşkêşî Zembîlfiroş dike, lê dike û nake Zembîlfiroş ji rê dernayê. Her cara ku Xatûnê di ber Zembîlfiroş dide, evîna dilê wê hartir dibe û dikeve rikê. Xatûnê bêcare dimîne û Zembîlfiroş di qesrê da hepis dike. Di navê da çend roj derbas dibin. Her rojek ji bo Xatûnê dibe mirinek. Ew çiqas ji bo eşqê li razîkirina Zembîlfiroş digere, Zembîlfiroş jî ewqas ji bo berdana xwe lavayîya dike:

"Xatûnê bi gerden morî

Şuxul nabin bi kotek û zorî

Tirsa min ji rebê jorî

Xatûnê wez tobedar im.

Zembîlfiroş dinihêre ku ji destê Xatûnê xilasî tune, ji bo destavê û dest û rû şûştinê jê destûr dixwaze. Xatûnê ji ber tîrsa reva Zembîlfiroş, benekî li lingê wî girê dide, serê ben dike destê xwe û tevî misînekî Zembîlfiroş dişîne birca herî bilind. Zembîlfiroş di bin çavdêrîya xulam û eskeran dertê serê bircê û ji alîkî va jî difikire ka çawa xwe ji destê xatûnê xilas bike, ji wê derê bireve. Li ser bircê li der û dora xwe dinihêre, lê tu rêyek revê û xilasîyê nabîne. Wê hingê benê lingê xwe vidike, bi misînê va girê dide û xwe ji birca bilind davêje xwarê. (Ev kela han bi navê "Kela Zembîlfiroş" tê bi nav kirin û ev kel li Farqînê ye)

Ew kela ku Zembîlfiroş xwe jê davêje, keleke wisa bilind e ku xilasîya meriv mûcîze ye. Eger çi hîkmet be em nizanin, lê pozê Zembîlfiroş jî xwîn nabe. Hema wê hingê radibe ser xwe û baz dide malê

Demek şunda Xatûnê dikeve meraqê û ben dikşîne, lê dêlva Zembîlfiroş misîn tê ber destê wê. Wê gavê têdigihîje ku Zembîlfiroş revîyaye. Kêfa wê direve, dinya li serê wê tarî dibe. Xatûnê ji kerba evîna Zembîlfiroş dikeve halekî ne hal, şev û roj lê dibin zîndan, xeyalê Zembîlfiroş ji pêş çavê wê naçe. Bi vî evîn û keserê cilên xwe diguhêze û bi rojan li kuçe û kolanên Farqînê li mala Zembîlfiroş digere. Di dawîyê da digihîje mirazê xwe û mala Zembîlfiroş dibîne. Bi cil û ser û sîncê xwe yê guhaztî, kes wê nas nake. Herweha di wextekî ku Zembîlfiroş ne li mal e, Xatûnê diçe ba jina wî û pê ra xeber dide. Bi lavayî, bi zêr û zîv û bi bertîlan jinikê razî dike, yanî wê dixapîne da ku şevêkê dêlva jinikê da bikeve nav livînan Zembîlfiroş.

Ew şev cilê jina Zembîlfiroş li xwe dike, dikeve nav livînan û li benda Zembîlfiroş disekine. Derengê şevê Zembîlfiroş westîyayî û ji halketî tê malê û dikeve nava livînan. Çîra vemirandîye û haya Zembîlfiroş ji tiştekî tune. Demek şunda Xatûnê xwe diqelêbe û berê xwe dide Zembîlfiroş. Gava Xatûnê berê xwe didê û xwe alîkî diqelêbe, şingînî bi xirxalên zîvîn ên lingê wê dikeve. Bi dengê xirxalan, Zembîlfiroş vedicênîqe û tê derdixe ku eva han ne jina wî ye. Lewra dizane ku, di lingên jina wî da xirxal tunene. Li rûyê jinika paşila xwe dinihêre û bi nihêrtinê ra ji nava cîyan dipeke. Xatûnê nas dike. Hema wê hingê bi lez xwe davêje der, serê xwe hildide û berê xwe dide çîya. Xatûnê jî bi dû dikeve û lê digere.

Zembîlfiroş mêze dike ku, rev ne çare ye û ji mirinê pêştir tu tiştekî wî ji destê Xatûnê xilas nake. Çok dide erdê û bi girîn lavayî li Xwedê dike da ku rihê wî bistîne û wî ji vî ezabê xilas ke. Xwedê daxwazîya wî bi cîh tîne û herweha Zembîlfiroş diçe heqîya xwe, digihîje evîna Xwedayî. Hingê Xatûnê digihîje ser Zembîlfiroş û mirazê wê

di dilê wê da dimîne. Li xwe dixe, ax û fîzar dike û ji kerba evîna xwe ew jî li wê derê diçe heqîya xwe.

Li gor efsaneyê, Zembîlfiroş û xatûnê li rojhilata bakûrê Farqînê, 5,6 km dûrî bajêr hatine gor kirin.

(Çîroka gelêrî ya li dorhêla Amedê)¹²²

Piştî ku me lêkolîn û şîroveyên nivîskarên kurd ên Çîroka Zembîlfiroş da, îca em ê derbasî guhertoyên nivîsandî yên Destana Zembîlfiroş bibin.



122. Aram Gernas, *Şîroveyek li ser çîroka Zembîlfiroş û versiyonên wê*, berhema neçapkirî.

2. GUHERTOYÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞÊ

Di wêjeya kurdî ya klasîk de bi navê “Zembîlfiroş” sê destanên nivîskî hene ku ya pêşî Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran(1549-1631) e, ya duyem Zembîlfiroşa Melayê Bateyî(1675-1760) ye, ya dawî jî Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî ye ku di sala 1776an de nivîsiye.

Dema ku mirov li van guhertoyan dinêre, ji aliyê hinek taybetiyên xwe ve ji hev cuda dibin. Wekî mînak ji aliyê hejmara bendan ve û naverokê ve ji hev cuda dibin. Her wiha hin hevbeşiyên wan jî hene ku çawa me li jorê di nasnavên Zembîlfiroş û Gulxatûnê de jî dît. Niha em ê yek bi yek li ser van guhertoyên navborî bisekinin û wan bidin nasîn.

2.1. Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran: Li gorî çavkaniyên li ber destê me, yê ku cara pêşî çîroka Zembîlfiroş bi awayekî helbestî nivîsiye, Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran yek ji wan helbestvanên klasîk e ku mora xwe li wêjeya klasîk a kurdî xistiye. Feqiyê Teyran, wekî rewşenbîr û alimek gelê xwe, çîroka Zembîlfiroş ku bi salan bi rêya dengbêj û derwêşan di nav gel de wekî devkî belav dibû, ji nû ve daye ber dest û bi awayekî nivîskî derbasî ser rûpelan kiriye. Wekî ku me di destpêkê de jî gotibû ku destan piştî ku di nav nişan de belav dibin, ji aliyê hin kesan ve derbasî nivîsê dibin û ew destan dikeve qonaxa tomarkirinê. Li virê jî ji bo destana Zembîlfiroş, mirov dikare bibêje ku qonaxa nivîsandina destana Zembîlfiroş bi saya Feqiyê Teyran dest pê kiriye. Bêguman Feqiyê Teyran dema ku ev çîrok hûnandiye, wekî her nivîskarê destanan, ji çîrokên devkî sûd wergirtiye û li gorî hunersaziya xwe ji nû ve nivîsandiye. Dema ku mirov li berhema Feqiyê Teyran, “Beyta Zembîlfiroş” dinêre, ji aliyê hejmara bendan ve ji 65 bendan pêk tê û her bendek çar riste ye. Li jêr em ê bi berfirehî li ser taybetiyên “Beyta Zembîlfiroş” a Feqiyê Teyran rawestin.

2.1.1. Feqiyê Teyran kî ye?

Beriya ku em li “Beyta Zembîlfiroş” a Feqiyê Teyran binêrin, divê em derheqê jiyana wî de hinek agahî bidin. Li gorî berhema Seîd Dêreşî ku amadekarê Dîwana Feqiyê Teyran e, li ser jiyana Feqî ev agahî hene:

“Feqiyê Teyran, sala 957ê Mişextî, beramberî 1549ê Zayînî,¹²³ li gundê Warezorê, ku li ser bi qezaya Miksê ve ye, ji dayik bûye. Û sala 1041ê Mişextî, beramberî 1631ê Zayînî, çûye ber dilovaniya Xwedê û li gundê Şandîşê, li qezaya Nemira hatiye veşartin.¹²⁴

Feqiyê Teyran li pey xwe gelek berhemên giranbiha hiştine ku îro wekî Dîwana Feqî li ber destê me ne. Di Dîwana Feqiyê Teyran de beşek jê jî Beyta Zembîlfiroş e. Niha jî em ê li ser vê berhema Feqî rawestin.

2.1.2. Ji aliyê naverokê ve: Wekî ku me li jorê jî diyar kir Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran ji 65 bendan pêk tê û ku her bend jî çar riste ye û bi vê bendê dest pê dike:

Dê dê hilon dîsan bi coş
Carek ji carê mey binoş
Bêjim qîsa Zembîlfiroş
Da seh bikîn 'hîkayetê

û bi vê beytê xelas dibe:

Ey Mîm û 'Hê xweş defter e
Herçî ji min ne bawer e
Ne j Ummeta Pêxember e
Ne laîqê şefaetê

Beriya ku em derbasî naveroka Beyta Zembîlfiroş a Feqiyê Teyran bibin, di berhemên helbestî de naverok bi çî awayî tê ravekirin û çawa li serê tê sekinandin, em ê hinek behsa vê yekê bikin û pey re derbasî naveroka berhema Feqî bibin.

Yek ji hêmanên bingeîn ên helbestê, muhtewa/naverok/wate ye. Bi giştî jî bala hezkiriyên helbestê, serê pêşî naverok û wateya helbestê dikşîne. Li gorî çavkaniyan, di helbestê de naverok wiha tê ravekirin:

Di helbestê de naverok û wate: Di helbestê de naverok û wate ji sê hêmanên bingeîn pêk tên ku ew jî ev in:

123. Seîd Dêreşî, *Jîna Feqiyê Teyran*, Kovara Pêl, Hejmar 2, sal 2003, r. 64-78, Weşanên Navenda Havîbûnê ya Lêkolîn û Weşanên Kurdî Li Berlînê

Mijar: Berhem, kîjan mesele, qewimîn û bûyerê dide ber dest.

Raman: Di berhemê de, ji peyva pêşî ya risteya helbestê, heta peyva dawiyê li ser kîjan hest û hizirê hatiye sekinandin.

Peyam: Helbestvan bi rêya vê berhema xwe ji xwendevan re dixwaze çî bibêje.¹²⁵

Bersiva “Helbestvan çî dibêje?” an jî ya van her sê hêmanan, bi xwe re naveroka helbestê didin dest. Dema ku mijar, raman û peyama nivîskar derkeve holê, her sê bi hev re dibin naveroka berhemê.

2.1.2.1. Mijara Beyta Zembîlfiroş: Dema ku mirov li berhema Feqî dinêre, ji benda pêşî heta ya dawiyê, mijara berhemê evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê ye. Bûyera ku ji berhema Feqî re bûye mijara sereke, di dawiya sedsala 10an de li navçeya Farqîna Diyarbekirê diqewime. Li gorî vê agahiya ku Ebdurreqîb Yûsuf dide me û li gorî formên ku wekî stran û çîrok di nav gel de belav bûne, çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê, wekî ya Mem û Zîn û her wekî çîrokên evînê yên din ê cîhanî û rojhilatî, qewimîneke rastîn e û di dewr û serdemeke diyar de qewimîye. Îcar Feqî jî li gorî mijara qewimîna çîrokê, bi awayekî helbestî çîrok derbasî nivîsê kiriye.

Dema ku mirov li hemû çîrokên Zembîlfiroş dinêre, tu kesî behsa zaroktiya lehengên çîrokê nekiriye û her yek ji wan li gorî tercîha xwe ji ciyekî dest pê kiriye û dîsa li gorî xwe çîrok li ciyekî xelas kiriye. Li gorî vê yekê her sê guhertoyên me dikevin bin vê mijarê û dema ku mirov guhertoya Feqî, Bayezîdî û Bateyî dide ber hev, mirov dibîne ku ji ciyên cihê dest bi mijara çîrokê kirine.

Feqiyê Teyran jî wekî gelek nivîskarên wêjeya klasîk bi benda xwe ya pêşîn ku dibêje:

“Dê dê hilon dîsan bi coş
Carek ji carê mey binoş
Bêjim qisa Zembîlfiroş
Da seh bikîn 'hîkayetê”

peyama mijara xwe dide û dide xuyakirin ku dê behsa kîjan mijarê bike. Di vê benda pêşîn de bi gotina “Bêjim qisa Zembîlfiroş”, nivîskar mijara berhema xwe aşkere dike. Dîsa bi bêjeya “qise”yê jî dide xuyakirin ku çîrokek ji rêzê nîn e û bi vê peyvê jî

124. Seîd Dêreşî, Dîwana Feqiyê Teyran, Weşanên Lîs, Amed, 2011, r. 19.

dişibîne qiseya Yûsif û Zelîxa ku ev çîrok di Quranê de bi awayê “ehsenul-qesses” anga “çîroka herî xweş” hatiye binavkirin.

Wekî ku me li jorê jî diyar kir, Feqiyê Teyran jî çîroka Zembîlfiroş li gorî xwe ji ciyekê dide destpêkirin. Feqî bi benda:

“Zembîlfiroş lawê rewal e
B kulfet û ehl û 'eyal e
'Husna Yûsivî li bal e
'Heq rizayê qismetê”

bi kurtasî behsa Zembîlfiroş û malbata wî dike. Bi benda li pey vê bendê ku dibêje:

“Zembîlfiroş lawê feqîr e
D sinetê xo da esîr e
Daîma yê 'Heq li bîr e
Rast bkerestê sinetê”

behsa pîşe û karê Zembîlfiroş dike. Ji vê bendê heta benda 6an, Feqî dîsa li ser karûbarê Zembîlfiroş disekine û dide nîşandan ku bi çî awayî debara malbata xwe kiriye. Feqiyê Teyran bi benda 7 an ku dibêje:

“Rojekê selkan ku tîne
Xatûnek jorda dibîne
Bi dil û can dihebîne
Ketye benda mehbê”

rasterast bi vê bendê dest bi mijara sereke dike. Çawa ku me got mijara berhema Feqiyê Teyran evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê ye, serê pêşî evîna her du lehengan bi vê bendê dest pê dike û didome. Feqî ji benda 7an heta benda 62an ku dibêje:

“Xêr da ewan ku bê 'hisab
Înane der nan û kebab

125. İsmail Çetişli, *Metin Tahlillerine Giriş /1 Şiir*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010, r. 41-42.

Şefqet li wan kir ey Wehab

Têr bûn ji zad û nimetê”

behsa evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi berfirehî dike. Her sê bendên xwe yên dawiyê jî ji şîret û peyama xwe re dihêle.

2.1.2.2. Ramana Beyta Zembîlfiroş: Di vê sernavê de em ê binêrin ka gelo Feqî li ser kîjan hest û ramanê berhema xwe hûnandiye. Feqî di vê berhema xwe de evîna Gulaxatûn û hestên wê yên ji bo Zembîlfiroş bi awayekî aşkere aniye ziman. Feqî bi benda 8an ya ku dibêje:

“Mehbetê kiç mubtela kir

Sirr li çarya aşkira kir

Lawikî qelbim cuda kir

Min ji 'îşqan xew netê”

hestên Gulxatûnê yên ji bo Zembîlfiroş tîne ziman. Bi risteya “Mehbetê kiç mubtela kir” dide xuyakirin ku ji eşqa Zembîlfiroş, Gulxatûn nemaye ku tebat bê wê û bisekine û ji ber eşqa wî dîn û har dibe. Bi risteya “Lawikî qelbim cuda kir” Feqî dide nîşandan ku evîna Selikfiroş dil û hinavên Guşxatûnê anîne xwarê û parçe kirine. Dîsa bi risteya “Min ji 'îşqan xew netê” nivîskar dide nîşandan ku encama eşqa Zembîlfiroş bi çî awayî xwe daye nîşandan û ji vê encamê dê çî destpêk derkevin holê ku piştî vê bendê jî Gulxatûn bi fermanekî, bi destê cariyeyên qesrê, Zembîlfiroş tîne heta ber lingên xwe.

Di berhema Feqî de hestên Zembîlfiroş her gav hewldana bidestxistina nanê zar û zêçên xwe ye. Ew jî ji ber armanca wî ya gepa helal tê. Pey re jî hestên Zembîlfiroş, ji tîrsa gunehan, xweparastina ji Gulxatûn û ji hawar û daxwaza xelasbûnê pêk tê. Feqî di benda 18an de ku dibêje:

“Weqtê bihîstî ew xeber

Rondik ji çava têne der

Barîn li ser rûyêd wezer

Girya me jbo 'halê xwe tê”

piştî ku dikeve destê Gulxatûnê û rewşa xwe ya neyînî bi awayekî aşkere tîne ziman. Di axaftinên Gulxatûn û Zembîlfiroş yên li qesrê de Gulaxatûn her gav li ber

miradgirtinê ye; lê belê Zembîlfiroş jî her hewl dide ku xwe jê biparêze. Di benda 26an de bi devê Zembîlfiroş, Feqî vê yekê tîne ziman:

“Law dibê tirsim j Cebârî
Du 'heram bêne diyarî
Agirek wê l me bibarî
Ez û tu bkin tewbetê”

Li hemberî vê gotina Zembîlfiroş, Feqî di benda li pey de, ji devê Gulxatûn daxwaz û xweziyên wê tîne ziman:

“Kiç dibê bavê xeyalan
Were nêv doşek û palan
Bên bike zilfan û xalan
Dûr e roja axretê”

Çawa ku me li jorê jî diyar kir, Feqî bi çavê qiseya ku dişibe qiseya Hz.Yûsif, dest bi vê çîroka Zembîlfiroş kiriye û ji ber ku bi vê nêrînê dest pê kiriye, hest û ramanên xwe jî di çarçoveya vê nêrînê de derxistiye holê. Dema ku mirov li berhema Feqî dinêre, ji serî heta binî xwedûrxistina ji gunehan û mukafatên Xwedê ku di encama vê yekê de dide mirovan, aniye ziman. Çawa ku di qiseya Yûsif de, Yûsif xwe ji xweziyên Zelîxa diparast û xwe diavête Xwedê, bi heman awayî Zembîlfiroş jî wisa tevdigere. Feqî bi benda 37an ku dibêje:

“Dema ku dî dil ker kirî
Dil şewitî ew pirr girî
Rû da û evraz fikirî
Bang kire Şahê Qudretê”

vê yekê tîne ziman û xweparastina Zembîlfiroş ji gunehan û xwespartina Xwedê bi awayekî aşkere tîne ziman. Piştî vê bendê, heta ku Cebraîl tê alîkariya wî, mirov dibîne ku rasterast Zembîlfiroş hawar û fîzar li Xwedê dike û alîkarî dixwaze. Bi vê bendê ku dibêje:

“Cibraîl hatî ji kerem
Law li hewa girt bi şerim
Dayne ser 'erdî bi nerim
J wîrra dikit 'inayetê”

Cebraîl tê alîkariya wî û îca Feqî di dawîya xelasbûna wî de behsa mukafatên ku ji aliyê Xwedê ve li wî û malbata wî hatine kirin dike. Feqî bi vê benda 53an ku dibêje:

“Lawê rastê pirr wicûd e
Ewî ser bir bi sicûd e
Şukir kir ji bo wedûd e
Te xilas kir ji zehmetê”

xelasbûna wî ji wê zehmetê tîne ziman û li pey vê bendê, mukafatên ku li malbata wî hatine kirin tê vegotin. Feqî bi benda 62an ya ku dibêje:

“Xêr da ewan ku bê 'hisab
Înane der nan û kebab
Şefqet li wan kir ey Wehab
Têr bûn ji zad û nimetê”

behsa mukafatên ku Xwedê li wan kiriye dawî tîne û her sê bendên dawîn jî ji peyama xwe re dihêle.

2.1.2.3. Peyama Beyta Zembîlfiroş: Feqiyê Teyran, piştî ku çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi dawî tîne bi sê bendan peyama xwe ji xwendevan re vedibêje. Feqî di benda 63an de ku dibêje:

“Er bi roj e er bi şev e
Taet bikin hûn bi xev e
Herçî rast e ceza ev e
Da hûn nebin ji axretê”

ji çîroka Zembîlfiroş ji xwe re şîret û dersek derdixe û dixwaze bi xwendevanan re parve bike. Piştî ku girîngiya taet û îbadetan û rastiyan tîne ziman, ji bo xelasiya ji cezayên roja axretê jî girîngiya heman yekan vedibêje.

Feqî dîsa di benda 64 û 65an de ku dibêje:

“Ya Mihemmed 'xemxwarê Ummetê

Herçî ji min bawer netê

Ne musteheqî şefaetê

Mexrec dûr e roja axretê

Ey Mîm û 'Hê xweş defter e

Herçî ji min ne bawer e

Ne j Ummeta Pêxember e

Ne laîqê şefaetê”

li ser heman yekê disekine û şîretên xwe vedibêje û dawî li beya Zembîlfiroş tîne.

2.1.3. Ji aliyê zimên û şeweyê ve: Dema ku ji aliyê zimên ve li taybetiyên helbestê bê nihêrtin, divê li hinek hêmanên zimên bê nihêrtin da ku mirov bikaribe li ser zimanê giştî yê helbestê hin tiştan bîne ziman. Ew tiştên ku zimanê helbestê ji zimanên din ên wekî zimanê rojane û zimanê ‘ilmî vediqetînin, dibin çawaniya zimanê helbestê. Mirov dikare wan wiha bi rêz bike:

2.1.3.1. Çawaniyên Zimanê Helbestê

2.1.3.1.1. Nezm: Tiştê sereke yê ku zimanê helbestê dide dest nivîsandina wê ya bi nezmê ango bi helbestî ye. Li vir wezn, qafiye, riste, bend û şiklên nezmê dibin hêmanên ku zimanê helbestê ji zimanên din vediqetînin.

2.1.3.1.2. Rêziman: Di zimanê helbestê de pirî caran nisîvkar li gorî rê û rêçikên rêzimana wî zimanî tevnagere û dertê derveyê wan qaîdeyên rêzimanî. Ev taybetî jî zimanê helbestê cuda dike.

2.1.3.1.3. Hestyariya Zimên: Di helbestê de nivîkar li ser bijartina amûrên ziman hestiyar e, bi hostatî peyvên xwe dibijêre û ji nû ve dihûne. Li vir nivîskar li gorî wateya bêjeyê ya bi wateya wê yan jî bi wateyeke nû qaliban bi kar tîne û dixê helbesta xwe. Ango nivîskar bi rêya hin bêjeyan peyam û hestên din dixwaze bide xwendevanan.

2.1.3.1.4. Aheng/Mûsîkî/Rîtm: Di helbestê de hêmanên ku bi rêya wan aheng û mûsîkiya helbestê tê bidestxistin ev in: wezn, qafîye, redîf, cînas, alîterasyon, şewqa dengên û dubare.

Taybetiyên ku zimanê helbestê ji zimanên din vediqetîne ev hêman in. Niha em ê di çarçoveya van hêmanan de li ser ziman û şeweya Zembîlfiroşa Feqîyê Teyran bisekinin.

Wekî ku me li jorê diyar kiribû berhema Feqîyê Teyran ji aliyê xwe yê nivîsandinê ve dikeve bin kategoriya nezmê an jî helbestê û ji bendên çar risteyî pêk tê. Ji ber ku di sernavên pêşî de em ê behsa şiklên nezmê yên vê berhemê bikin, li vir em dikarin bibêjin ku berhema Feqî ji aliyê hêmanên helbestê ve gelek taybetmendiyên di xwe de dihewîne.

Her çî qas Feqî cî bi cî bêjeyên wekî erebî û farisî jî bi kar anî be jî zimanê wî gelek nêzî zimanê gel e û bi awayekî aşkere tê fêmkirin ku çî dixwaze bibêje.

Ji hêla hestyariya zimên ve mirov nikare bibêje ku Feqî zimanek girtî bi kar aniye, bi giştî dema ku mirov li berhema “Beyta Zembîlfiroş” dinêre, mirov dibîne ku qalibên veşar û têgehên ku ji wateya xwe dûr bi wateyeke din hatibin bi kar anîn, di zimanê Feqî de nayên dîtin. Ji serî heya binî bêje û risteyên Feqî ji aliyê wateyê ve vekirî û li ber çav in.

Ji aliyê aheng û mûsîkiyê ve hevokên Feqî cî bi cî diguherin û hin taybetmendiyên nîşan didin. Wekî mînak mirov dibîne ku Feqî ji bo ahengê hêmana qafiyeyê bi kar aniye. Wekî mînak:

Weqtê bihîstî ew xeber
Rondik ji çava têne der
Barîn li ser rûyêd wezer
Girya me jbo 'halê xwe tê

Kiç dibê, lawê biyanî
Lew dibê da tu bizanî
Min ji bûya dil tu anî

Da bibînîn 'heşmetê

Dîsa di bendên Feqî de cînas jî hatiye bikaranîn. Bo nimûne:

Lawî 'huccet girtî gavê

Dê tehareet kem bi **avê**

Ew nizanît dê xo **avê**

Dûr e ji vê qebahetê

Feqî wekî şêweyeke wêjeya gelêrî, wekî ku li hemberî civatekê be û çîrokê bi awayekî devkî vedibêje, destpêka çîrokê jî bi hisandina mijara xwe dest pê dike. Ango dixwaze ku bi çarîna pêşîn bala xwendevanan bixşîne ser çîrokê. Nivîskar di çarîna pêşî de ku dibêje:

Dê dê hilon dîsan bi coş

Carek ji carê mey binoş

Bêjim qisa Zembîlfiroş

Da seh bikîn 'hîkayetê

wekî ku bangî civatekê dike û sedemê nivîsandina xwe bi aşkere tîne ziman. Dema ku mirov li berhema nivîskar dinêre, Feqî gelek kêr peyvên biyanî bi kar anîne. Bi zêdeyî girêdayî peyvên kurdî maye. Wekî mînak peyvên li ber çav ku biyanî bi kar aniye ev in: şefaet, ummet, axret, Wehab, tenwîr, şubhet, xeybanîyet û hwd.

Feqî di helbesta xwe de risteya dawî her tim bi tîpên “etê” bi dawî aniye û bi pê re jî bi piranî bi peyvên biyanî qafiyeya risteyê temam kiriye. Wekî mînak: hîkayetê, qismetê, sinetê, meşxeletê, mehbêtê, huccetê, wesfetê, inayetê, wehdanetê, cennetê, şefaetê û hwd.

Ji aliyê şêweyê ve mirov dibîne ku Feqî ji gotinên girtî dûr e, niyet û armanca xwe bi aşkere tîne ziman û bertîla Zembîlfiroş a li hemberî Gulxatûnê diparêze. Her wiha bi vê armancê şîretên xwe jî ji gotinên xwe kêr nake.

2.1.4. Ji aliyê şiklên nezmê ve: “Beyta Zembîlfiroş” a Feqiyê Teyran ji aliyê şiklên nezmê ve, van teybetiyan dihundirîne:

Her bendek ji çar risteyan pêk tê. Berhema wî bi giştî 65 bend in. Bi vê hejmara xwe ji aliyê şiklê nezmê ve “destan” e.

“Destan, di wêjeya evînê de awayê nezmê yê herî dirêj e. Ne wekî destanên anonîm e, ji çarînan pêk tê. Jimara çarînan, li gorî mijara xwe diguhere. Di hinek destanan de ji sedî zêdetir çarîn hatine nivîsandin. Di destanan de pergala qafiyeyan zêdetir ev in: abab, cccb, dddb.”¹²⁶

Ji aliyê qafiyeyê ve beyta Zembîlfiroş wiha ye:

Dê dê hilon dîsan bi coş → a

Carek ji carê mey binoş → a

Bêjim qisa Zembîlfiroş → a

Da seh bikîn 'hîkayetê → x

Wekî ku tê dîtin pergala qafiyeya Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran: aaax e. Ango her sê risteyên pêşîn di nava xwe de bi qafiye û guherbar, risteya dawîn jî bi heman qafiyeyê, bi “-etê” heta dawiya destanê didome.

Feqiyê Teyran wekî gelek nivîskarên wêjeya gelêrî, çarîna xwe ya pêşîn wekî pênasîna hîkayeyê bi kar aniyê.

Destan, bi pîvanên kîteyî tîr nivîsîn, piraniyên wan li gorî 11 kîteyî tîr saz kirin. Qalibên 8 kîteyî jî hene. Dema ku mirov ji hêla pîvanên kîteyî ve li berhema Feqî dinêre, her çî qas meyl li ser 8 kîteyiyê be jî; lê belê pergalek tekûz tune ye. Dibe ku dema ji destê nivîskar derketiye bi 8 kîteyî hatibe nivîsîn, piştî ku destxet hatine zêdekirin û ji wêjeya devkî derbasî nivîsê bûye kîteyên helbestê kêr an jî zêde hatibin nivîsîn. Ev yek di çarînan Feqî de wiha tê dîtin :

Bend: 1

Dê dê hilon dîsan bi coş → 8

Carek ji carê mey binoş → 8

Bêjim qisa Zembîlfiroş → 8

Da seh bikîn 'hîkayetê → 8

Bend: 2

126. Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, Grafiker Yayınları, Ankara, 2008, r.

Zembîlfiroş lawê rewal e → 9

B'kulfet û ehl û 'eyal e → 8

'Husna Yûsivî li bal e → 8

'Heq rizayê qismetê → 7

Di destanan de nivîskar di çarîna dawiyê de bi piranî ji bo xwe nasnavek bi kar tînin. Feqî di “Beyta Zembîlfiroş” de bi vê çarînê dawî tîne:

“Ey Mîm û 'Hê xweş defter e

Herçî ji min ne bawer e

Ne j'Ummeta Pêxember e

Ne laîqê şefaetê”

Dema ku mirov li risteya pêşî dinêre, mirov dibîne ku Feqî bi bêjeyên “Mîm û Hê” nasnavê xwe dixwaze bibêje. Îcar “Mîm û Hê” çî ye, M. Xalid Sadînî di berhema xwe ya bi navê “Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî” de wiha dibêje: “ Feqî di helbestên xwe de van nasnavan bi kar aniye: Feqê Têra, Feqê Hêşetê, Feqiyê Gerok, Mîksî, Xoce û Mîr Mihê. Bi piranî jî di nava helbestên xwe de, mexlesa “Mîm û Hê” bi kar aniye. Navê Feqiyê Teyran yê esasî Muhemmed e.”¹²⁷

Di risteya navborî de xuya ye ku Feqî bi “Mîm û Hê” her du tîpên serî yê nasnavên xwe daye destnîşankirin. Li gorî lêkolînerên Kurd yên wekî Ebdureqîb Yûsuf, Zeynelabîdîn Zinar, Qanadê Kurdo, Bleç Şêrko, Minorski, Bazil Nikitin navê Feqiyê Teyran “Muhemmed” e. Lêbelê dema ku mirov bi nasnavê “Mîm û Hê” dinêre, Feqî di vir de du tîp bi kar aniye. Aşkere ye ku tîpa “Mîm” dibe ku li navê wî yê eslî, li Muhemmed binêre. Tiştê ku li vir bê pirsîn ev e ku gelo Feqî tîpa “Hê” ji bo çî bi kar aniye? Heke mirov baş li serdema ku Feqî têde jiyaye binêre, mirov nav û nasnavên xwe li gorî bav û bapîrên xwe, eşîr û gundên xwe girtine û wisa hatine naskirin. Li vir jî xuya ye ku Feqî bi rêya “Hê”yê yan dibe ku ji me re behsa navê bavê xwe, bapîrê xwe, an jî eşîra xwe bike.

2.2. Zembîlfiroşa Melayê Bateyî: Kesê ku cara duyem çîroka Zembîlfiroşê bi awayekî helbestî nivîsiye, Melayê Bateyî(1675-1760) ye. Lê belê wekî berhema Feqiyê

127. M.Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 19.

Teyran û Mûradxanê Bayezîdî, berhema Mela bi awayekî tekûz negihîştîye ber destê me. Ji ber ku rasterast ji hibra Melayê Bateyî, Zembîlfiroşa wî li ber destê me tune ye, em ê li virê li ser şîroveyên metnên wî nikaribin zêde bisekinin. Lewre nivîsên ku îro bi navê “Zembîlfiroşa Melayê Bateyî” hatine nivîsandin ji berhevokên Albert Sosin û Qanadê Kurdo pêk tên. Ji ber ku berhevok in û dê taybetiyên berhema rastîn ya Mela nedin ber destê me, em ê li ser berhevokên kesên navborî nesekinin. Em ê tenê li vir bi kurtasî behsa jiyana Mela bikin û dîsa bi giştî behsa berhevokên her du nivîskaran bikin.

2.2.1. Melayê Bateyî kî ye?

Melayê Bateyî, di sala 1675an de li gundê “Bate”yê hatiye dinê. Bate gundek navçeya Elkê (Beytuşebab) ye ku ev navçe îro girêdayê bi bajarê Hekariyê ve ye. Navê bavê wî Sofî Mustefa ye û ji eşîra Ertûşîyan e. Melayê Bateyî li gund li cem apê xwe dest bi xwendinê dike. Pey re li Medereseyên Colemêrg û Muksê xwendina xwe tamam kiriye. Li gundê Pîrosa dest bi meletiyê dike û peyre berhem dide. Melayê Bateyî di sala 1760î de wefat dike û li gundê Bateyê tê definkirin.

Zembîlfiroşa Melayê Bateyî wekî ku me li jorê jî diyar kir, ji aliyê A. Sosin û Qanadê Kurdo ve hatine berhevkirin. Lê ziman û uslûba destanê ji ya Melayê Bateyî dûr in.¹²⁸

Lêkolîner Aram Gernas jî li ser vê mijarê şîroveyeke bi vî rengî kiriye:

“Di berhevoka A. Sosin da du versiyon cih girtine. Yek jê çîrokî ye lê bi şêweyek helbestkî hatiye nivîsîn. Versiyonek jî ya Feqîyê Teyran e. Min bendên vê berhevokê û yê Feqîyê Teyran da ber hev. Eynî berhevok di “Tarîxa Edebîyata Kurdî-Qanadê Kurdo” da jî cih girtiye. Bi tenê di hin rêzan da hin peyvên cuda ketine nav malikan û pirraniya wan jî, xuyaye ku ya di berhevokê da xelet hatiye têgihîştin an jî dema ku di berhema Qanadê Kurdo da ji nû va hatiye nivîsandin şaş hatine nivîsandin. Ne tenê şaş, peyvên bêmane derketine holê. Wek mînak:”¹²⁹

Ji Berhevoka A. Sosin:

Taw dibê tirsim ji xebere

Dev hereme, têne riyare

Agirek bi wanda dibare

Ji Zembîlfiroşa Feqîyê Teyran:

Law dibê tirsim ji Cebbarî

Du heram bêne diyarî

Agirek wê li me bibarî

128. Kadri Yıldırım, *Melayê Bateyî (1675-1760)*, berhema neçapkirî.

129. Aram Gernas, *Şîroveyek li ser çîroka Zembîlfiroş û versiyonên wê*, berhema neçapkirî.

Narî cama şerbetê

Ez û te bikin tewbetê

Xatûn dibê ev xeber tunîne

Xatûn dibê çare tunîne

Şerm meke, were nav nivîne

Şerm meke were nivîne

Min bi te day evîne

Min bi te daye evîne

Da em bibînin heşmetê

Da bibînim ji te lezzetê

Li gorî van berawirdkirinên Gernas, wisa xuya ye ku berhevoka A. Sosin ku li ser navê Melayê Bateyî hatiye kirin, çîroka Zembîlfiroş a Feqiyê Teyran bi xwe ye. Heke siberoj destxetêke Zembîlfiroşa Melayê Bateyî ya resen bê dîtin, dê ev gengeşe û tevlihevî jî ji holê rabe.

2.3. Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî: Kesê ku piştî Melayê Bateyî çîroka Zembîlfiroşê nivîsanidiye, Mûradxanê Bayezîdî ye. Piştî derbasbûna nivîsê ya çîroka Zembîlfiroş, kesê ku çîrok herî berfireh û dirêj nivîsiye Mûradxanê Bayezîdî ye. Mûradxanê Bayezîdî, li gorî ku em ji benda wî ya dawîn hîn dibin di 1190ê koçî de Zembîlfiroşa xwe nivîsiye ku ev dîrok jî 1776ê zayînî ye. Ev bend wiha ye:

128.

Sed û nehwêd sal boriye

Paşî hezara hîcrî ye

Mûradxan dibê şer hatiye

Bi şîr bi gotineka xwoş

2.3.1. Mûradxanê Bayezîdî kî ye?

Li ser jiyana Mûradxanê Bayezîdî agahiyên berfireh li ber destên me tune ne. Di Hawarê de jî bo Mûradxanê Bayezîdî ev agahî hatine dayîn: “MIRAD - XAN – Me navê vî şahirî jî nebihîstiye. Melayê Jaba qala wî dike û dibêje: “Şahirê heştê Mirad – Xan e ko di tarîxa hezar û sed û pênciyî da li Beyazîdê peyda bûye. Ewî jî miqderekî xezeliyat û eşharan bi zimanê kurmancî gotiye û di hezar û (du)¹³⁰ sed û nehê da

130. Di Hawarê de 1209ê mirina wî wekî 1109 hatiye dayîn, lê belê divê bi şaşî “du”yê dîrokê nehatibe nivîsîn ku min di nav kevanekê de nîşan daye. (A.S.)

merhûm bûye û di Beyazîdê da medfûn e û paşî wî ji kurmancan êdî şair peyda nebûne, heta niha.”¹³¹

Li gorî ku em ji Melayê Jaba hîn dibin Mûradxan di sala 1150ê koçî yê 1737ê zayînî de hatiye dinyayê û di sala 1209ê koçî yê 1794ê zayînî de wefat kiriye.

2.3.2. Ji aliyê naverokê ve

2.3.2.1. Mijara Çîroka Zembîlfiroş: Dema ku mirov li berhema Mûradxanê Bayezîdî dinêre, wekî ya Feqiyê Teyran ji benda pêşî heta ya dawiyê, mijara berhemê evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê ye. Bûyera ku ji berhema Mûradxanê Bayezîdî re bûye mijara sereke, di dawiya sedsala 10an de li navçeya Farqîna Diyarbekirê diqewime. Li gorî vê agahiya ku Ebdurreqîb Yûsuf dide me û li gorî formên ku wekî stran û çîrok di nav gel de belav bûne, çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê, wekî ya Mem û Zînê û her wekî çîrokên evînê yên din ên cîhanî û rojhilatî, qewimîneke rastîn e û di dewr û serdemeke diyar de qewimîye. Îcar wekî ya Feqî, ya Mûradxan jî li gorî mijara qewimîna çîrokê, bi awayekî helbestî çîrok derbasî nivîsê kiriye.

Dema ku mirov li hemû çîrokên Zembîlfiroş dinêre, tu kesî behsa zaroktiya lehengên çîrokê nekiriye û her yek ji wan li gorî tercîha xwe ji ciyekî dest pê kiriye û dîsa li gorî xwe çîrok li ciyekî xelas kiriye. Li gorî vê yekê her sê guhertoyên me dikevin bin vê mijarê û dema ku mirov guhertoya Feqî, Bayezîdî û Bateyî dide ber hev, mirov dibîne ku ji ciyên cihê dest bi mijara çîrokê kirine.

Ji van nivîskaran Mûradxanê Bayezîdî ew kes e ku Zembîlfiroş bi awayekî herî berfireh nivîsiye. Mûradxan bi vê benda xwe ya pêşîn ku dibêje:

“Ey meclîsa pirr zewq û xwoş
Guh bidene sohbetek xwoş
Dê keyn behsî Zembîlfiroş”

bala xwendevanan dikşîne ser mijarê û naveroka helbesta xwe dide der. Bi domana bendan re berhema xwe bi vê benda dawiyê ku dibêje:

“Sed û nehwêd sal boriye
Paşî hezara hîcrî ye

131. F. Cewerî, *Hawar*, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998, r. 815.

Mûradxan dibêt şer hatiye
Bi şîr bi gotineka xwoş”

xelas dike û bi vê bendê nasnavê xwe û dîroka nivîsandina berhema xwe dide dayîn. Di berhema Feqî de me dabû destnîşankirin ku Feqî jî li gorî şêweya xwe ji ciyekî dest bi çîroka Zembîlfiroşê kiribû ku ew jî piştî dayîna wesf û pîşeyê Zembîlfiroş, rasterast derbasbûna evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê bû. Bi heman awayî Mûradxanê Bayezîdî jî li ser vê yekê ji xwe re şêweyek daniye û li gorî wê dest bi çîrokê kiriye. Dema ku mirov li rêbaza Mûradxan ya destpêkirina çîrokê dinêre, bi bendekê wesfê Zembîlfiroş dide nasîn ku benda pêşîn e û wiha ye:

Zembîlfiroş kurê mîran e
Lawekî bejin ruhan e
Xwedanê koçk û dîwan e
Le keyf û seyran şev û roj

Piştî vê bendê Mûradxan wekî Feqî rasterast dest bi evîna Gulxatûn û Zembîlfiroş nake, beriya evîna wan çi di serê Zembîlfiroş de qewimiye behsa wan dike û bi vê bendê dide destpêkirin:

Şevêkî şeva îne bû
Xewnek ecaêb dîtîbû
Li nav xew da girîbû
Dil û hinav lê hate coş

Mûradxan bi vê bendê dide destpêkirin û bi bendên li pey vê re jî dide xuyakirin ku Zembîlfiroş bi çi awayî dest ji qesr û textê mîrîtiyê berdaye û bûye derwêşek ku Zembîlan difiroşe. Vê maweyê jî Mûradxan di du qonaxan de vedibêje. Di ya pêşî de bi benda jorê ku me da dide destpêkirin ku bi xewnekê dest pê dike. Di encama vê xewnê de dixwaze bibe derwêş û feqîrek xirqepoş; lê belê ji bo xatirê dê û bav û jina xwe dest jê berdide ku bi vê benda 24an Mûradxan dawî li vê maweyê tîne:

Ji paşî gotin û cewaban
Ji ber xatira dayik û baban

Suwar bû bo keyf û seyran

Bi dilekî qewî nexwoş

Peyre bi gotinên dê û bav û jina xwe ji bo xatirê wan neşkêne, dev ji armanca xwe ya derwêşiyê berdide û bi vê benda jorîn maweya nû dest pê dike. Piştî ku Zembîlfiroş ji bo seyranê ji qesrê derdikeve, îcar Mûradxan bi vê benda 25an û yên piştî vê vedibêje ka gelo çi qewimiye:

Binêrine hukmê Xwedê

Suwar bû ew biçîte keyfê

Miriyek dî li nav darbeytê

Li ser milan diben bo qebrê

Ji vê bendê heta benda 29an, Mûradxan serpêhatiya Zembîlfiroş bi defînkirina miriyek û bandora ku li ser Zembîlfiroş hiştiye, tîne ziman. Di encama vê bûyerê de çi li ser Zembîlfiroş xwe dide der, Mûradxan bi vê benda 30yê vedibêje:

Zembîlfiroş kurê mîr e

Çûbû ser qebrekî kûr e

Bira mirnê hate bîr e

Çû halê dilteng û nexwoş

Ji piştî vê bendê heta benda 47an, serpêhatiyên wî yên ku dixwaze ji qesra bavê xwe derkeve û bibe derwêşek derbas dibin. Mûradxan ji benda 48an, heta 51ê behsa kar û pîşeyê Zembîlfiroş dike û tîne ziman ku bi fîrtoştina zembîlan rizqê zarokên xwe derxistiye. Mûradxan vê yekê di benda 51ê de wiha tîne ziman:

Hindek dane bi rûn û ar

Hindek da bi fêkî û girar

Rizq xir kir heta êvar

Zîvirî mal bi dilekî xwoş

Piştî ew qas vegotin û kitekitiyên çîrokê, Mûradxan hîn derbasî mijara evînê dibe û bi benda 52an ku dibêje:

Rabû li roja paşiyê
Zembil li xwe helandiye
Li kolan diket gaziye
Gulxatûn ji dûr dîtiye

dest bi mijara sereke ya çîrokê dike. Di risteya dawî de bi gotina “Gulxatûn ji dûr dîtiye”, destpêka evîna Gulxatûnê hatiye nîşandan. Ji vê bendê û heta benda dawî ya 128an Mûradxan serpêhatiyên evîna Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi awayekî berfireh vedibêje.

2.3.2.2. Ramana Çîroka Zembîlfiroş: Di bin vî sernavî de em ê binêrin ka gelo Mûradxanê Bayezîdî li ser kîjan hest û ramanê berhema xwe hûnandiye. Mûradxanê Bayezîdî, di vê berhema xwe de evîna Gulaxatûn û hestên wê yên ji bo Zembîlfiroş bi awayekî aşekere aniye ziman. Mûradxanê Bayezîdî bi benda 53an ya ku dibêje:

Xatûn ji dûr ve dibînît
Heyran û bêhaş dimînît
Perdey li ber xwo dihelînît
Gazî diket Zambîlfiroş

hestên Gulxatûnê yên ji bo Zembîlfiroş tîne ziman. Bi risteya “Heyran û bêhaş dimînît”, “Perdey li ber xwo dihelînît” dide xuyakirin ku eşqa Zembîlfiroş li serê Gulxatûnê dixê û bi bandora wê evînê bêhay û bêhiş dimîne. Bi risteya dawî ku dibêje “Gazî diket Zambîlfiroş” Gulxatûn bi fermanekî, bi destê cariyeyên qesrê, Zembîlfiroş tîne heta ber lingên xwe.

Di berhema Mûradxanê Bayezîdî de wekî ku Feqî jî wisa hûnandibû, Zembîlfiroş li pey rizqê zar û zêçên xwe kuçe bi kuçe digere û her gav hewldana wî ji bo rizqê helal e.

Di çîroka Zembîlfiroş ya Mûradxanê Bayezîdî de ji benda 56an ku dibêje:

Xatûn dibêt lawê derwêş
Kerem bike tu were pêş
Selka mezin bi zêr bikêş
Ya biçûk qîmeta bibêj

dîyalogên di navbera Zembîlfiroş û Gulxatûnê dest pê dîkin û cara pêşî Zembîlfiroş bi vê benda 59an bersiva Gulxatûnê dide:

Lawik dibêt ey Xatûn
Nevêtin min malê dinê
Qayil nabim bi gotinê
Dûr im ez li qesêt nexwoş

Piştî bersiva yekem ya Zembîlfiroş bend bi bend dîyalogên Gulxatûn û Zembîlfiroş dewam dîkin. Mûradxanê Bayezîdî heta benda 109an evîna Gulxatûnê ya li hemberî Zembîlfiroş dide û peyre derbasî mijara vegerê ya Zembîlfiroş ber bi Diyarbekir ve û dawiya çîrokê bi Mîrbûna Zembîlfiroş tê.

2.3.2.3. Peyama Beyta Zembîlfiroş: Mûradxanê Bayezîdî, wekî Feqiyê Teyran bi awayekî aşkere peyamek nedaye û ji bilî benda dawî hemû bendên xwe li ser Zembîlfiroş û evîna Gulxatûnê saz kirine. Bi tenê di benda 127an de mirov dikare bibêje ku peyamek heye û vê peyama xwe jî wekî mukafatek ku Zembîlfiroş dîtiye tîne ziman.

Hukim gêra dirêj zeman
Wî xizmet kir zor bi eman
Mirin bi kez nodet peyman
Hemû vêkra dê biçin cihek xwoş

2.3.3. Ji aliyê zimên û şeweyê ve: Dema ku mirov ji aliyê zimên ve li Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî dinêre, mirov dibîne ku ji zimanekî girtî dûr e, bi zimanekî rojane û vekirî û herikbar peyamên xwe anîne ziman. Di berhema Mûradxanê Bayezîdî de mirov gelek kêmbêjeyên biyanî dibîne. Ji çend bêjeyên biyanî ku bi kar anîne mînak: qanî, hukim, ‘eyal, dua, rizq. Wekî ku tê dîtin li gorî Feqiyê Teyran, Mûradxanê Bayezîdî di berhema xwe de gelek kêmbêjeyên biyanî bi kar anîne. Dîsa nivîskar ji aliyê bêjeyên kurdî ve jî berhema xwe gelek dewlemend kiriye. Mirov dikare van bêjeyan wekî mînak bide: şahî, hinav, mendehoş, dergevan, sotin, qewî, bac, siwar, peya, daremeyt, gorxanî, mindal, kox, sel, cindî, pîroz, sore, çol û beyar, cil, xirxal, tenî, mirar, genî, bend,

govend, xort, hêvî, peyman û hwd. Wekî ku tê dîtîn ji aliyê peyvên kurdî ve gelek dewlemend e û hîn gelek têgehên din jî cî digirin.

Di berhema Mûradxanê Bayezîdî de jî ji bo ahenga riste û bendan hin hêmanên helbestê hatine bikaranîn ku yek ji wan jî qafîye ye. Wekî mînak:

Şahzade dibêjit nazenîn
Min dî xewnek xwoş û şîrîn
Qesr û qusur hemî zêrîn
Tu li nav da horî perdopoş

Li xew hatim bême qesran
Ez û tu pêk ve bikeyn seyran
Li min horî bû dergevan
Lew ez hişyar bûm mendehoş

Mûrdaxanê Bayezîdî jî wekî Feqiyê Teyran bi şêweyeke wêjeya gelêrî, wekî ku li hemberî civatekê be û çîrokê bi awayekî devkî vedibêje, destpêka çîrokê jî bi hisandina mijara xwe dest pê dike. Ango dixwaze ku bi benda pêşîn ku ji sê risteyan pêk tê, bala xwendevanan bikişîne ser çîrokê. Nivîskar di benda pêşî de wiha dibêje:

Ey meclîsa pirr zewq û xwoş
Guh bidene sohbetek xwoş
Dê keyn behsî Zembîlfiroş

2.3.4. Ji aliyê şiklên nezmê ve: Berhema Mûradxanê Bayezîdî ji bilî benda pêşî an jî destpêkê ku ji sê risteyan pêk tê, ji bendên çar risteyî pêk tê. Berhema nivîkar bi giştî ji 129 bendan pêk tê. Bi vê hejmara xwe ji aliyê şiklê nezmê ve “Çîroka Zembîlfiroş” ya Mûradxanê Bayezîdî “destan” e.

Ji aliyê qafîyeyê ve berhema Mûradxan wiha ye:

Zembîlfiroş kurê mîran e → a
Lawekî bejin ruhan e → a
Xwedanê koçk û dîwan e → a
Le keyf û seyran şev û roj → x

Lê belê dema ku mirov li pegala qefiyeyan dinêre, mirov dibîne ku li gelek ciyan li hev nanihêrin. Wekî mînak:

Bend: 17

Nazenîn mîrî dibî**nît**

Rondika xwinê dibarî**nît**

Lez diket, dilezî**nît**

Dayk û baban pê dihesî**nît**

Bend: 18

Dibêjite dayika mîrî**ye**

Kure te xewnek dîtî**ye**

Dunya li ber çavan sar bi**ye**

Digîritir ew şev û ro**j**

Bend: 19

Rabe tu dayikê bilezî**ne**

Babê wî tu pê bihesî**ne**

Hekîm û cingiran bî**ne**

Belê ney dîn e û ney nexwo**ş**

Mûradxanê Bayezîdî jî wekî gelek nivîskarên wêjeya gelêrî, benda xwe ya pêşîn wekî pênasîna hîkayeyê bi kar aniye.

Dema ku mirov ji hêla pîvanên kîteyî ve li berhema Mûradxanê Bayezîdî dinêre, her çi qas meyl li ser 8 kîteyiyê be jî; pergalek tekûz tune ye. Mînak:

Bend: 1

Zembîlfiroş kurê mîran e → 9

Lawekî bejin ruhan e → 8

Xwedanê koçk û dîwan e → 8

Le keyf û seyran şev û roj → 8

Bend: 2

Şev û roj keyf û xwoşî ye → 8

Be îşq û reqs û şahî ye → 8

Çu acizî di dil da niye → 8

Ne dîtiye saetek nexwoş → 9

Di destanan de nivîskar di çarîna dawiyê de bi piranî ji bo xwe nasnavek bi kar tînin. Bayezîdî jî di “Çîroka Zembîlfiroş” de bi vê çarînê dawî tîne:

“Sed û nehwêd sal boriye

Paşî hezara hîcrî ye

Mûradxan dibêt şer hatiye

Bi şîr bi gotineka xwoş”

Mûradxanê Bayezîdî di vê benda xwe ya dawî de ne nasnav, bi awayekî navê xwe yê rastîn bi kar anîye û gotiye “Mûradxan”. Her wiha dîroka nivîsandina helbesta xwe ya Zembîlfiroş jî dest nîşan kiriye û gotiye: “Sed û nehwêd sal boriye, paşî hezara hîcrî ye”. Dîroka ku dibêje jî 1190ê koçî ye û bi zayînî jî li sala 1776 dinêre. Ji vê salê xuya ye ku Mûradxanê Bayezîdî piştî Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî berhema xwe nivîsiye.

Aram Gernas di xebata xwe ya li ser Destana Zembîlfiroş de hinek cudahiyên çîroka Feqî û Mûradxan tîne ziman. Em ê li vir guh bidin şîroveiyên birêz Gernas:

“Ev çîroka Zembîlfiroş ya Mûradxan, ji bilî guftûgoya navbera Xatûn û Zembîlfiroş çîrokeke xweser e û ji ya Feqiyê Teyran cudatir e. Cudatir e, ji ber ku Zembîlfiroş kurê mîran e û xwedanê koç û dîwan e:

Zembîlfiroş kurê mîran e

Lawekî bejin ruhan e

Xwedanê koç û dîwan e

Le keyf û seyran şev û roj

Cudatir e, ji ber ku Zembîlfiroş ji ber evîna xwe ya Xwedayî, ji bo nasîna edalet û zordariya mîrîtiya bavê xwe, ji bo kednasî û jîyana xelkê dev ji mîrîtiyê berdide. Demekê bi zembîlfiroşî debara xwe dike heta ku Xatûna Mîrê Mêrdînê ew bi xapa kîrîna zembîlan tîne dîwana xwe û doz lê dike da ku ew bê ser nivînên wê.

Cudatir e, lewra dema Zembîlfiroş ji mala xwe dûr e, jin û zarokên wî birçîne û bêhal ketine. Sê siwar tîn û li ser riya xwe rastî jin û zarokê Zembîlfiroş tîn. Yek ji wan sê siwaran jî, Mîrê Mêrdînê, angî mîrê Xatûnê ye. Piştî pîrs û pîrsiyarî, gelek xwarin û vexwarin didin jina Zembîlfiroş. Xuyaye ku esalet û sadiqbûna jina Zembîlfiroş jî bala Mîrê Mêrdînê kişandiye û bi hêzeke Xwedayî rehim ketiye dilê wî. Dû ra Mîr biryar dide ku Zembîlfiroş bibîne û ji wî û malbata wî ra qesrek amade bike, wana tê da bi cih bike:

Xulam û bend dilezînin

Derwêş û e'yalî tînin

Di nav qesrê datînin

Nêzîkê Xatûna dîlxwoş

Cudatir e, ji ber ku Mîrê Mêrdînê nameyek werdigire ku Zembîlfiroş ne lawek feqîr e, berevajî ew kurê Mîrê Diyarbekirê ye. Mîrê Diyarbekirê jê xwestîyê ku kurê wî û bûka wî, bi selametî bigihînin wî.

Mîr kaxez da xwendinê

Dixwazîtin te û jinê

Neşem bîdem axiftinê

Le pêş padîşayî eskerê boş

Cudatir e ji ber ku Zembîlfiroş vedigere ba bavê xwe û piştî demekê dikeve şûna wî, angî dibe Mîrê Diyarbekirê. Bişev derwêş e, biroj paşayekî bi edalet e.

Zembîlfiroş bo hakim e

Zor adil û zor alim e

Nehêla zulma zalim e

Şev derwêş û paşa bi roj

Hukim gêra dirêj zeman

Wî xizmet kir zor bi eman

Mirin bi kes nadit peyman

Hemû vêkra dê biçin cîhek xwoş¹³²

132. Aram Gernas, *Şiroveyek li ser çîroka Zembîlfiroş û versiyonên wê*, berhema neçapkirî.

Li ser çîroka Zembîlfiroş Aram Gernas hinek motîfên folklorî dest nîşan kiriye ku ew jî ev in:

Motîfên folklorî yên efsaneya Zembîlfiroş

Di destana Zembîlfiroş da gelek motîfên dewlemend û cihê (ji destanên Kurdî yên din cihêtir) hene. Destan, wek destan û çîrokên Kurdî yên din xwedî dawînîyeke trajedîk e. Lê mijara evînê, ku mijara sereke ye, rengêkî cuda nîşan dide û bi dûmenêke cuda folklora me ya Kurdî dewlemendtir dike. Ya din jî, dûmena tesewîfî ye, ango "evîna Xwedayî" ye.

Motîfên efsaneya Zembîlfiroş ji van xalên jêr pêk tên:

Terkkirina mîrîtî û mal û milk: Zembîlfiroş bi eslê xwe mîr e û ji malekî dewlemend e. Ew ji bo xatirê bawerîya xwe dev ji mîrîtî û seltenetê berdide. Zembîlfiroş ji ber zilm û zora bavê xwe ya li ser xelkê, dev ji mîrîtî berdide, zilm û zorê rûreş dike û dikeve rêyeke heq û edaletê.

Fedakarî û dilsozî: Jina Zembîlfiroş fedakarîyê dike, dev ji jîyana xweş û dewlemend ber dide û li hember mêrê xwe dilsozî nîşan dide.

Bilindkirina qedir û qîmeta destkarî (sinetên desta): Zembîlfiroş dev ji hemû hebûnên xwe ber dide û bi çêkirina zembîlan û firotina wan, ango bi keda destê xwe xwe û malbata xwe didebrîne.

Evîndariya bi çavpêketinê: Xatûnê bi çavpêketina yekem bengînê Zembîlfiroş dibe.

Evîna yek alî: Xatûnê ne bi delekê, bi heft dilan bengînê Zembîlfiroş dibe, lê ev evîn yek alî dimîne û Zembîlfiroş bersîva vê evînê nade. Ango Xatûnê dike û nake Zembîlfiroş ji rê dernayê û pê ra ranakeve, nakeve kêf û henekan.

Durustî û exlaqeke payebilind: Ne xweşikbûna Xatûnê, ne mal û milk û ne jî tehdîd û zor Zembîlfiroş ji rê dernaxe. Ew bi malbata xwe ra sadiq dimîne, bi bawerîyên xwe va girêdayî dimîne û ji bo xatirê van prensîban, xwe ji kelê davêje û qesda xwekuştinê dike.

Evîn, hezkirin bi darê zorê nabe: Xatûnê gelek rêyan diceribîne da ku bigihîje mirazê xwe. Zembîlfiroş tehdît dike, wî di qesrê da girtî dihêle, lê encama van kiryanan nîşan dide ku, bi zorê tiştek naçe serî.

Xapandin û plana revê: Zembîlfiroş ji bo şeref û bawerîyên xwe, bêçare dimîne û bi plan û xapandinê ji kelê direve.

Evîna Xwedayî: Evîneke Xwedayî dikeve dilê Zembîlfiroş û ew jîyaneke feqîrî hildibjêre.

Qebûlbûna duayan: Reva Zembîlfiroş jî, wî ji destê Xatûnê xilas nake. Xatûnê xwe digihîne mala wî û heta nava livînên wî. Zembîlfiroş êdî tu rêyekî nabîne, direve çîya û li wê derê lavayîyan ji Xwedê dike da ku rihê wî bistîne. Xwedê duayên wî qebûl dike û bi dawînîyeke trajedîk dimre.

Evîna yek alî lê rastî: Xatûnê jî bi dû Zembîlfiroş dikeve. Xwe digihîne ser cendekê Zembîlfiroş ê mirî. Ew jî ji kerba li wê derê dimre.

Dîsa Gernas danberheva berhevoka xwe û Zembîlfiroşa Mûradxan dike. Gernas dibêje “Danberhevên ku ez ê bikim, wê li gor çîroka berhemê û ya M. Bayezîdî bêne şirovekirin” û berawirdkirinên her duyan wiha bi rêz dike:

Danberhev 1: Destpêka çîroka Zembîlfiroş ne wek hev in. Lewra di çîroka jorîn da Zembîlfiroş, di destpêkê da wek kurê Mîrek bi hukim û hebûn tê nasandin. Ev destpêk di çîroka Mûradxan Bayezîdî da jî her wisa ye, bi tenê cîh cuda ye. Zembîlfiroş piştê derbasî jîyaneke feqîrî dibe û ji ber baweriyên xwe bi keda destê xwe jîyana xwe didomîne. Ev mijar, di berevokên H.Cindî û yên din da ne xuyaye, angî çîrok bê serî ye.

Danberhev 2: Di versiyona jorîn da, jina zembîlfiroş wek jineke dilsoz tê xuyan. Gava Xatûnê tê mala Zembîlfiroş, lavayîyan ji jina wî dike û derd û evîna xwe jê ra dibêje, dilê jina Zembîlfiroş pê dişewite û bi vî awayî destûr dide Xatûnê da ku di nav nivînên wê da rakeve. Lê di berevoka O. Celîl û Celîlê Celîl da, jina Zembîlfiroş timatîya malê dinê dike û ji bo pere û zêr û zîv Xatûnê di nav nivînên xwe da dide razandin.

Danberhev 3: Newekhevîya dawîya çîrokê ye. Di çîroka jorîn da Zembîlfiroş di nav qesrê da û li ba Xatûnê tê hepis kirin. Mîr, angî mêrê Xatûnê ne li mal e. Lê ev mijar di berevoka O. Celîl û C. Celîl da renekî din stendiye, angî Zembîlfiroş bi fermana Mîr tê zîndankirin û kuştina Mîrê Farqînê bi destê Zembîlfiroş tê nîşandan!..

Danberhev 4: Reva Zembîlfiroş e. Di çîroka jorîn da Zembîlfiroş, bêçare dimîne û xwe ji kelê davêje xwarê (navê "Kela Zembîlfiroş" a Farqînê jî, xasîma ji ber vê bûyerê ye). Lê li gor çîroka "Zargotina Kurda" Zembîlfiroş, piştî kuştina Mîrê Farqînê derê zîndanê vedike û bi peyatî direve.

Danberhev 5: Xatûnê heft salan li dû Zembîlfiroş digere û di dawîyê da li navsera çîyayekî wî digel çar horîyan dibîne.

Danberhev 6: Di çîroka Zembîlfiroş a "Zargotina Kurda" da, Zembîlfiroş, reneke balkêş distîne!.. Angî, Zembîlfiroş wek Êzîdî tê xuyan. Lewra navê Zembîlfiroş,

Xatûnê û jina Zembîlfiroş hatine destnîşan kirin. Navê Zembîlfiroş wek Bênamên; navê Xatûnê wek Qedîmxas; navê jina Zembîlfiroş jî, wek Elê ye. Xuyaye ku hersê nav jî, navên Kurdên Êzîdî ne. Lê di versiyonên bingehîn û yên mayî da, ew bi felsefa tesewîfî ya îslamî tê ravekirin. Li gor raya min ev mijara balkêş, taybetmendîyekî Kurdan ê din jî radixe pêş çavan. Ev taybetmendî jî ev e, ku olên cuda nebûne sedemê nakokî û berberîyên navbera Kurdan. Ango, di jîyandina bermahîyên neteweyî da, dîn çî dibe bila bibe, bi rihê Kurdîtî çîrok, efsane, stran, serpêhatî û hemû bermahîyên gelêrî hatine parastin, hatine hezkirin û her yek ji wan bê zordayîne van bermahîyan wek malê xwe hembêz kirine û jîyandine. Bi gotinekî dîn, rihê Kurdîtî raserî olên Kurdan (musulmanî, êzîdîtî, Îsewî, cihûtî, elewîtî û wd) bûye.

Danberhev 7: “Avrêtina” Zembîlfiroş li baxçeyê Xatûnê û kefa sipî ya bi ser destava wî dikeve. Ji bilî vê ecêbê, şiroveya ku li ser vê kefê tê kirin jî balkêş in. Ev motîveke gelek xirab e û xuyaye çîrokbêjê ku vê motîvê lê zêde kiriye, hîlbijartineke nebaş kiriye û esaleta çîrokê hedimandiye.

Li dû van danberhevên xwe, Gernas hin şîroveyên balkêş yên giştî li ser destana Zembîlfiroş tîne ziman ku ew jî ev in:

Şirove 1: Eger Zembîlfiroş feqîrek be û debara xwe bi çêkirina selikan û firotina wan bike, tu taybetmendîyek çîrokê namîne. Lê eger mîrek bi evînek Xwedayî, ji bo heq û edaletê dev ji mîrîtî berde û dakeve nav xelkê, bibe yek ji xelkê wê taybetmendîyek balkêş derkeve pêş da ku çîrokek ava bibe.

Şirove 2: Pêwendîyên navbera Zembîlfiroş û jina wî li ser etîkek bilind, li ser dilsozî, rûmet û hezkirinê hatiye avakirin. Kes ji kesî ra xiyaretê nake. Tu dek û dolab, mal û milk, zêr û zîv wan ji rê dernaxe. Lewma jî versîyona ku dibêje, jina Zembîlfiroş timatiya zêr û zîvan kiriye û ji bo xatirê malê dinê Xatûnê di nivîna xwe da bi cîh kiriye çîrokê xeradike, esaleta çîrokê û kirasê tesewîfî ya ku li ser hîmên etîkek bilind hatine rûniştandin dihedimîne. Lewra jina Zembîlfiroş têra xwe malê dinê dîtiye û di hebûneke mîrîtî da jîyaye û ew bi riza xwe daye dû mêrê xwe.

Şirove 3: Kuştina Mîrê Farqînê yan Diyarbekirê, anga mêrê Xatûnê, kirasê tesewîfî, bawermendî, heq û edalet û mirovahîyê diçirîne û mebesta çîrokê dîkuje. Eger Zembîlfiroş merivek kujdar be divê pêşî Xatûnê bîkuje, ji ber ku ew dixwaze Zembîlfiroş ji rê derxe, pê xiyaretê bide kirin, bawerîya wî qels bike û exlaqê wî xirab bike. Bi kurtî kujdarî, kuştina çîrokê ye.

Şirove 4: Eger Zembîlfiroş xwe ji kelê navêje û piştî kuştina mêrê xatûnê derê zîndanê veke û bi kêfa dilê xwe ji wê derê dûr bikeve, tu bedewî û kelecaniya çîrokê namîne.

Şirove 5: Esalet û mezinahîya Zembîlfiroş, dualî ye. Ji ber ku him evîneke Xwedayî ketiye dilê wî him jî li hember zilma mîrê bavê xwe serî hildide û wek protestokirina vê jîyanê dev ji mîrîtî berdide û li nav refê xelkê cîhê xwe digre. Ango dixwaze bide nîşandan ku meriv çî dibe bila bibe (mîr an feqîr) divê ji heqnasîyê, ji dadmendîyê, ji başîyê, ji rehmê, ji mirovahîyê dûr nekeve.¹³³



133. Aram Gernas, *Şiroveyek li ser çîroka Zembîlfiroş û versiyonên wê*, berhema neçapkirî.

3. LEHENGÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ

Di çîrokên Zembîlfiroş yê Feqiya Teyran, Melayê Bateyî û Mûradxan Bayezîdî de lehengên sereke hevbeş in û du kes in ku ew jî Zembîlfiroş û Gulxatûn in. Ji bilî van her du lehengên sereke di her sê guhertoyan de jî hin lehengên din hene ku nivîskar behsa wan jî kiriye û bi rêya wan têkiliya Zembîlfiroş û Gulxatûnê bi hev ve hûnandiye. Li vir em ê bi giştî behsa lehengên her sê guhertoyên çîroka Zembîlfiroş bikin.

3.1. Lehengên Zembîlfiroşa Feqiye Teyran: Di Zembîlfiroşa Feqiye Teyran de bi rêzê ev leheng derbas dibin:

3.1.1. Zembîlfiroş: Feqiye Teyran di berhema xwe de ji bo Zembîlfiroş van nasnavan bi kar aniye: Zembîlfiroş / Zembîlfiroş, lawê rewal, lawê feqîr, law / lawik / kur, lawê biyanî, lawê vîrevan, kurê mîran / lawê mîr, bejin ruhan.

Zembîlfiroş tê wateya kesê ku zembîlan difiroşe, îcar zembîl ew amûr e ku ji zilan tê çekirin û li bazarên an jî li malan ji bo têxistina tiştên mîna fêkî, erzaq û lazmatiyên malê tê bikaranîn. Marif Xeznedar di berhema xwe ya bi navê “Mêjûy Edebî Kurdî” de ji bo zembîlê dibêje ku “Nîşaneyê bajarvaniyê ya wê demê zembîl in. Her wiha pîşesaziya Zembîlê li rojhilat bi peydabûna bazarên re girîngtir bûye. Zembîlên ku ji aliyê westa û şagirtan ve tên çekirin jî yan ji aliyê wan ve li bazarên tên firoştin, yan jî ji aliyê hin kesan ve bi erzanî ji westa tên kirîn û li bazar û kolanan tên firoştin û bi wî awayî ew kes debara xwe dikan.”¹³⁴

Zembîlfiroş jî yek ji wan kesan e ku karê Zembîlfiroşiyê dike. Di berhema Feqiye Teyran de bi giştî bi van bendan wesfê Zembîlfiroş hatiye kirin:

Bend: 2

Zembîlfiroş lawê rewal e

B kulfet û ehl û 'eyal e

'Husna Yûsivî li bal e

'Heq rizayê qismetê

Bend: 3

134. Duktur Marif Xeznedar, Mêjûy Edebî Kurdî, Bergî Duwem, Sedekanî çîwardem-hejdem, Dezgay Çap û Bilawkirdinewey Aram, Hewlêr, 2010, r. 231-232

Zembîlfiroş lawê feqîr e
D sinetê xo da esîr e
Daîma yê 'Heq li bîr e
Rast bkerestê sinetê

Bend: 4

Kerestê sinet 'tebeq bû
Daîma ê rast û 'heq bû
Qîmeta selka wereq bû
Pê didêrit kulfetê

Bend: 5

Kulfetê qismet li wî bû
Zêr û mal çu b xwe nedîbû
Qîmeta selkan b lepî bû
Her bi dest meşxeletê

Bend: 6

Her bi dest zembîl dibesta
Dbirne bazarî ji qesta
Xwarinek pê dhate desta
Razî bû b wê qîmetê

3.1.2. Xatûn: Ev leheng jina Mîr e û cara ewil bi vê bendê di çîrokê de derdikeve pêş:

Bend: 7

Rojekê selkan ku tîne
Xatûnek jorda dibîne
Bi dil û can dihebîne
Ketye benda mehbetê

Bi vê bendê û piştî vê bendê re lehenga sereke ya jin ku Xatûn e, derdikeve holê û çîrok li dora evîna wê ya ji Zembîlfiroş re digere.

Her wiha ji bo Xatûnê mirov dibîne ku Feqiyê Teyran ev nasnav bi kar anîne: Kiç / keç, letîfa reşxumar, bisk 'herîr, qenca tamam, Gulxatûn, Ewa gerden zêrîn /Xatûna gerdenzêr, Xatûna delal zendebazin, Xatûna gerden zer.

3.1.3. Cariye: Di berhema Feqiyê Teyran de cariye ne yek kes e. Bi risteya “Cariya d xewfa Xudê ne” (Bend: 10, Riste: 1) tê fêmkirin ku cariye gelek in. Li ciyekî çîrokê cariye derdikevin pêşberî me. Ew jî piştî ku Gulxatûn bi evîna Zembîlfiroş dikeve, ji bo ku Zembîlfiroş bike dafîka xwe, cariyeyan bi kar tîne û cariye jî diçin û Zembîlfiroş dixapînin da ku wî bînin qesrê û derxin hizûra Gulxatûnê.

3.1.4. Dergevan: Dergevan kesek e û di çîrokê de li ciyekî derdikeve holê. Nivîskar di benda 16. de behsa rola dergevan dike û dibêje:

Law bi wê lêbê nizanî
Bê fikir ew çûye banî
Derge dada Dergevanî
Çi bela bû law ketê

Ji vê bendê tê fêmkirin ku piştî ku Zembîlfiroş dikeve dafîka Gulxatûnê û dikeve hundirê qesrê ji aliyê Dergevan ve derî tînin radan.

3.1.5. Mîr: Mîr zîlamê Gulxatûnê ye. Nivîskar li sê ciyan gotinê tîne ser Mîr ku yek jê ev benda 12an e:

Selik birin bi jor hinare
Dît Cariyek hate xar e
Mîr ji te divê dîdar e
Da tu bêjî qîmetê

dema ku cariye hewl didin da ku Zembîlfiroş bixapînin, navê Mîr bi kar tînin. Ya duyem di benda 28an de:

Law dibê ya bisk 'herîr e
Ew di pîroz bin li Mîr e
Çi 'heddê lawê feqîr e

Dest bete vê suhbetê

Zembîlfiroş behsê tîne ser Mîr û dixwaze bi wî awayî ji destê Gulxatûnê xelas bibe. Ya dawî jî dema ku Zembîlfiroş selik dide Mîr derbas dibe ku ew jî di benda 54an de derbas dibe.

3.1.6. Jin: Jin hevsera Zembîlfiroş e. Feqiyê Teyran di dawiya çîrokê de behsê tîne ser jina Zembîlfiroş û wekî mînak bi vê bendê behsa wê jî derbas dibe:

Bend: 58

Jinê 'aqîl hebû li bal

Da agirî helkeyn li mal

Cîran nebin fikr û xiyal

Me navê zadê şubhetê

3.2. Lehengên Zembîlfiroşa Melayê Bateyî: Lehengên Zembîlfiroşa Melayê Bateyî ev in:

3.2.1. Zembîlfiroş: Di berhevoka Albert Sosin de Zembîlfiroş wekî “Zenbîlfiroş” derbas dibe. Ew jî bi vî awayî behsa Zembîlfiroş dike:

Zembîlfiroş lawikê rewel bû

Bi kilfet ehl û ‘eyal bû

Husnekî Êsif li bal bû

Heq rizaqê qismetê

Her wiha di destnivîsa Qanadê Kurdo de jî wekî “Zembîlfiroş” derbas dibe. Dîsa di her du berhevokan de ku li ser navê Melayê Bayteyî hatine belavkirin, nasnavên Zembîlfiroş wiha derbas dibin: Zenbîlfiroş / Zembîlfiroş, Selfiroş / Selikfiroş, Lawê rewel, Lawê feqîr, Law / Lawik / Kur, Lawê biyanî, Lawê vêrevan, Kurê mîran / Lawê mîr, Nûrîn, Dîndar, Lawikê delal, Lawikê nezan.

3.2.2. Xatûn: Navê Xatûnê bi awayê Gulxatûnê jî derbas dibe. Gulxatûn jina Mîr e û ew leheng e ku bi evîna Zembîlfiroş dikeve. Di berhevokên Sosin û Kurdo de ev

nasnav ji bo Xatûnê hatine bikaranîn: Kiç / keç, Xatûn, Qenca temam, Gulxatûn, Xatûna gerdenzêr / Xatûna delal zendebazin, Ewa gerden zêrîn, Xatûna aqiltemam, Xatûna gerden zer.

3.2.3. Cariye: Di berhevokên A.Sosin û Qanadê Kurdo de cariyê wekî “cariya” û “caring” derbas dibin. Dîsa ew fêlbaz in ku Zembîlfiroş dixapînin.

3.2.4. Mîr: Mîr di berhevoka Sosin de derbas nabe, di destnivîsa Kurdo de heye. Li vir jî Mîr dîsa kulfetê Gulxatûnê ye.

3.3. Lehengên Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî:

3.3.1. Zembîlfiroş: Di Zembîlfiroşa Bayezîdî de lehengê me yê sereke bi navê Selfîroş û Selikfiroş jî derbas dibe. Bayezîdî bi vê bendê lehengê sereke dide nasîn:

Bend: 1

Zembîlfiroş kurê mîran e

Lawekî bejin ruhan e

Xwedanê koçk û dîwan e

Le keyf û seyran şev û roj

Her wiha ji bo Zembîlfiroş di helbesta Bayezîdî de ev nasnav hatine bikaranîn: Zembîlfiroş / Zembîlfiroş, Lawê feqîr, Law / Lawik / Kur, Nazdar, Şahzade / paşazade / kurê padîşah, Feqîrek xirqepoş, Bibîya çavan, Xwedanê sela, Derwêş / lawê derwêş / derwêşê Xwedê, ‘Ebdê Xwedê, Xwoş camêr.

3.3.2. Jin: Di berhema Bayezîdî de lehenga ku bi navê Jin hatiye dayîn, hevsera Zembîlfiroş e. Di gelek ciyên çîrokê de navê wê derbas dibe. Her gav li cem Zembîlfiroş e û ji bo başiya wî hewl dide.

3.3.3. Bab û Dayik: Li vir Bab û Dayik yê Zembîlfiroş in, di serê çîrokê de hewl didin ku kurê wan dev ji wan bernede û ji qesrê neçe; lê belê bi ser nakevin û Zembîlfiroş serê pêşî ji cem wan biçe jî, di dawiya çîrokê de dîsa vedigere cem wan. Her wiha li hin ciyên çîrokê navê bavê, wekî Padîşah jî derbas dibe.

3.3.4. Wezîr: Di çîrokê de dema ku Zembîlfiroş dixwaze ku ji qesrê veqete û bi kom û kulfetê xwe re jiyanê derwêşane bijî, Mîr di nav neçariyê de dimîne û nizane dê çi bike û tam di wê heynê de lehengekî din di çîrokê de dertê holê ku ew jî Wezîr e. Wezîr wekî gelek çîrokên gelêrî li vir jî dikeve rola wî kesê ku aqil dide Mîr û der û dorên xwe. Bayezîdî di benda 39an de wiha gotinê tîne ser Wezîr:

Xelq û alem pîr û wezîr
Hemû vêk ra debêne mîr
Bila biçêt xwo biket jibîr
Da tam biket halî feqîr

3.3.5. Xatûn: Di çîroka Bayezîdî de jî Xatûn an jî Gulxatûn roleke girîng dilîze. Dîsa li vir jî bi heman awayî li pey dek û dolap û dafikan e ku Zembîlfiroş bixapîne û wî bixîne tora miradê xwe. Ji her sê guhertoyan ya ku herî zêde li ser evîna Gulxatûn û Zembîlfiroş disekine û bûyerên wan radixe ber çavan, çîroka Bayezîdî ye. Dîsa di heman berhemê de ji bo Gulxatûnê ev nasnav hatine bikaranîn: Xatûn, Gulxatûn, Xatûna gerdenzêr / Ewa gerden zêrîn, Xatûna gerden bi morî, Bejin dara zeytûnê, Xatûna şeng û şepal, Çavreşa Çavxezal, Rû sor e gerden bi xal, Rûreşa mest û serxwoş, Namûsfiroş / Xatûna namûsfiroş, Xatûna devbikenî, Rûreşa wekî tenî, Pîsa mirara goşt genî, Bêhaya hetikfiroş.

3.3.6. Xadim û Xizmetkar: Di çîroka Zembîlfiroş ya Bayezîdî de li ciyê cariyeyan xadim û xizmetkar hatine bikaranîn. Li vir jî dîsa peywira wan dîtina şopa Selikfiroş û anîna wî ya ber Gulxatûnê ye. Xadim û xizmetkar ji bo xebatkarên jin hatiye bikaranîn.

3.3.7. Xulam û Bende: Dîsa di heman qonax û qesrê de ji bo xizmetê çînek din heye ku ew jî Xulam û Bende ne. Ev xizmetkar zilam in ku di çîrokê de peywira wan dîtina Zembîlfiroş û malbata wî û anîna wan a bicîkirina li qesrê ye.

4. SERDEM Û WARÊ(N) QEWIMÎNA DESTANA ZEMBÎLFIROŞ

Di berhema Wesfî Hesên Ridênî ya bi navê “Beyta Zembîlfiroş” de, li ser serdem û warê qewimîna serpêhatiya Zembîlfiroş ev agahî hatine dayîn:

Li gorî du xalên aşekere û belgenivîsan çîroka Zembîlfiroş ji sedî sed berhemeke kurdî ye û ew xal jî ev in:

4.1. Ciyê qewimîna serpêhatiya Zembîlfiroş Farqîna Diyarbekirê ye. Keleha Zembîlfiroş wekî parçeyek ji qesra mezin a Farqînê tê qebûlkirin ku ev qesr ji aliyê dewleta Merwanîyan ve ji bo Mîrekî kurd hatibû avakirin û mala Mîr di vê qesrê de bûye. Ev qesr di sala 1007ê zayînî de ji aliyê hukumdarê Merwanî, Ebû Nesr Ehmed Nasîruddewle kurê Merwan ve hatiye nûjenkirin. Gerokê navdar Yaqût Hemewî di sala 1217ê zayînî de çûye Farqînê û Keleha Zembîlfiroş dîtiye û behsa wê kiriye.

4.2. Zembîlfiroş mirovekî kurd e. Navê wî Seîd e û wekî Mîr Seîdê Kurê Mîr Hesên Paşayê Diyarbekirî tê naskirin. Li gorî ku nivîskar û lêkolînerê kurd ‘Ebudrreqîb Yusûf di kitêba xwe ya bi navê “ed-Dewletud-Dostikiyye” de dibêje, serpêhatiya Zembîlfiroş di dema Dewleta Merwanîyan de di sala 994ê zayînî de qewimiye.¹³⁵

Ji bilî van agahiyan ku em ji wan fêr bûn ku ciyê qewimîna serpêhatiya Zembîlfiroşê Farqîn e û serdema rûdana wê jî serdema Merwanîyan e. Li başûrê Kurdsitanê li Batîfayê bi navê “Mezargehê Zembîlfiroş” goristanek heye û tê gotin ku ji aliyê xelkê wê deverê ve çîroka Zembîlfiroş bi devkî tê vegotin. Li ser vê deverê û vê rewşê Wesfî Hesên Ridênî di heman berhema xwe de dibêje ku serpêhatiya Zembîlfiroş li Batîfayê rû nedaye û têkiliya çîroka Zembîlfiroş û Batîfayê bi hev tune ye. Bi dîtina wî, bi rêya feqî, mela, stranbêj û derwêşan serpêhatiya Zembîlfiroş li hemî deverên Kurdistanê mezin belav bûye û peyre jî heta Batîfayê hatiye. Dîsa Ridênî dibêje ku ne dûrî aqilan e ku serdemekê melayek, an derwêşek an jî kesek ji Cizîra Botan, an ji devera Diyarbekir, an jî ji Farqînê hatibe û ji xelkê Batîfayê re gotibe ku ez mirovê Zembîlfiroşî me û ji xelkê re behsa serpêhatiya Zembîlfiroş kiribe û peyre jî wekî yadîgar li Batîfayê bi navê Zembîlfiroş mezargehek hatibe avakirin.¹³⁶

135. Wesfî Hesên Ridênî, *Beyta Zembîlfiroş, Dîrok Wargeh Çendîn Deq*, Weşanên Sipîrêz, Hewlêr, 2008, r. 16.

136. h.b. r. 18.

5. BELAVBÛN Û TOMARKIRINA ZEMBÎLFIROŞ

5.1. Belavbûn: Li gorî ku em ji çavkaniyên navborî hîn bûn, piştî ku serpêhatiya Zembîlfiroş li devera Farqînê di sala 994ê zayînî de diqewime, bi rêya feqî, mela, dengbêj, stranbêj û derwêşan li gelek deverên Kurdistanê bi awayê çîrokî û dengbêjî di nav gelê kurd de belav dibe.

Wesfî Hesên Ridênî li ser vê yekê wiha dibêje: “Di sala 1971ê de mala me li Amêdiyê bû. Cara ewil ew sal di bêhnvedana havînê de ez çûm serdana gundê xwe Ridênîyê ya li devera Bergarey. Dema ku em li gund bûn, hin derwêş ji bo berhevkirina erzeq hatin gund. Em jî digel zarokên gund li dora wan civiyan. Derwêş jî ji bo gundiyan çen şêir, beyt û medhiye gotin. Ji nav wan hemî şêir û medhiyeyên derwêşan, bi tenê kêfa min ji awazê beyta Zembîlfiroş re hat û bi wê gelek dilxweş bûm.”¹³⁷

Wekî ku em ji gotinên Ridênî hîn dibin, heta demên dawî jî serpêhatiya Zembîlfiroş ji aliyê derwêşan ve li gelek deverên welêt hatiye gotin û hê jî tê gotin. Piştî ku bûyera Zembîlfiroş diqewime û di nav gelê kurd de belav dibe, îca divê ji aliyê hin kesan ve derbasî nivîsê bûbe. Niha jî em ê behsa wan kesan bikin ku cara ewil Zembîlfiroş derbasî nivîsê kirine û bûne wesîle ku bigihîje roja me.

5.2. Tomarkirin: Di berhema Wesfî Hesên Ridênî de ji destpêkê heta îro kê li ser Zembîlfiroş nivîsiye, wekî lîste di pirtûka xwe de daye. Em ê jî li gorî agahiyên wî behsa çend kesên sereke û berhemên wan bikin:

5.2.1. Di sala 1856an de bi destê Mela Mehmûdê Bayezîdî hatiye nivîsandin. Mela Mehmûd ev nîsxê teslîmê A. Jaba kiriye, Jaba jî ew biriye Pirtûkxaneyê Petersbûrgê. Ev nusxe, ya Feqiyê Teyran e. Jaba bi tevayî şeş destnivîsên vê çîrokê bi dest xistine û di pirtûkxaneyê navborî de bi hejmarên Kurd 25, Kurd 26, Kurd 27, Kurd 28, Kurd 36, Kurd 40 qeyd kirine.

5.2.2. U. Poyra û A. Sosin du deqên Kurdistana Bakûr kom kirine û di sala 1870yê de di nav pirtûka xwe ya bi navê “Hinek Tekstên Kurdî” de bi Elmanî belav kirine.

5.2.3. Rojhilatnasê Rûsî P. Lerc di sala 1855an de li Mêrdîn, Ruha, Dêrsim, Mûş, Cizîr, Xerpût û Erzerûmê geriyaye; di sala 1857an de pirtûkek bi navê “Folklorî Kurdî” nivîsandiye û di vê pirtûka xwe de Zembîlfiroş jî qeyd kiriye.

137. h.b. r. 5.

5.2.4. Rojhilatnasê Rûsî S.A. Beg Zadov di sala 1891ê de li Tiflîsê pirtûkek bi navê “Dîroka Kurdên Erîvanê û Çend Deqên Folklorî Kurdî” nivîsandiye û tê de cih daye du deqên Zembîlfiroş.

5.2.5. Lêkolînerê Elmanî F. Lokok di sala 1901ê de li Kurdistanê Bakûr geriyaye, pirtûkek bi navê “Çend Tekstên Kurdî” nivîsandiye û ev pirtûk di sala 1903an de çap kiriye. Nivîskar di vê pirtûka xwe de digel çend çîrokên folklorî, gotinên pêşyan, Mewlûda Bateyî, û cî daye sê deqên Zembîlfiroş.

5.2.6. Lêkolînerê Elmanî Hûgo Makas ji devê Kurdekî Mêrdînî deqeke Zembîlfiroş heldaye û di kitêba xwe ya bi navê “Tekstên Kurdî” de bi kurdî û elmanî qeyd kiriye ku ev pirtûk di sala 1920î de li Lenîngradê hatiye çapkirin.

5.2.7. Oscar Mann di sala 1906an de deqeke Zembîlfiroş bi zaravayê Mukriyanî kom kiriye.

5.2.8. Casimê Celîl (1908-1982) deqeke Zembîlfiroş di xebata xwe ya bi navê “Folklorê Kurmanca” de weşandiye.

5.2.9. Heciyê Cindî (1906-1968) deqeke Zembîlfiroş bi tîpên latînî nivîsandiye û di nav xebata bi navê “Folklorê Kurmanca” de belav kiriye.

5.2.10. Emînê Evdal (1906-1968) deqeke Zembîlfiroş nivîsandiye û di nav xebata xwe ya bi navê “Folklorê Kurmanca” de belav kiriye.

5.2.11. Heciyê Cindî (1906-1968) sê deqên Zembîlfiroş di nav xebata xwe ya bi navê “Destanên Folklorê Kurdî” de belav kirine. Ev xebat bi rûsî ye di sala 1962an de li Moskovayê hatiye çapkirin.

5.2.12. Y. Donayevskî deqeke Zembîlfiroş ji Erebê Şemo hildaye û di sala 1937an de di nav xebata xwe ya bi navê “Ji Dahênanên Gelê Sovyetê” de bi rûsî belav kiriye.

5.2.13. Şêx Muhemmed Tahir Birîfkanî nusxeya Mûradxan di sala 1967an de daye Gîw Mukriyanî. Gîw jî di heman salê de li Hewlêrê çap kiriye. Di vê çapê de gelek bêje û term bi guhertoyên soranî hatine nivîsandin.

5.2.14. Bi zimanê rûsî, li kovara Elminax jimare yek sala 1937an de, di rûpelên 441-448 de li Moskovayê belav bûye.

5.2.15. Fitah Qazî, lêkolînek li ser beyta Zembîlfiroş di sala 1901ê de di kovara Zankiwa Tebrîz li Îranê belav kiriye.

5.2.16. Vîkender, deqeke Zembîlfiroş di nav pirtûka xwe ya bi navê “Komele Têkstî Kurmancî” de di sala 1909an de li Upsilaya Siwêdê daye çapkirin.

5.2.17. Radyoya Kurdî Li Êrîvan, di navbera salên 1909 û 1975an de bi dengê stranbêjên kurd, bi taybetî jî bi Karabetê Xaço, strana Zembîlfiroş daye guhdarîkirin.

5.2.18. Qenadê Kurdo, di sala 1962an de deqeke Zembîlfiroş di pirtûka xwe ya bi navê “Çend Têkstên Folklorî” de ku çap kiriye.

5.2.19. Sarkîs Aykonî Ermenî, di sala 1962an de deqeke Zembîlfiroşê di pirtûka xwe ya bi navê “Folklorî Kurdî” de belav kiriye.

5.2.20. Mela Ehmed Hecî Mewlûd Şinwî, deqeke Zembîlfiroş ya ji devera Mehabadê li cem wî bûye û di sala 1965an de daye Gîwî Mukriyanî, wî jî belav kiriye.

5.2.21. Mehmûd Tewfîq Wirdî, di 1971an de li Bexdayê deqa Zembîlfiroş ya Heciyê Cindî wergerandiye zimanê erebî û di pirtûka xwe ya bi navê “Qissey Şiriye Kurdiye” de çap kiriye.

5.2.22. Gîwî Mikriyanî (1902-1977), di 1967an de du deqên Zembîlfiroş di “Çîrokî Zembîlfiroş” de belav kirine.

5.2.23. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, di sala 1973yan de deqeke Zembîlfiroş di nav pirtûka xwe ya bi navê “Folklorê Kurdî” de li Moskovayê belav kirine.

5.2.24. Ebdulrehman Mizurî, di rojnameya Hawkarî de kurteyê deqa Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî, di hejmara 182 ya sala 1973an de belav kiriye.

5.2.25. Ebdurreqîb Yûsif, di rojnameya Hawkarî de gotarek li ser dîroka serpêhatiya Zembîlfiroş, di hejmara 188 ya 1973an de belav kiriye.

5.2.26. Dr. Xelîd Cindî, di rojnameya Hawkarî de gotarek li ser serpêhatiya Zembîlfiroş, di hejmara 233 ya sala 1974an de belav kiriye.

5.2.27. Jakalîn Mûseyayan, pirtûka xwe ya bi navê “Zembîlfiroş” di sala 1977an de li Moskovayê çap kiriye ku di pirtûka wî de deh deqên Zembîlfiroş cî digirin.

5.2.28. Muhemmed Emînê Osman, di sala 1982an de deqeke Zembîlfiroş di pirtûka xwe ya bi navê “Dîwana Melan” de belav kiriye.

5.2.29. Sedîllah Şêxanî, di sala 1982an de deqeke Zembîlfiroş di pirtûka xwe ya bi navê “Çîrok û Beytî Lasî û Xezal û Zembîlfiroş” de belav kiriye.

5.2.30. Rojhilatnas Orbelî, di sala 1982an de deqeke Zembîlfiroş ya devera Muksê di pirtûka xwe ya bi navê “Folklorê Muksê” de belav kiriye.

Ji bilî van ji aliyê gelek kesan ve tomarkirina Zembîlfiroşê bêguman hatiye kirin. Her wiha di jêdera vê xebatê de jî wê bê dîtin ku gelek tomargêrên nû jî vê mijarê dane ber dest ku hin ji wan Qanadê Kurdo, Seîd Dêreşî, Wesfî Hesên Ridênî, M. Xalid Sadî, Merûf Xeznedar in ku bi pirtûkên xwe cî dane serpêhatiya Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê.

BEŞA ÇAREM: HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ û ÇÎROKÊN DIN

Di serpêhatiya çîroka Zembîlfiroş de ji hêla qewimîn û sazûna çîrokê ve hin motîfên li ber çav hene ku dişibin hin çîrokên evînê û gelêrî ku li rojhilat rû dane. Di nav çîrokên wêjeya rojhilat de du heb hene ku ji aliyê bûyer û lehengên çîrokê ve, hevbeşiyên wan bi Zembîlfiroş re hene. Ew çîrok jî serpêhayitên Yûsif û Zelîxa û Îbrahîmê Kurê Edhem in.

1. HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ û YÛSIF û ZELÎXA

Di gotara Rohat Alakom ya di kovara Bîr de ku li ser Zembîlfiroş jî rawestiyabû, bi çend gotinan jî balê dikşîne mijara sernavê me. Alakom di derheqê Yûsif û Zelîxa û Zembîlfiroş de wiha dibêje: “Destana Zembîlfiroş ji aliyekî ve destana Êsif û Zelêxe tîne bîra mirovan. Xatûna ku navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe gelekî li Zelêxe çûye, dirûvê wê lê dikeve, wek hev in. Zelêxe jî wek Xatûnê jina mîrekî ye, mîrê Misrê. Dema Êsif, kurê Aqûb pêxember dibin Misrê, dilê Zelêxe gelekî dikeve Êsif. Di şaxên Êsif û Zelêxe yên folklorîk de, çawa em dibînin dema Zelêxe, Êsif ji xwe re dikire, wê demê Êsif riya revê digere. Lê belê ji destê vê jînekê xelas nabe.¹³⁸ Zelêxe tîne vê carê Êsif şikyatî mîrê xwe dike, mîr jî tîne wî dixwe zindanê. Ev destana di nav kurdan de gelek belav bûye, gelek şaxên wê yên edebî û folklorîk hene.¹³⁹

Heke mirov serpêhatiya Zembîlfiroş û Yûsif û Zelîxayê bide ber hev mirov dikare behsa van hevbeşiyên wan bike:

1.1. Gulxatûn û Zelîxa: Ev her du nav, lehengên jin yên her du çîrokan in. Li aliyekî jina Mîrekî Misrê; li aliyê din jina Mîrekî Kurdistanê. Her du jî bi heman awayî bi dilekî tije eşq dişewitin û dilorînin li pey hezkiriyên xwe. Zelîxa çawa ji bo Yûsif dîn dibe; Gulxatûn jî li pey Zembîlfiroş dîn û har e. Zelîxa çawa ku li pey daxwaz û xweziyên xwe, di encama dek û dolab û dafikên xwe, bê mirad li ciyê xwe bi tenê dimîne; bi heman awayî Gulxatûn jî bi heman rê û rêbazan diweste li pey Zembîlfiroş, lê ew jî bê siûd û bê mirad li ciyê xwe rûdinê. Zelîxa bi gotin û xwestekên xwe ji Yûsif

138. M. B. Rudenko, Şaxên Poema Kurdî Êsif û Zelêxe Yên Edebî û Folklorîk, r. 297. vgz. Rohat Alakom, *Siliva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Car Ava Bûye*, Bîr, j.1., Bihar, 2005

negirt tu bersivî û wî bi zindanê da tirsîn da ku belkî bifetile ber bi miradê wê ve; Gulxatûn jî bi heman yekê jêtirê ku bi zindanê dê bitirsîne dilê ku ji eşqa Xwedê şewitiye û bi wê baweriyê digot qey dê Selikfiroş xwe bifiroşe xweziyên dinyayê. Lê ne Zelîxa û ne jî Gulxatûn bi xweziyên xwe re derketin ger û seyraneke bihiştî, her du jî bi keser û xemsariya dilê xwe di nav agirê evîna xwe de şewitîn û şewitîn.

1.2. Zembîlfiroş û Yûsif: Dema ku mirov li her du çîrokan dinêre, mirov dibîne ku gelek aliyên hevbeş yên van her du lehengan hene.

1.2.1. Xweşikî: Ji aliyê xweşikbûn û qeşengiyê ve Yûsif di hemû wêjeyên rojhilat û rojava de bi nav û deng e. Di bin bandora vê sipehîtiya Yûsif de nivîskarên Kurd ku li ser serpêhatiya Zembîlfiroş berhem dane, mirov dibîne ku xweşikiya Seîd ku Zembîlfiroş e, şibandine ya Yûsif. Li ser vê yekê nivîkarê pêşî yê Zembîlfiroş ku Feqiyê Teyran e, di berhema xwe ya “Beyta Zembîlfiroş” de vê yekê wiha tîne ziman:

Zembîlfiroş lawê rewal e
B kulfet û ehl û 'eyal e
'Husna Yûsivî li bal e
'Heq rizayê qîsmetê

Bi vê çarînê Teyran xwestiye ku xweşikî û qeşengiya Zembîlfiroş bîne ziman û tiştê ku xweşikiya wî bide şênberkirin jî xweşikiya Yûsif dîtiye. Bi risteya “Husna Yûsivî li bal e” Teyran rasterast dibêje ku husneke, xweşikiyeke Yûsifî li ser Seîd ango Zembîlfiroş bûye. Bi vê yekê jî em dikarin bibêjin ku hevbeşiyê ku serpêhatiya Yûsif û Zembîlfiroş nêzî hev dike xweşikiya her du lehengan e.

1.2.2. Serdema Evînê: Di çîroka Zembîlfiroş de dema ku Gulxatûn evîndarê Seîd dibe serdema wî ya derwêşiyê ye. Bi heman awayî di serpêhatiya Yûsif û Zelîxayê de jî dema ku Zelîxa evîndarê Yûsif dibe, Yûsif hîn nebûye Mîr û bendeyek e ku tê firoştin. Tê dîtin ku di der du çîrokan de jî serdema evînê dişibin hev.

139. Zembîlfiroş, Pale, hejmar: 3, r. 24, 1979. vgz. Rohat Alakom, h.b.

1.2.3. Mîrbûn: Di qiseya Yûsif û Zelîxayê de piştî ku Yûsif xewna Mîrê Misrê şîrove dike û dibe wezîr, piştî mirina Mîr li ser text rûdinê û dibe Mîrê Misrê. Bi heman awayî di serpêhatiya Zembîlfiroş de jî di destpêkê de Seîd kurê Mîr e û dê piştî bavê xwe bibe Mîr; lê belê ji ber ku piştî xewn û bûyereke veşartina miriyekî, dinya li ber çavê Seîd reş dibe û dest ji her tiştên dinyayê berdide û wekî derwêşek dijî. Piştî evîna Zelîxayê, çawa ku peyre Yûsif dibe Mîrê Misrê, bi heman awayî piştî evîna Gulxatûnê Seîd jî li Kurdistanê dibe Mîr. Mîrbûna Zembîlfiroş di berhemên nivîskarên me de jî hatiye vegotin. Di berhema Mûradxanê Bayezîdî ya bi navê “Çîroka Zembîlfiroş” de Mîrbûna Zembîlfiroş bi vî awayî hatiye vegotin:

Bend: 126

Zembîlfiroş bo hakim e
Zor adil û zor alim e
Nehêla zulma zalime
Şev derwêş û paşa bi roj

Bend: 127

Hukim gêra dirêj zeman
Wî xizmet kir zor bi eman
Mirin bi kez nodet peyman
Hemû vêkra dê biçin cihek xwoş

Wekî ku di van çarînan de jî tê dîtin. Zembîlfiroş piştî evîna Gulxatûnê li ser textê bavê xwe dibe Mîr û bi salên dirêj bi edalet welatê xwe bi rê ve dibe. Ev yek jî dide nîşandan ku hevbeşiyek li ber çav ku Zembîlfiroş û Yûsif dişibînin hev mîrbûna her du lehengan e.

1.2.4. Xweparastina ji gunehan: Di qiseya Yûsif û Zelîxa de dema ku Zelîxa di qesrê de dixwaze ku ji Yûsif mirad bistîne û xweziyên xwe bîne cî, Yûsif li hemberî wê dertê û li gorî ku di Quranê de derbas dibe, wiha bersiva wê dide: “Ew pîreka ku Yûsif li mala wê dima, daxwaz ji Yûsif kir ku dest biavêjê. Derî hemî girtin û jê re got: “De haydê pêş ve were!” Yûsuf jê re got: “Ji tiştê ku tu ji min dixwazî, ez xwe bi Xwedê

diparêzim. Bi rastî jî malxweyê te xwediyê min e, qedrê min rind girtiye, ez nikarim bi xiyaretê li namûsa wî binêrim. Bi rastî jî Xwedê, xayin û sitemkaran bi ser naxe.”¹⁴⁰

Ji van gotinên Yûsif tê dîtîn ku xwe ji gunehan dûr digire û daxwaza Zelîxa bi awayekî tund red dike. Di serpêhatiya Zembîlfiroş de jî Gulxatûn bi dek û dolaban Zembîlfiroş tîne qesrê û bi destê Dergevan deriyan li serê dide radan. Piştî ku Zembîlfiroş dike dafîka xwe, îca dixwaze ku jê mirad bistîne û bi Zembîlfiroş şa bibe. Di vê rewşê de Zembîlfiroş li hemberî wê dertê û naxwaze bi awayê Gulxatûnê bike. Nivîskarên ku Zembîlfiroş derbasî nivîsê kirine jî behsa vê yekê dikin. Di berhema Feqiyê Teyran de jî û di ya Mûradxanê Bayezîdî de jî Seîd xwe dispêre Xwedê û daxwaza Gulxatûnê red dike. Wekî mînak di berhema Feqiyê Teyran de daxwaza Gulxatûnê û bersiva Seîd wiha hatiye vegotin:

Bend: 25

Xatûn dibê çare tu nîne
Şerm meke were nivîn e
Min bi te daye evîn e
Da bibînim j' te lezetê

Bend: 26

Law dibê tirsim j' Cebârî
Du 'heram bêne diyarî
Agirek wê l' me bibarî
Ez û tu bikin tewbetê

Bend: 31

Kiç dibê lawê rewal e
Er te 'hacet zêr û mal e
Çî te xwest min kir 'helal e
Bes bigir vê 'hucetê

Bend: 32

140. *Wergera Qurana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûretê Yûsif 12/23, wer. Mela Huseynê Êsî, Mela Se'îd Girdarî, Mela Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Bang, Îstanbul, 2008, r. 238.

Law dibê, ez ney exîr im
Zêr û mal çi b xwe nedîr im
Ji tirsê heq newêrim
Dest beme hilaketê

Ji van bendan jî aşekere ye ku Seîd ji ber tirsê gunehan xwe dispêre Xwedê û xwe ji Gulxatûnê diparêze. Dîsa di gelek ciyan de Seîd gazî û hewara xwe dibe ji Xwedê re û jê alîkarî dixwaze. Wekî mînak:

Bend: 40
Fetah tu yî miftah bi dest
Tu xaliqê herçî ku hest
Yek car bi te min pişt dibest
Da min nedî hilaketê

Bi heman awayî di berhema Mûradxanê Bayezîdî de jî ev mijar derbas dibe. Em ji ya Bayezîdî jî çend mînak bidin:

Bend: 60
Xatûn dibêjît ey feqîr
Were razê li textê mîr
Qiyametê bike ji bîr
Li dev min xwo veke ev roja xwoş

Bend: 61
Law dibê Xatûn xwoş merhemet î
Agirê Xwedê bi canê te ketî
Qiyameta li du pey me tî
Ez lew nakem xiyametê

Bend: 62
Heta xwo di ‘erdî rakem
Xiyametê li kes nakem
Dilê Xwedê ji xwe nakem
Bo xatira rojeka xwoş

Zembîlfiroş di van risteyan de jî tirsaxwe ya ji gunehan û xwesipartina Xwedê tîne ziman û wekî ku Yûsif behsa xiyametê kiribû, Seîd jî dibêje: “Ez lew nakem xiyametê”. Mirov dikare bibêje ku di her du çîrokan de jî xweparastina ji gunehan ya Yûsif û Seîd hevbeşiyek ji çîrokên wan e.



2. HEVBEŞIYÊN ZEMBÎLFIROŞ Û ÎBRAHÎMÊ KURÊ EDHEM

Yek ji çîrokên rojhilat ku hevbeşiyên wê û Zembîlfiroş hene, serpêhatiya Îbrahîmê Kurê Ethem e. Çîroka Îbrahîmê Kurê Edhem wiha ye:

“Bûyer li Belxê diqewime. Wekî ku di beşên beriya niha de me diyar kiribû, evîneke bi nav û deng ya Edhem û Huma di navbera salên 714 û 779ê zayînî de li Belxê diqewime. Edhem û Huma digihîjin hev, dizewicin û ji wan kurek bi navê Îbrahîm çêdibe. Piştî ku Îbrahîm mezin dibe û Mîrê Belxê ku bavê Huma ye dimire, Îbrahîm li ser textê bapîrê xwe rûdinê û dibe Mîrê Belxê. Îbrahîm bi qasî heft salan bi edalet dewletê bi rê ve dibe. Rojekê dertê nêçîrê. Dibîne ku camêrek dest û lingên wî girêdayî ne û qijakek jî bi nikul û pençikên xwe jê re avê û xwarinê dibe û wî xwedî dike. Îbrahîm li hemberî wê rewşa li ber çavê xwe heyirî dimîne û nêzî camêrê girêdayî dibe û jê sedemê girêdana wî dipirse. Ew zat jî dibêje ku serekarwanekî bûye, ji aliyê rêbiran ve karwana wî hatiye talankirin û hemû mirovên wî hatine kuştin. Li hemberî vê bersivê Îbrahîm jî nefis û qiyas dike û dinya li ber çavên wî reş dibe. Peyre dest ji tac û textê xwe dikêşîne û biryar dide ku dê wekî derwêşek bijî û di jiyana xwe ya mayî de wekî derwêşek dijî.”¹⁴¹

Wekî ku tê dîtin Îbrahîmê Kurê Edhem Mîr e û li hemberî bûyerekê dinya li ber çavên wî reş dibe û dev ji mîrîtiyê berdide û dixwaze ku bibe derwêş. Bi heman awayî dema ku mirov li serpêhatiya Zembîlfiroş dinêre, mirov dibîne ku Seîd jî kurê Mîr e û ew bi xwe jî şahzade ye û berendamê mîrbûnê ye. Lê belê Seîd jî wekî Îbrahîmê Kurê Edhem dev ji şahzade û mîrbûnê berdide û dixwaze bibe derwêşek û wisa bijî. Bêguman wekî Îbrahîm, Seîd jî piştî hin bûyeran biryara vê yekê dide. Bûyerên ku di serî re derbas dibin, di berhema Mûradxanê Bayezîdî de bi awayekî berfireh hatiye vegotin. Wekî mînak:

Bend: 3

Şevêkî şeva îne bû

Xewnek ecaêb dîtîbû

Li nav xew da girîbû

141. Numan Kulekçi, *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999, r. 339.

Dil û hinav lê hate coş

Bend: 4

Jina wî lê kir pirsyar

Bo çi digirî tu ey nazdar

Ji ber çi ev tirs û hawar

Ji ber çi rabûyî mendehoş

Bend: 5

Şahzade dibêjit nazenîn

Min dî xewnek xwoş û şîrîn

Qesr û qusur hemî zêrîn

Tu li nav da horî perdopoş

Bend: 6

Li xew hatim bême qesran

Ez û tu pêk ve bikeyn seyran

Li min horî bû dergevan

Lew ez hişyar bûm mendehoş

Bend: 7

Go derkeve tu neyê pêş

Here li dinê bibe derwêş

Nehêle qet roj û nivêj

Bibe feqîrek xirqepoş

Bend: 8

Nehêle qet dilê feqîr

Hişyar be lê nebiye mîr

Xwo neêxiye qeyd û zincîr

Li qiyameta teng û nexwoş

Bend: 9

Tu dizanî mirin heye

Ev qesr û baxe bo te ye
Mulê dunê bê fayde ye
Çakî bike bo cihê xwoş

Tê dîtin ku Zembîlfiroş destpêka biryara derwêşbûnê bi vê xewnê dide. Lê belê peyre ji bo xatirê dê û bavê xwe dev ji vê biryara xwe berdide û li ser daxwaza wan derdikeve nêçîr û seyranê. Di maweya nêçîr û seyranê de bûyereke din dijî ku êdî bi temamî biryara derwêşbûnê dide. Bûyera ku tê serê Zembîlfiroş, Bayezîdî wiha vedibêje:

Bend: 25

Binêrine hukmê Xwedê
Suwar bû ew biçîte keyfê
Miriye dî li nav darbeytê
Li ser milan diben bo qebrê

Bend: 26

Pirsyar kir ev miriye kî ye?
Gotinê kurê walî ye
Cehêl bû xurt û cundî ye
Vê subê bêderd miriye

Bend: 27

Şahzade li hespê peya bû
Daremeyt li ser mila dana bû
Heta qebran helîna bû
Ji çavan rêt rondikên boş

Bend: 28

Meyt helîna heta qebran
Ji bîr wî çû keyf û seyran
Nêçîr û kuştina teyran
Ketibû halekê pir nexwoş

Bend: 29

Çav bi qebrî kûr ketiye
Gorxaniyek teng wî dîtiye
Herdem dikete qêrîye
Şêt û şeyda mende hoş

Bend: 30

Zembîlfiroş kurê mîr e
Çûbû ser qebrekî kûr e
Bira mirnê hate bîr e
Çû halê dilteng û nexwoş

Bend: 31

Çû mal û gote babê ye
Min navê malê dunê ye
Debim ‘ebdalê Xwedê ye
Ez dibima selfiroş

Piştî vê bûyerê êdî Zembîlfiroş qerarê derwêşbûnê dide û li gotina dê û bav jî nanêre êdî. Peyre bi kom û kulfetê xwe re ji qesrê dertê û jiyanekê derwêşî dijî heta ku bi evîna Gulxatûnê re rû bi rû dimîne. Wekî ku xuya ye Îbrahîmê Kurê Ethem û Seîd li ber çavên xwe heman tiştî dibînin û ew tişt dike ku heman biryarî bidin û dest ji dinyayê bikişînin û bibin derwêşek û wisa bijîn.

ENCAM

Di encama vê xebatê de kêr zêde em dikarin bibêjin ku agahiyek berfireh li ser serpêhatiya Zembîlfiroş derket holê. Ji aliyê naverok û teybetmendiyên xwe ve, mirov dikare bibêje ku çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê ji wan çîrokên eşqê yên mîna Yûsif û Zelîxa, Ferhad û Şîrîn, Leyla û Mecnûn û hwd. kêmtir nîn e. Ji ber ku Feqiyê Teyran û Mûradxanê Bayezîdî bi şiklê nezmê ev serpêhatî dane ber destê me, divê em xwe gelek bi siûd bibînin. Lewre berhemên her du gorbihîştan, ji bo wêjeya kurdî ya klasîk gelek granbiha ne û divê ji bo xebatên ku bi vî rengî hatine kirin û heta niha nehatine dîtin, xebatên zanistî bêne meşandin.

Di beşa yekem de em bi awayekî berfireh li ser mijara destanê sekinîn. Bi van agahiyan me hewl da ku xwendevanek dema ku ji vê xebatê sûd werbigire, li ser mijara destanê bikaribe hemû agahiyên cihanî bigire. Ez bawer dikim ku dê xwendevanên kurd jê îstifade bikin û di çarçoveya wan agahiyan de li destanên kurdî binêrin.

Bi beşa duyem, me gelek çîrokên evînê yên wêjeya rojava û rojhilat da nasîn. Ji Yûsif û Zelîxayê heta Leyla û Mecnûn; ji Mark Antony Kaleopatra heta Napolyon û Josephine gelek çîrokên evînê û taybetmendiyên wan hatin dayîn. Di vê beşê de çîroka Yûsif û Zelîxa bi berfirehî hat dayîn û di encama vê xebatê de hat dîtin ku gelek hevbeşiyên Yûsif û Zelîfa û çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê hene. Di beşa çarem de em li ser van hevbeşiyên navborî sekinîn. Her wiha beşa sêyem ji aliyê lêkolîn û lêgerîna li ser her sê guhertoyê me, gelek encamên balkêş derxistin holê. Di vê beşê de me çîroka Zembîlfiroş da naskirin, her wiha em têgihîştin ku di guhertoyên Zembîlfiroş û Gulxatûnê de gelek nasnav ji bo her du lehengên çîrokê yên sereke hatine bikaranîn û me ev nasnav bi awayekî tablo da nîşandan ku xwendevan bi hêsanî berawirdkirina her sê guhertoyan bikin. Dîsa di encama lêgerîna pirtûkên dîrokê de em gihîştin agahiyên berfireh ku Mîr Se'îd û Mîr Hesên bi me dan naskirin. Dema ku mirov li vê rêza Mîrên Merwaniyan dinêre, ji aliyê lehengê çîroka me û bavê wî ve hin agahiyan dide mirov:

1. Zayînî 956-989: Mîr Baz Ebû Şuca b. Dostik (Avakarê Dewleta Merwaniyan)

2. Zayînî 989-997: Mîr Ebû Elî Hesên (Biraziyê Baz)

3. Zayînî 997-1010: Mîr Ebû Se'îd el-Mensûr Mumehhîdud-Dewle (Birayê Mîr Ebû Elî Hesên e.)

4. Zayînî 110-1061: Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan (Mîr Hesên)

5. Zayînî 1062-1079: Mîr Nîzameddîn (Li Diyarbekir birayê wî Mîr Seîd mîr e. Her du jî kurên Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan in.)

6. Zayînî: 1080-1085: Mîr Ebû Mûzaffer Mensûr (Kurê Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan e)

Wekî ku tê dîtîn di du serdeman de Mîr Se'îd û Mîr Hesên hene. Di serdema pêşî de ku navbera salên 989-110an di hundirîne, lê belê Mîr Hesên û Mîr Se'îdên ku li pey hev mîrîti kirine, di çavkaniyan de wekî bira hatine dayîn. Di serdema duyem de ku navbera salên 110-1079an di hundirîne, li vir Mîr Hesên wekî bavê Mîr Se'îd tê dîtîn. Ev yek zêdetir li gorî rastiya çîroka me ye. Heke ev rast be, Zembîlfiroş di navbera salên borî de li Diyarbekir Mîrîti kiriye û bi navê Mîr Se'îdê Kurê Mîr Hesên Ibn Nasr ed-Dewle Ehmed Ibn Merwan di çavkaniyan de cî girtiye. Her wiha di vê beşê de li ser peygam, raman û mijara guhertoyên çîrokê ve agahî hatin dayîn û ji mînakên guhertoyan ev yek hatin piştrastkirin. Dîsa ji aliyê war û serdema qewimîna çîrokê ve em gihîştine agahiyên teqez ku ev yek gelek tiştan li ber lêkolînerên kurd ronî dike. Çi bûn ev tişt? War û serdema bûyerê 994ê zayînî ye û di serdema Merwaniyan de li Farqînê qewimiye. Her wiha lehengên çîrokê û şibînên wan ên lehengên çîrokên din gelek balkêş in. Wekî mînak di çîroka Yûsif Zelîxayê de gelek şibînên Yûsif û Se'îd hene ku hinek ji wan ev bûn: mîrbûna her duyan, xweparastina ji gunehan, xwesipartina Xwedê, xweşikiya wan û serdema evînê ya ku pê re rû bi rû dimînin. Dîsa di serpêhatiya Îbrahîmê Edhem de hinek taybetmendiyên wî hene ku gelek dişibe rewşa Zembîlfiroş ku ew jî ji nav hebûna malê dinê û mîrtiyê, çûndina ber bi dewrêşbûnê ve ye. Ev xebat dilopek e ji serpêhatiya çîrokên evînê yên kurdî, berhemên wekî Zembîlfiroş û hîn gelek destanên evînê yên kurdî, li benda lêkolînên û lêgerînên berfireh in.

ÇAVKANÎ

- A.S., Levend: *Hamdînin Yusuf u Züleyhası*, Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten, Ankara, 1969
- Adeline Gueber, Hélène: *Destanlar Kitabı*, wer. Suat Başar Çağlan, İlya İzmir Yayınevi, İzmir, 2010
- Alakom, Rohat: “*Silîva: Bajarê Ku Heft Car Xerab û Heft Car Ava Bûye*”, Bîr, j.1., Bihar, 2005
- Alakom, Rohat: *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, Nûdem, Stockholm, 1994
- Aleksander Jaba, *Çîrokên Kurmancî*, amadekar. Cankurt, Weşanxana Çand Nûjen, Stockholm, 2000
- Aras, Ahmet: *Sîyabend û Xecê*, Ülkem Kitapevi, İzmir, 1993
- Aristoteles: *Poietika(şîir sanatı üzerine)*, wer. Nazile Kalaycı, Bilim ve Sanat Yayınları, Ankara, 2005
- Ballade Kurde resueillie et traduite par M. A. Jaba et communiquée par M. de Tchinateff. *Journal Asiatique*, Paris, 1869, Tome XIV
- Bayezîdî, Mûradxan: “*Çîroka Zembîlfiroş*”, amd. M.Xalid Sadînî, Kovara Nûbiharê, hejmar 87-88, Stenbol 2002, r. 13-29.
- Beyazîdî, Mirat-Xanê: *Çîrokî Zembîlfiroş*, Çapxaney Hewlêr, 1967
- Bedlîsî, Şerefhanê: *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, wer. Ziya Avci, Weşanên Avesta, Stenbol, 2007
- Blau, Joyce: *Jiyan û berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)*, Çira, Stockholm, 1997
- Celil, Ordîxanê: *Kürt Kahrmanlık Destanı Dımdım*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2001
- Cewerî, F.: Hawar, *Weşanên Nûdem*, Stockholm, 1998
- Cewerî, Firat: *Antolojiya Çîrokên Kurdî*, berg/cîld I, Weşanên Nûdem, Stenbol, 2003
- Cindî, *Heciyê & Evdal*, *Emînê*: Folklorê Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008
- Ciwan, Mûrad: *Ahmedê Xanî -jiyan berhem û bîr û baweriyên wî-*, Weşana Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Stocholm, 1997
- Dêreşî, Seîd: *Dîwana Feqiyê Teyran*, Weşanên Lîs, Amed, 2011
- Dêreşî, Seîd: *Jîna Feqiyê Teyran*, Kovara Pêl, Hejmar 2, sal 2003, r. 64-78, Weşanên Navenda Havîbûnê ya Lêkolîn û Weşanên Kurdî Li Berlînê

- Develioğlu, Ferit: *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitapevi Yayınları, Ankara, 2010
- Doskî, Tehsîn İbrahîm: *Yûsif û Zuleyxa Vehandina Selîmê Hîzanî*, Weşanên Spîrêz, Duhok, 2004
- Ekmen, Mehmet: *Siyamend-i Silivî (Silvanî) ve Haceyin Aşk Öyküsü*, Eyvan, j.5., 1989
- Farqînî, Zana: *Ferhenga Tirkî-Kurdî*, Weşanxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2004
- Farqînî, Zana: *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Weşanxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000
- Hacanî, Hazim: *Sefehatun Min Tarîxi 'l-Kurd we Kurdistan*, Hewlêr, 2002
- Helimoğlu Yavuz, Muhsine: *Diyarbakır Efsaneleri II ve Diyarbakır Üzerine Sekiz Bildiri*, Ankara, 1990
- İsmail Çetışli, *Metin Tahlillerine Giriş /I Şiir*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010
- Kolcu, Ali İhsan: *Batı Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara 2003
- Komisyon: *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009
- Külekçi, Numan: *Mesnevi Edebiyatı Antolojisi*, Aktif Yayınevi, Erzurum, 1999
- Kurdo, Qanadê: *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed, 2009
- M.S. Lazarev, Ş.X. Mihoyan, E.İ. Vasilyeva, M.A. Gasratyan, O.İ. Jigalina: *Kürdistan Tarihi*, çev. İbrahim Kale, Avesta Yayınları, İstanbul, 2007, r. 63.
- Macit, Muhsin: Soldan, Uğur: *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, Grafiker Yayınları, Ankara, 2008
- Mengi, Mine: *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2009
- Mihoyê Mecîd, *Ji Folklorê Me*, hejmar: 2/1993.
- Musaelyan, J. S.: *Zembîlfiroş-Kurdskeya Poema i ee Folkornie Versii (Zembîlfiroş-Poema Kurdî û Şaxên Wê Yê Folklorîk)*, Moskova, 1983
- Orbelî, Î. A.: *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane*, amd. Sînan Hakan, wer. Têmûrê Xelîl, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2011
- Örskaya, İlyas: *Edebiyat Bilgileri*, Final Yayıncılık, İstanbul, 2006
- P. Jackson, Danny: *Gilgamiş Destanı*, wer. Ahmet Antmen, Arkadaş Yayınevi, Ankara, 2005
- Rirênî, Wesfî Hesen: *Beyta Zembîlfiroş, Dîrok Wargeh Çendîn Deq*, Weşanên Sipîrêz, Hewlêr, 2008

- Ripper, Thomas: *Diyarbekir Mervanileri İslami Ortaçağda Bir Kürt Hanedanı*, çev. Bahar Şahin Fırat, Weşanên Avesta, Stenbol, 2012
- Rudenko, M. B.: *Şaxên Poema Kurdî Ûsif û Zelêxe Yên Edebi û Folklorîk*
- Sadinî, M.Xalid: *Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011
- Sâmi Banarlı, Nihad: *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Millî Eğitim Basımevi, İstanbul, 1998
- Sîyahpoş: *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*, ber. Bedirxan Amedî, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2006
- Wergera *Qurana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, amd. Mela Huseynê Êsî, Mela Se'îd Girdarî, Mela Muhammed Bêrkevanî, Weşanên Bang, İstanbul, 2008
- Xeznedar, Duktur Marif: *Mêjûy Edebi Kurdî*, Bergî Duwem, Sedekanî çîwardem-hejdem, Dezgay Çap û Bilawkirdinewey Aram, Hewlêr, 2010
- Yıldırım, Kadri: *Di Wêjeya Kurdî Ya Klasîk De "Zenbîlfiroş"*, berhema neçapkirî.
- Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2010
- Yıldırım, Kadri: *Klasik Kürt Edebiyatında "Yûsuf û Zuleyxa"*, berhema neçapkirî.
- Yıldırım, Kadri: *Melayê Bateyî (1675-1760)*, berhema neçapkirî.
- Yıldırım, Kadri: *Nûbehara Biçûkan Ehmedê Xanî Külliyyatı*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008
- Zekî Beg, Mihemed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Ziya Avcı, Weşanên Avesta, Stenbol, 2002
- Zeki Beg, Muhammed Emin: *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, çev. Vahdettin İnce Mehmet Dağ Reşat Adak Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2011
- Zembîlfiroş I-II*, Pale, hejmar: 3-4, Uppsala, Swêd, 1979

PÊVEK: GUHERTOYÊN DESTANA ZEMBÎLFIROŞ Û GULXATÛNÊ

1. Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran¹⁴²

BEYTA ZEMBÎLFIROŞ

1.

Dê dê hilon dîsan bi coş
Carek ji carê mey binoş
Bêjim qisa Zembîlfiroş
Da seh bikîn 'hîkayetê

2.

Zembîlfiroş lawê rewal e
B kulfet û ehl û 'eyal e
'Husna Yûsivî li bal e
'Heq rizayê qismetê

3.

Zembîlfiroş lawê feqîr e
D sinetê xo da esîr e
Daîma yê 'Heq li bîr e
Rast bkerestê sinetê

4

Kerestê sinet 'tebeq bû
Daîma ê rast û 'heq bû
Qîmeta selka wereq bû
Pê didêrit kulfetê

5.

142. Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Weşanxaneya Lîs, Diyarbekir, 2011, r.189-217.

Kulfetê qismet li wî bû
Zêr û mal çu b xwe nedîbû
Qîmeta selkan b lepî bû
Her bi dest meşxeletê

6.

Her bi dest zembîl dibesta
Dbirne bazarî ji qesta
Xwarinek pê dhate desta
Razî bû b wê qîmetê

7.

Rojekê selkan ku tîne
Xatûnek jorda dibîne
Bi dil û can dihebîne
Ketye benda mehbetê

8.

Mehbetê kiç mubtela kir
Sirr li çarya aşkira kir
Lawikî qelbim cuda kir
Min ji 'îşqan xew netê

9.

Ew letîfa reşxumar e
Cariyek jor da hinare
Tu herre bêje bi zar e
Bîne ser meslehetê

10.

Cariya d xewfa Xudê ne
Ew bi vê lehbê di têne
Mîr ji te Selik divêne

Lê digêrin 'hîletê

11.

Tu çêke selkêd-i çak e
Bîne dergahî beha ke
Mîr 'heqê te dê eda ke
Şuxleke xêra te tê

12.

Selik birin bi jor hinare
Dît Cariyek hate xar e
Mîr ji te divê dîdar e
Da tu bêjî qîmetê

14.

Law dibêjitma we nîne
Qîmeta selkan çu nîne
Hindî pê bdet bo min bîne
Razî me b wê qîmetê

15.

Carî dbêjit qîmetê be
Law nizanit pend û lêb e
Çûne bal mîran 'hisêb e
Ew nizanit 'haletê

16.

Law bi wê lêbê nizanî
Bê fikir ew çûye banî
Derge dada Dergevanî
Çi bela bû law ketê

17.

Wî ku dî der pêvedav e

'Xeyriye lê reng û çav e
Go: Yeqîn ev, 'hîl e dav e
Ez dê bînim zehmetê

18.

Weqtê bihîstî ew xeber
Rondik ji çava têne der
Barîn li ser rûyêd wezer
Girya me jbo 'halê xwe tê

19.

Cariya pirr lêb û pend e
Law bi bal mîran vexwende
Dî şepalek leb ji qend e
Qet kes nedabû wesfetê

20.

Lawikê rastî v Xudê ra
Ber ji vî rengî digêra
Min ji te nevê çu zêra
Min xilas ke j zehmetê

21.

Van çoxela v ber te dikim
Te têk ra sor û zer dikim
Misk û 'emberî mawer dikim
Tu bes bigir vê 'huccetê

22.

Ev çox ji bo min çêtir in
Hindî ku leş pê bsitirin
Padşahî ew qebûl kirin
Da biçme nîva Hêşetê

23.

Kiç dibê, lawê biyanî
Lew dibêm da tu bizanî
Min ji bûya dil tu anî
Da bibînîn 'heşmetê

24.

Law ji Xatûnê dibêt e
Tu mexaz ya dil divêt e
Da ji 'heq nebin fîhêt e
Rûspî bin qiyametê

25.

Xatûn dibê çare tu nîne
Şerm meke were nivîn e
Min bi te daye evîn e
Da bbînim j te lezetê

26.

Law dibê tirsim j Cebârî
Du 'heram bêne diyarî
Agirek wê l me bibarî
Ez û tu bkin tewbetê

27.

Kiç dibê bavê xeyalan
Were nêv doşek û palan
Bên bike zilfan û xalan
Dûr e roja axretê

28.

Law dibê ya bisk 'herîr e
Ew di pêroz bin li Mîr e
Çi 'heddê lawê feqîr e

Dest bete vê suhbetê

29.

Kiç dibê lawê verêvan
Were nav reyhan û sêvan
Şekirê bimêj bi lêvan
Şibhî cama şerbetê

30.

Law dibê qenca temamê
Ser û bejin l min 'heramê
Her wekî xemra di camê
Tirsim ji meniya ayetê

31.

Kiç dibê lawê rewal e
Er te 'hacet zêr û mal e
Çî te xwest min kir 'helal e
Bes bigir vê 'huccetê

32.

Law dibê, ez ney exîr im
Zêr û mal çî b xwe nedîr im
Ji tirsê 'heq newêrim
Dest beme hilaketê

33.

Kiç dibê, lawê ras ne
Mîr li Kirmancan qiyas ne
Te ji destê min xilas ne
Hind bi te ddim muhbetê

34.

Lawî 'huccet girtî gavê

Dê tehareî kem bi avê
Ew nizanît dê xo avê
Dûr e jî vê qebahetê

35.

Ew şepala şox û mest e
Wê dema law av dixweste
Mesîn hilgirt dave dest e
Ji bo te bikim xizmetê

36.

Law bi derket jî menzelê
Diçûye ser banê Kelê
Qet çar nebû tê da helê
Mabû di fikr û heybetê

37.

Dema ku dî dil ker kirî
Dil şewitî ew pirr girî
Rû da û evraz fikirî
Bang kire Şahê Qudretê

38.

Bang kire Padîşahê *Mubîn*
Go: *Ya delîlê 'haîrîn*
Tu şad dikî qelbê 'hezîn
Xilas dikî jî zehmetê

39.

Ya xaliqê rehmet kesîr
Ya 'alimê b qelb û zemîr
'Hemî sirran tuy pê xebîr
Fettahê babê şefqetê

40.

Fetah tu yî miftah bi dest
Tu xaliqê herçî ku hest
Yek car bi te min pişt dibest
Da min nedî hilaketê

41.

Cercîs bi mişaran birrî
Eyûb wekî kirman dirrî
Yûsif wekî 'ebdan kirrî
Te îna ser seltenetê

42.

Wan Îbrahîm avête nar
Pêt û pereng lê bûne sar
Xudê *berate* j bo hinar
Te xelas kir ji zehmetê

43.

Mûsa di nêv behra 'emîq
Lê vekirin dwazde terîq
Firewn di nêv maye 'xerîq
Te da cezayê şirketê

44.

Yûnis 'Hûtî dabeliand
Koh û weslek jê nexeland
Înaye dinya wekiland
Min sidq bawer bi te tê

45.

Bawer bikin vê gotinê
Tûfan ku hat girte dinê
Nûh û Gemî man bi tinê

Tuy xaliqê vê heyetê

46.

Deşt û Çiya têk bûn behir
Wan 'asiyû xelqê xwehir
Cumle di nêv mane qehir
Tuy xaliqê wehdanetê

47.

Ew Îbrahîm avête nar
Pêht û pereng lê bûne sar
Fîlhal nedî jî bo hinar
Xilas diken ji zehmetê

48.

Te xilas kirin ew 'hemî
Dzanim ku tu ne naîm î
Ez dê xwe bavêm vî demî
'Hewl û qudret ji bal te tê

49.

Lawê rast e bi cebbar e
Dil yek e nabe du par e
Xwe j Burcê avête xwar e
Zû hate nêva Hêşetê

50.

Cibraîl e çistê sivik
Dojê hewa gehişte nik
Ciwan deyna erdî sivik
Vê ra diket 'inayetê

51.

Cibraîl e çîtê çelek

Jor da firrî j her heft felek
Law li hewa girtî gelek
Vêrra dida îanetê

52.

Cibraîl hatî ji kerem
Law li hewa girt bi şerim
Dayne ser 'erdî bi nerim
J wîrra dikit 'inayetê

53.

Lawê rastê pirr wicûd e
Ewî ser bir bi sicûd e
Şukir kir ji bo wedûd e
Te xilas kir ji zehmetê

54.

Şukr û minnet ew law dixwest
Dîsan bi mal rabû bi qest
Mîrî Selik standin ji dest
Kêşa birîn bi zulmetê

55.

Jinê hebû 'eqlek li dor
Herçî Selik standin bi zor
Me spare padşahê li jor
Eda bkit di qiyametê

56.

Jinê ku ew gotin kir e
Yeqîn ew mîr qani tir e
Welya Xudê çû 'hazir e
Tu 'alimê 'xeybaniyetê

57.

Jinê gotê, guh bidêre
Em agirek bikin lêre
Wekî duh û wekî pêr e
Betal nekin vê 'adetê

58.

Jinê 'aqil hebû li bal
Da agirî helkeyn li mal
Cîran nebin fîkr û xiyal
Me navê zadê şubhetê

59.

Jinê tenwîr hilkir sivik
Zadek nebû bavê kuçik
Derî girt û çûbû jinik
Mabûn di fîkr û heybetê

60.

Tenwîr pirr bû bi nan û aş
Derî girt û çûbûye paş
Xaliq j cem xwe qismet mias
Tenwîr sor bû ji nimetê

61.

Cîranekê wan hate ser
Agrek ji wan xwast bi xeber
Dema ku wan lê kir nezer
Tijî teamê cennetê

62.

Xêr da ewan ku bê 'hisab
Înane der nan û kebab
Şefqet li wan kir ey Wehab

Têr bûn ji zad û nimetê

63.

Er bi roj e er bi şev e
Taet bikin hûn bi xev e
Herçî rast e ceza ev e
Da hûn nebin ji axretê

64.

Ya Mihemmed 'xemxwarê Ummetê
Herçî ji min bawer netê
Ne musteheqî şefaetê
Mexrec dûr e roja axretê

65.

Ey Mîm û 'Hê xweş defter e
Herçî ji min ne bawer e
Ne j Ummeta Pêxember e
Ne laîqê şefaetê

2. Zembîlfiroşa Melayê Bateyî:¹⁴³

2.1. Berhevoka Albert Sosin:

1.

Ey dil werin dîsan bi coş
Carek ji caran mey binoş
Bikin qissa Zenbîlfiroş
Da seh bikin hîkayetê

2.

Zenbîlfiroş lawikê rewal bû
Bi kilfet ehl û 'eyal bû
Husnekî Êsif li bal bû
Heq rizaqê qismetê

3.

Qewîn ew lawê feqîr bû
Dayme Xwedê di bîr bû
Pêşê Xweda jêr bû
Ew bi dest hebû senetê

4.

Şixulê wî selik û tebeq bû
Qîmeta selikan wereq bû
Dayma ew rast heq bû
Pê debirî kilfetê

5.

Ew bi dest zenbîl bidest
Dibirê bazarê bi qest
Xwarin nan dihat bi dest

143. Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanxaneya Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 85-91.

Razî dibî qismetê

6.

Her dema selkan ku tîne
Xatûnek jor da dibîne
Bi dil û can dihebîne
Dil kete pêla mehbetê

7.

Mehbetê keç mubtela kir
Sir ji cariya aşkera kir
Lawukî qelbim cuda kir
Min ji eşqa xew netê

8.

Law rast bû bi Xwedê ra
Pirr ji wê qenca dikêra
Go min ji te navê tu zêra
Tu min xilaskî ji zehmetê

9.

Xatûn dibê ev xeber tunîne
Şerm meke were nav nivîne
Min bi te daye vîne
Da em bibînin heşmetê

10.

Law dibê, tirsim ji xeber e
Devherem e, têne riya re
Agirek bi wan da dibare
Narî cama şerbetê

11.

Xatûn dibê, tu lawê beyanî

Lew dibem da tu bizanî
Min tu ji bo dilê xwe anî
Da em bikin misilhetê

12.

Law bi xatûnê ra debêtê
Tu mixaziya dil devêtê
Dayîm ji heq nekin vehetê
Rûspiyîn di axretê

13.

Xatûn dibêje, bavêje xeyalan
Were ser doşek û palan
Bihn ke zulf û xalan
Law dibe zilfê herîr e

14.

Pîroz be lawê mîr e
Çi hed e lawê fewîr e
Tev bide vê misilhetê
Xatûn dibê lawê verêvan

15.

Were nav reyhan û sêvan
Tu şekir bimêj bi her du lêvan
Şibhê cama şerbetê
Law bidê tu qenca tamam î

16.

Her wekî şekir di camê
Bi ser û peyan tu li min heram î
Tirsim ji roja Axretê

2.2. Destnivîsa Qanadê Kurdo:

1.

Zembîlfiroş selikan dibe û tîne
Mal bi mal digerîne
Bejn û bala vî nûrîn e
Jin û bûkan ji îmanê dertîne

2.

Rojek hat roja bixîr
Zembîlfiroş kire tevdîr
Selik hildan, selikê di hejîr
Birin geriya li nav bajêr

3.

Kûçe kûçe dizivirî
Ber xanîkî ra bihirî
Jina mîr lê ninêrî
Huba wê ser da firî

4.

Ewê gazî cariya kir
Sur li ‘enyê aşkera kir
Got: Hûn carîng ê minê delal
Zû zû bikin herin ji mal
Lawek li jêrê herne bal
Bê: Jinê mîr te dixwaze dîndar

5.

Ew caringê keleş in
Zû zû ber jêr dimeşin
Şîrîn şîrîn dibêjin:
Zembîlfiroş, lawkê delal

Te sen'eta selkê di al
Hinek husnê Êsib li bal

.....

6.

-Hûn caringê husn û cemal
Min bihîstîye Mîri ne li mal
Selika bi kê ra bikim bazar?

7.

Zembîlfîroş çû bi der da
Gulxatûn rabû li ber da
Şekir barî ji dev û lêva
Zembîlfîroş got: "Way xatûna gerdenzêr
Cariya ez anîme vê derê
Selika bifîroşim naz û nederê

8.

Gulxatûnê got: "Tu ser sera her du çava
Bazar bazara min ûte va
Motaca te me bi dil û çava

9.

-Xatûna delal zendebazin
Tu ji min meke gazin
Jin ne layq e bike bazar
Xeber rast in tene ser zar
Selak bi kê ra bikim bazar?

10.

- Ya bi xêr te kir, lawikê nezan
Ez rast bêjim, tu bizan
Te xweş kir tu hatî vir

Tu hem şayî, hem şevbihêr
Ev e ji te ra bazar û xêr

11.

- Wey xatûna gerden zer tê,
Em xeber din ji cima'etê
Ew xeber ji estê min ra bê qeyde tê

12.

Zembîlfiroş, lawkê feqîr
Tevî bibe zilf û herîr
Rabe rûne li doşeka mîr
Gotina min ji te ra toq û zincîr

13.

- Xatûnê li min meke van henekan
Ew pê kenînê qîz û bûkan
Min berde herime sûkan
Bifiroşim van selikan
Pê bikirrim nanê zarokan

14.

- Lawiko, bes e bikî van giliyan
Ez ê bidime te memikê xumriyan
Li te wer kim çeka cindiyan
Te derxim ji tar û tengiyan
Guh mede Sofî û Suniyan

15.

Gul Xatûn vekir bişkokên di pêsirê
Memikan spî kir ne ji min ra
Ew çavkanî bûn bona mîran
Ew ne risqê me feqîran

.....

16.

Zembîlfiroş çûn reng û rû va
Lê şikestin ejnû û gav e
Tevizê da dil û hingav e
Got: “Li eslê min da eva nave.”

17.

- Lawikê nezan, tu çima şermîn î?
Silav bike van memikên zêrînî
Tu ê ji wan xêrê ji xwe ra bibînî
Te ez bi dil can va birim
Te nabînim, ez dimirim

18.

Rojên şayî diçin, derbas dibin
Gul digihîjin, diçilmisin
Tu kêf bike, kêfa mezin
Bira gunê te ji min bixwazin

19.

- Lawiko, were ser şekir û sêvan
Wan bimije bi dev û lêvan
Sîng û berê min ji te ra meydan
Li ser siwar be, bajo heyran

20.

- Weya xatûna aqiltemam
Tu şerbet bî, av li cam
Bedena te li min heram

3. Zembîlfiroşa Mûradxanê Bayezîdî:¹⁴⁴

ÇÎROKA ZEMBÎLFIROŞ

Ey meclîsa pirr zewq û xwoş
Guh bidene sohbetek xwoş
Dê keyn behsî Zembîlfiroş

1.
Zembîlfiroş kurê mîran e
Lawekî bejin ruhan e
Xwedanê koçk û dîwan e
Le keyf û seyran şev û roj

2.
Şev û roj keyf û xwoşî ye
Be îşq û reqs û şahî ye
Çu acizî di dil da niye
Ne dîtiye saetek nexwoş

3.
Şevêkî şeva îne bû
Xewnek ecaêb dîtîbû
Li nav xew da girîbû
Dil û hinav lê hate coş

4.
Jina wî lê kir pirsyar
Bo çi digirî tu ey nazdar

144. Mûradxan Bayezîdî, “Çîroka Zembîlfiroş”, Kovara Nûbiharê, hejmar 87-88, Stenbol 2002, r. 13, 29.

Ji ber çi ev tirs û hawar
Ji ber çi rabûyî mendehoş

5.

Şahzade dibêjit nazenîn
Min dî xewnek xwoş û şîrîn
Qesr û qusur hemî zêrîn
Tu li nav da horî perdopoş

6.

Li xew hatim bême qesran
Ez û tu pêk ve bikeyn seyran
Li min horî bû dergevan
Lew ez hişyar bûm mendehoş

7.

Go derkeve tu neyê pêş
Here li dinê bibe derwêş
Nehêle qet roj û nivêj
Bibe feqîrek xirqepoş

8.

Nehêle qet dilê feqîr
Hişyar be lê nebiye mîr
Xwo neêxiye qeyd û zincîr
Li qiyameta teng û nexwoş

9.

Tu dizanî mirin heye
Ev qesr û baxe bo te ye
Mulkê dunê bê fayde ye
Çakî bike bo cihê xwoş

10.

Min quriyek agir dîtiye
Li cehnemê derketiye
Canê min li xew da sotiye
Lew dergîrim ez şev û roj

11.

Li dunê dikeyn xirabiye
Zulm û zorî û hîzî ye
Nabînin rehma barî ye
Deçin cihek qewî nexwoş

12.

Jin dibêjît bibîya çavan
Ji dil berde xewf û tirsan
Bab hakimî heft îqlîman
Xwidan genc û ‘eskerek boş

13.

Rabe here keyf û seyran
Tu berde tûl û tajiyan
Bikuje ask û kiviyan
Keyfê bike bi dilekî xwoş

14.

Li dest te ‘esker sed hezar
Keyfê bike wekî her car
Dilê min te sot ey nazdar
Bi ‘acizî û dilê nexwoş

15.

Şahzade dibêjî ey hurmete
Li min meke van nesîhete
Ruha şîrîn emanet e
Dê çin gorek teng û nexwoş

16.

Ku li feqîran hukmî bikem
Li nav qebrî ez dê çikem?
Cewaba Xwedê ez dê kû dem?
Roja ‘alem lê mendehoş

17.

Nazenîn mîrî dibînît
Rondika xwinê dibarînît
Lez diket, dilezînît
Dayk û baban pê dihesînît

18.

Dibêjite dayika mîriye
Kure te xewnek dîtiye
Dunya li ber çavan sar biye
Digîritir ew şev û roj

19.

Rabe tu dayikê bilezîne
Babê wî tu pê bihesîne
Hekîm û cingiran bîne
Belê ney dîn e û ney nexwoş

20.

Digîrît ji tîrsa Xwedê ye
Ditîrsît ji ber xewfê ye
Dil nabet mulkê dinê ye
Qewî dilteng û bêhoş

21.

Dayik rabû dilezînît
Cewab bo padîşah digehînît

Wezîra li xwo dicemînît
Kurî qazî diket dibînît

22.

Dibêjîtê ey kurê min
Were runê li cihê min
Li ser xwe danê tacê min
Hukmî bike li milletê boş

23.

Were runê cihê babê
Hukmî bike li vî xelqê
Bistîne tu xerc û bacê
Dilê dijminan bisoj

24.

Ji paşî gotin û cewaban
Ji ber xatira dayik û baban
Suwar bû bo keyf û seyran
Bi dilekî qewî nexwoş

25.

Binêrine hukmê Xwedê
Suwar bû ew biçîte keyfê
Miriye dî li nav darbeytê
Li ser milan diben bo qebrê

26.

Pirsyar kir ev miriye kî ye?
Gotinê kurê walî ye
Cehêl bû xurt û cundî ye
Vê subê bêderd miriye

27.

Şahzade li hespê peya bû
Daremeyt li ser mila dana bû
Heta qebran helîna bû
Ji çavan rêr rondikên boş

28.

Meyt helîna heta qebran
Ji bîr wî çû keyf û seyran
Nêçîr û kuştina teyran
Ketibû halekê pir nexwoş

29.

Çav bi qebrî kûr ketiye
Gorxaniyek teng wî dîtiye
Herdem dikete qêrîye
Şêr û şeyda mendehoş

30.

Zembîlfiroş kurê mîr e
Çûbû ser qebrekî kûr e
Bira mirnê hate bîr e
Çû halê dilteng û nexwoş

31.

Çû mal û gote babê ye
Min navêt malê dunê ye
Debim ‘ebdalê Xwedê ye
Ez dibima selfîroş

32.

Baba aza ke gerdena min
Bide min ‘eyal û jin
Madame herheye mirin
Min navêt çu halê xwoş

33.

Babê bihîst û dizanî
Li lawikî diket qêrî
Be naxwoş digel axivtî
Bi acizî û qisey nexwoş

34.

Baba dibêjit ez bi Xwedê
Nadem te mindal û jinê
Bigirî wan li derî xelqê
Rus û bîrsî 'eyş û nexwoş

35.

Zembîlfiroş ma hîrî
Be herdu çavan diket girî
Bab hîvî dikem li men negirî
Bi serê te nakem amirî

36.

Hîvî dikem min aza ke
Eyal li min necuda ke
Ev riya min qewî çak e
Ew şol baş e ya dil pê xwoş

37.

Sondî dixwum bi enya babê
Narûnim ez li textê
Li kes nakem xedr û zulmetê
Dê bim feqîrek xirqepoş

38.

Li riya Xwedê dê bim ebdal
Sela dê bigêrim mal bi mal

Da xwo bikem rizqek helal
Pê bijînim jin û mindal

39.

Xelq û alem pîr û wezîr
Hemû vêk ra debêne mîr
Bila biçêt xwo biket jibîr
Da tam biket halî feqîr

40.

Mîrim bide destî jinê
Bila biçî bigerî li dinê
Îro naêt axivtinê
Zû dêtewe bi halek nexwoş

41.

Padîşa dibêjit jinka wî
Dî pê feqîr legel mêrî
Yan dê runî li ser textî
Xatûn li nav ev qesra xwoş

42.

Jin dibêjit tacê seran
Jina bê mêr bê xwidan e
Feqîr e li ber deran e
Qurban bim Zebîlfiroş

43.

Wextê babê guh lê bûye
Qise ji devê jina kurî ye
Rondik ji çehvan boriye
Girî bo bedelek nexwoş

44.

Zembîlfiroş rabû ser pê
Maç kirî destê babê
Xatir xwast ji hemû xelkê
Bi keyf û bi dilekî xwoş

45.

Rabû çû herem seraye
Ramûsî dest û pêy daye
Jê diken hîvî û ricaye
Tu bo me bikey duaye

46.

Lawik ji qesrê derketiye
‘Eyal û jin ketine dû wî ye
Li xelqê bote şîn û girî ye
Nema qet kesek dilxwoş

47.

Zembîlfiroş derket ji mal
Nema li dil xem û xiyal
Digel wî ye jin û eyal
Çûn da bixwun rizqek helal

48.

Çûn li rêkê çend rojekan
Bi şev û roj çêket selan
Çêket zembîlî ciwan
Heta çûn bajêrek boş

49.

Heta ku çûne Mêrdînê
Koxek dî li çolê bi tenê
Gotî werin da biçînê
Çêtir e ji qesreka xwoş

50.

‘Eyal li kolê danandin
Zembîl û sela helandin
Kolan bi kolan gêrandin
Li ber derkan ev şev û roj

51.

Hindek dane bi rûn û ar
Hindek da bi fêkî û girar
Rizq xir kir heta êvar
Zîvirî mal bi dilekî xwoş

52.

Rabû li roja paşiyê
Zembil li xwe helandiye
Li kolan diket gaziye
Gulxatûn ji dûr dîtiye

53.

Xatûn ji dûr ve dibînît
Heyran û bêhaş dimînît
Perdey li ber xwo dihelînît
Gazî diket Zambîlfiroş

54.

Dibêjîte xidama şîrîne
Lez bike bilezîne
Xwedanê sela ji bo min bîne
Selika wî qewî cindî ye

55.

Xidamê lez kir lezandî
Xwo bi derwêşî gehandî

Ew ji bo qesrê weşandî
Xatûnê xwo xemlandî

56.

Xatûn dibêt lawê derwêş
Kerem bike tu were pêş
Selka mezin bi zêr bikêş
Ya biçûk qîmeta bibêj

57.

Tu were guh bide min
Li te helal bît canê min
Dê te kem mirovek mezin
Bi qesr û malika xwoş

58.

Were ey lawê feqîr
Rûnê ser doşeka mîr
Têkvede zulfê herîr
Ez paşî dê te kem wezîr

59.

Lawik dibêt ey Xatûn
Nevêtin min malê dinê
Qayil nabim bi gotinê
Dûr im ez li qesêt nexwoş

60.

Xatûn dibêjît ey feqîr
Were razê li textê mîr
Qiyametê bike ji bîr
Li dev min xwo veke ev roja xwoş

61.

Law dibê Xatûn xwoş merhemet î
Agirê Xwedê bi canê te ketî
Qiyameta li du pey me tî
Ez lew nakem xiyanetê

62.

Heta xwo di ‘erdî rakem
Xiyanetê li kes nakem
Dilê Xwedê ji xwe nakem
Bo xatira rojeka xwoş

63.

Xatûnê min bes bêşîne
Wellahî min teme bi te nîne
Qîmeta selka çu nîn e
Bide min ‘eyal birsî ne

64.

Min heye ‘eyal û jin
Birsî ne ewê li hêviya min
Rehmê bike tu bi halê min
Tu min berde hêj maye roj

65.

Xatûn dibêt bir û qeylan
Dilê min qet naçît selkan
Me ji te divêt keyf û seyran
Hem kerdênî keyfeka xwoş

66.

Rabe zû were ser textî
Têkve ev canê spî
Dilê min wê bo te sotî
Naçî tu bi bezmeka xwoş

67.

Xatûna gerden bi morî
Dêm weku sorgula sorî
Sîng û ber ji hedde borî
Tirsa min ji Rebbê jorî

68.

Xatûnê erê xatûnê
Tu bejin dara zeytûnê
Çav weku agira bi tûnî
Tirsa min ji roja nexwoş

69.

Xatûna şeng û şepal e
Çav reşa ya çavxezal e
Rû sor e gerden bi xal e
Min berde da biçime mal e

70.

Rehmê bike tu bi feqîran
Berde ji benda xwe esîran
Pîroz bî tu bo emîran
Ey rûreşa mest û serxwoş

71.

Xatûnê ez tobedar im
Ez xwidanê jin û eyal im
Jar û bîrsî ne li mal im
Bes e ey namûsfiroş

72.

Bes e tu min bi min bêşîne
Qet min tama bi te nîn e

Faqîrîn ji dûr hatine
Feqîr im selikfiroş

73.

Xatûn divêt ez we nakem
Te li zîndan û hebsa kem
Jin û biçûkan fena kem
Yan dê cem bî şev û roj

74.

Zembîlfiroş ma bêhêvî
Destê xwe serfiraz kirî
Dua ji Rebbê xwe xwastî
Xelas ke min bi dilekî xwoş

75.

Hêj min nivêj nekiriye
Mesîn helgirt û çû baniye
Xwo li ser banî avêtiye
Ji ber xatûna namûsfiroş

76.

Xwedê emir kir Cebrail
Lawî ji dest jinka mawûl
Me duaya wî kiriye qebûl
Wî rake dane ‘erdek xwoş

77.

Kete erdî dil bixiyal
Peyda nekir rizqê eyal
Bi destxalî ziviriye mal
Çûye nav eyal bi dîlnexwoş

78.

Dil bi kovan zivirî bû
Bo nav eyal meşî bû
Dil aciz û dilnerxwoş bû
Qani bi emrê Rebbê bû

79.

Bi ‘acizî gehişte mal
Dît zor bikeyf jin û mal
Xwarinek zor xwoş li bal
Mahêrî mendexwoş

80.

Gote jinê ev çi ye
Ev xwarin ji kê re hatiye
Jina nazik diket keniye
Dibêjit Xwedê hinariye

81.

Zembîlfiroş dibêjît jinê
Ez heyrîm li wê gotinê
Were bo min bêje bi tenê
Rast bêje ev sore çi ye

82.

Jin dibêjit ‘ebdê Xwedê
Sê suwar derketin li vê milê
Gotin eve mindalê kî ye
Ji birsa nivistiye bêhoş

83.

Yek ji wan şiklê mîran bû
Ewî suwarek meşandibû
Ev rizqe bo cemandibû
Biçûk dixwun bi dilekî xwoş

84.

Biskeyn behsê Gulxatûnê
Lawik ji dest çû ma bi tenê
Girî ji ber dîlsotinê
Ji dem derkeft Zembîlfîroş

85.

Got xadim xizmetkaran
Hilûn pêk ve ber dîwaran
Binêrin çol û beyaran
Peyda biken selikfîroş

86.

Lezê biken hûn bilezînin
Zembîlfîroş bo min bînin
Bi xoşî wî neêşînin
Dê deme we we malekî boş

87.

Xatûna dil bi acizî
Mêr dîte ji dûr ve hatî
Qewî dilteng û tarî
Zêde dilteng û nexwoş

88.

Gulxatûn ji tîrsa dibêjît
Mîrê min çî erd li te dêşît
Narehetiya te ji kê bît
Te dibînim zor dilnexwoş

89.

Merde dibêjîte jinêye
Dema ez hatim ji rêye

‘Eyalek min dî li çolêye
Zaro girî û bîrsî û nexoş

90.

Min got, ev eyale yê kê ye
Bîrsî û rusî li vê erdê ye
Gotin bab derwêşê Xwedê ye
Derketiye selekan bîfiroş

91.

Babê wan Zembîlfiroş e
Ji ber Xwedê daim bêhoş e
Feqîrekî xîr qepoş e
Na nivîyan şev û roj

92.

Îro hêja nehatiye
Nizanin çi bi ser hatiye
Yê sax e yanê mirî ye
Ji ber wî ketîne bêhoş

93.

Min fikr e derwêş bibînîm
Ew û ‘eyal bicemînîm
Wan li qesrek xwoş dayînîm
Da ew bijîn bi halek xwoş

94.

Gulxatûn dibêjîte mîrî
Bo xulaman nahinêrî
Cihekî nazik bijêrî
Tê da danê Zembîlfiroş

95.

Mîr dibêjît xulaman gaz ken
Qesrek nêzîk da xalî ken
‘Eyalê derwêş razî ken
Ev şev hêj nebûye roj

96.

Xulam û bend dilezînin
Derwêş û ‘eyalî tînin
Di nav qesrê datênin
Nêzîkê xatûna dilxwoş

97.

Gulxatûn mîrî dibînît
Nizanît çi rê bibînît
Çewa xwo vê ra bigehînît
Bigehîne Zembîlfiroş

98.

Adar çû hate nîsan e
Bo wextê keyf û seyran e
Mêr gazî diket pehlewane
Da biçine raweke xwoş

99.

Gulxatûn wekî zaniye
Mîr ji bajêr derketiye
Gote xudam û cariye
Gazî ken jina Zembîlfiroş

100.

Gulxatûn rabûye ser xwo
Jina derwêş îna dev xwo
Cilkên wê kirine ber xwo
Ew hebs kir li odek xwo

101.

Jeng dikete giriye
Ji ber ‘eyal û mêrî ye
Ya reb çi bi ser me hatiye
Ji dest xatûna belafîroş

102.

Xatûn bi hîle û hewal e
Xwo xemiland derket ji mal e
Bo şolek pîs û betale
Bîr nehat le pîket xirxale

103.

Zembîlfîroş jî derhatiye
Mal û mindal nivistiye
Jin li ber ciha dîtiye
Çû ser cê bi dilekî xwoş

104.

Dest avête destê jinê
Xirxal dîtibû li pê
Lawik ji tirsê Xwedê
Kir qêrî ma mendehoş

105.

Got xatûna devbikenî
Ey rûreşa wekî tenî
Pîsa mirara goşt genî
Ey bêhaya hetikfîroş

106.

Here derkeve ji mala min
Bo min bêje ka jina min

Nebe sedebê mirina min
Bi halekî şer û nexwoş

107.

Xatûn dibê, ew wekî xwo
Nebe sebebê hepsa xwo
Hilo biqetîne şola xwo
Bi xwoşî dê bin bêhoş

108.

Hindî tu saxî heta bêt mîr
Dê te êxim bend û zincîr
Jin û mindal dê kem esîr
Qet nabînî saetek xwoş

109.

Xatûn rabû derketiye
Bi diltengî û ‘aciziye
Jina wî bo hinoriye
Bi rondik û dilek nexwoş

110.

Zembîlfiroş dibêjîte jinê
Li vêrênî îşev bi tenê
Subehî dê çin ji Mêrdînê
Dê cihek dil pê bit xwoş

111.

Li wan hat rojên nû ye
Mîr ji seyranê hatiye
Dibêjîte xulam û cundiye
Herin bînin Zembîlfiroş

112.

Herin bo min derwêş bînin
Paşazade bixemlînin
Suwar ken hemû bi suwarî bînin
Bi muzîqe û keyf û xwoş

113.

Nê emrek bo min hatiye
Zembîlfiroş li min xwastiye
Nê ew kurê Padîşahî ye
Ji ber dînê xwo hatiye

114.

Mîr û wezîr hemû rabûn
Lawik dîtî û îna bûn
Li ser textê mîr dana bûn
Şah û wezîr li pêş westa bûn

115.

Zembîlfiroş ma hirî
Be herdu çavan kire girî
Mîrim min navê agirî
Cehennema reş û nexwoş

116.

Mîr dibêjî bi serê te ye
Hatî ez babê te ye
Dixwazî ji min canê te ye
Vêkra dê biçin bi keyfek bi xwoş

117.

Mîr kaxez da xwendinê
Dixwazîtin te û jinê
Neşê mî bîdem axivtinê
Le pêş padîşayî eskerê boş

118.

Xulama kehêl cemandin
Mêr û jin lê şidandin
Mindal kujiya danandin
Bo qesrê şahê keyfxwoş

119.

Zembîlfiroş xwoş camêr e
Gulxatûn cewab dinêhêre
Hêvî dikem sirî weşêre
Nebêje ceqa nexwoş

120.

Zembîlfiroş dibît bi Xwedê
Heta min danenîn nav qebrê
Nabî kes bizanît wî şolê
Bila rehet bêtin keyfxwoş

121.

Bêjin ewa gerden zêrîn
Bila ji min bibît emîn
Neşêtim ez nehar û dîn
Li pêş Xwedê xwo bikem

122.

Şev û rojan ew her diçûn
Bi reqs û keyf û şahî bûn
Bi dawet û hingamî bûn
Heta çûne Diyarbekira boş

123.

Heta gehîştine Diyarbekirê
Peya bûn ew li derê qesrê

Kurî maç kir destê babê
Alim dîkin medhê Xwedê

124.

Li bajêrî bû şahîye
Govend kete nav şariye
Li siwaran tivengçiye
Te digot qiyamet rabiye

125.

Xort û cihêl dîken keyfê
Îxtiyar dîken medhê Xwedê
Kur hate xizmeta babê
Zor bi keyf û bi dilekî xwoş

126.

Zembîlfiroş bo hakim e
Zor adil û zor alim e
Nehêla zulma zalime
Şev derwêş û paşa bi roj

127.

Hukim gêra dirêj zeman
Wî xizmet kir zor bi eman
Mirin bi kez nodet peyman
Hemû vêkra dê biçin cihek xwoş

128.

Sed û nehwêd sal boriye
Paşî hezara hîcrî ye
Mûradxan dibêt şer hatiye
Bi şîr bi gotineka xwoş